



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 6 Hejmar - 33
Tîrmeh - Gelawêj 2010

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtoriya û Redaksiyon
Serwet DENİZ - Elixan LORAN

Mîzanpaj û Berg:
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Şewirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENİZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32 / 4 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tel & Faks: (0412) 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB: www.kovaraw.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesabê IBANê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Mirjîn - Tewfiq HÊJA / 3
- Azadiya kelepçekirî - Feratê DENGİZÎ / 5
- Çirûska ezmanê Medyayê - Wezîr KAYAR / 10
- Kurmê şîrî heta pîrî - A. Hekîm QOZLÛX / 11
- Xêz - Ahmet BİLGE / 15
- Biçûka min - Kemal DEMÎRBAŞ / 16
- Tavda - Bilal ONEN / 17
- Ji yara xwedewand re lawijên dilekî - Evdê Koçer CANO / 19
- Man û neman û hwd - Evdê Koçer CANO / 20
- Ji biyaniyan re awaz- Naîf BAL / 22
- Tu çi yî - Qedri ALKOÇ / 23
- Hêvî - Dilam - Mahmût ABA / 24
- Tê bîra te - Kerem OZTURK / 25
- 'Û'ya min mezin e - İlhan Samî ÇOMAK / 26
- Evîstanî - Felsefe - Aşê êşê - Zekî KAYAR / 28
- Şikandina zincîr û kelepçeyan - Zekî KAYAR / 29
- Ziman aîdiyet e, nasname ye - Mehmet BOŞATLIOĞLU / 35
- Seba ma'a ma... - Kenan KARAASLAN / 33
- Elîfbaya şewitînên berfê - Tewfiq HÊJA / 34
- Mala bavê min - Osman KAPAN / 37
- Tu bigiriyî - Huseyin GUÇLU / 41
- Canşikestin - Huseyin GUÇLU / 42
- Şolo - Rojhat ŞAXÎ / 43
- Xulxulîn - Spî - Şop - Ercan DOĞAN / 47
- Zaroka aştiyê - Fikret KARAKOÇ / 48
- Kolonya - Metin YAMALAK / 49
- Giyotîna bexwîn - Mistefa TÛNCYUZLU / 52
- Prometheusê li qûntara Zagrosan - Soydan AKAY, Sebahattin SUMELÎ / 53
- Dîmenên te - Fadil AYDEMÎR / 57
- Awaz - Fadil AYDEMÎR / 58
- Hêvî - Bahrî SALGIN / 59
- Ciwanmerd - Qenco û Cano / 60
- Palevanê stêrkan - Haveynê hêviyê - Enwer EHMED / 63
- Li bajêr - Nedîm YILMAZ / 64
- Jiyaneke şikestî - Veysel ÎLHAN / 67
- Li şewata zeviya wê digirim - Ahmet TAMÎR / 68
- Meşo- Sinan SUTPAK / 70
- Mizgînî - Sinan SUTPAK / 71
- Kaniya xezalan - A. Selam BARAN / 72
- Xwezî - Mistefa TÛNCYUZLU / 77

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji editor

Nîzar Qebanî di helbesta xwe ya bi navê ‘Helbestên ku Ketine Ber Xezebê’ de dibêje; “Heke dostên min serî hilnedin, helbest çi ye? Heke nikaribin milê har û barûteyan babidin, helbest çi ye? Zeman û mekanan nehejin, helbest çi ye?”

Heke ew ê ala azadî û aramiyan li ba nebe, heke ew ê simbilên genim li ber bayê havînê bi cizbê nekevin, heke ew ê birîna me kewa xwe nebîne, heke ew ê erca me û ya peyvê li hev nebihure, heke ew ê dojehzindana Amedê nebe muze, heke ew ê zarokên geh *kevîravêj* û geh *Selpakfiroş* gulan neçînin û nebin *Gulfîroş*, heke em zarokên Medyayê em ê nikaribin li gundên xwe vegerin, heke em ê bê pasaport nikaribin biçin Qamişlo, Hewlêr û Mehabad û Dêrsimê, heke ew ê aştî neyê dar û kulîlk û gelî û newal û çiya û daristan û zozan û deşt û keleh û qesr û qonax û kolanên me, heke em ê nikaribin kêlîkekê be jî bêhna xwe berdîn û hêsa bibin, gelo helbest wê bi kêrî çi bê?

Me jî xwest em bi vê hejmarê, dengê dostên xwe yên serhildêr, hevalên xwe yên ku milê bindestiyê badidin, dengê hogirên mekanhej û zemanhej, dengê rêhevalên ku wan şeva bindestiyê wergerandin û şev kirin berbanga azadiyê û pêşkêşî me kirin, bigihînin we. Ev dengên ku xwe bê ronî li rûyê mirovan dixin, di tînetiya hucreyan de welidîne, dîwarên ker şîr dane wan, ranzeyên hesinî ew nivandine û biharên delodîn ew kamil kirine. Ev dengên ku hûn ê bibihîzin ji sindoqa gelekî ku bengiyê azadiyê ne. Van dangan jî bîr nekin!

Dengê qasidên aştîyê jî jî bîr nekin!

Îro roj kurd av in! Ligel 4.000 deryayên ziwakirî! Lê em ê vî aşê aştîyê bigerînin. Ew çiqasî avê jî ser aşê aştîyê bibirin jî em ê aşê aştîyê bigerînin.

Di nivîsên ku ji girtîgehan ji me re hatin de me dît ku, girtiyên azadiyê ew zindanên ker û lal jî kirine maleke kurdî. Ji ber hejmara rûpelan me nikaribû cih bidin hemû nivîsan, lê em ê di hejmarên bîr de cih bidin van nivîsên mayî. Her çiqas di hejmara berê de me diyar kiribû ku em ê cih bidin “berhem” an jî tenê nivîs hatin, me karîkatur û xêz û îlustrasyon jî dipa, lê nebû!

Û jî ber ku di vê hejmarê de me tenê cih da nivîsên girtîgehan, nivîsên ku ji *derve* ji me re hatin, ketin ser hev. Ji ber ku em ê nikaribin bi carekê van nivîsan di kovarê de çap bikin, em hêvîdar in dê xwendevanên kovarê li me negirin.

Û xêrhatineke derengmayî ji Kovara Çandî û Hunerî; ji **Kovara Rewşenê** re. Em hêvîdar in kovara Rewşen dê di pêşketina çand û hunera kurdî de bibe aso.

Me berê jî dabû diyarkirin ku, em ê êdî nivîskarên ku hê pelê wan bi dara heyatê ve ne, bikin mijara dosyeyê. Dosyeya hejmara **Rezber û Kewçêra 2010’an** dê li ser helbestkar, nivîskar, wergêr û edîtor “**Kawa NEMIR**” be. Kesên ku dixwazin beşdarî dosyeyê bibin divê herî dereng heta **15’ê Gelawêja 2010’an** nivîsa xwe bişînin.

Bêguman, wêjeyek ji kovarekê pêk nayê! Lê bi pêşniyar, rexne, bîr û boçûnên xwendevan û nivîskaran, bi danasîn û xwendin û kirîn û abonebûna kovarê re, em dikarin kovara ku yek ji paleyê wêjeya me ye xurt bikin.

Heta hejmareke nû, nêhelin ku peyvên bi kurdî belaya xwe ji we vekin!

Mirjîn

Tewfîq HÊJA

Ger navek ji jiyana hepsê re pêwîst be, divê mirov bibêje mirjîn. Ne mirin û ne jî jîn. Têkelbûna her duyan;
MIRJÎN!

Hepsî angî dîlgirtî, najî. Bi wateya xwe ya rastîn jiyan nîn e li hepsê. Hepsî mirî jî nîn in, ne gor e cihê ku tê de darbestkirî ne. Ne kefen heye lê pêçandî, ne jî tehtê pehn li ser singê ku ruh jê reviyaye. Miriyê li piya, miriyê henaseyê dide û distîne, miriyê dixwe û vedixwe, dibîne û dibihîse. Lê belê jîndarê dest û pê qeydkirî, jîndarê ji însên û civakê veqetandî, ji dê û bav, ji yar û heval û hogîran dûrxistî, jîndarê ji kok û rehên jiyane qut, ji ax û av û çolan, ji gelî û newalan dûrketî. Jîndarê mirî, miriyê dijî angî mirjî...

Hepsî najîn. Najîn ji lewre çî tiştên jiyanê bin, jê dûr in. Her tişt bi wateya

xwe ya xapînok, bi heyîna xwe ya qestînok, bi hebûna xwe heye. Gelek tişt in der û dora hepsî, mişt têgeh, dîmen, kes û kûs, dost û yar, biratî, rabirdû û dahatû ne ku di nav de ye, lê evana ne bi hebûnên xwe, bi tunebûnên xwe ew dorpeç kirine. Hepsî di nav tunebûna hebûnan de ye. Bi sî û

bêhna hebûnan re dijî, bi tunebûnan re dijî. Li hember hebûnan jî mirî ye, dûr e, nîn e. Destên wî/wê nagihîje tu heyîne, çavên wî/wê di bêrengiya dîwaran de, lingên wî/wê di aliqandina hesin û deriyan de ye û ew mirinê dijî, angî ew mirjî ye.

Jibîrbûn e dîlîtî. Jibîrkirî neke ku ji dost û hevalan dest pê dike, xwe digihîne xizm û yaran û carinan ta ku di

nav malbatê de xwişk û bira jî tê de. Pêşîyan belahêq negotîne "Ji çavan çû ji dilan çû." Hepsî jî pêşîyê ji ber çavan diçe, piştî hino hino ji dilan, ji



bîr û birayan... Mîna miriyan. Piştî şîn û hawarê, piştî hînbûna valahiya ku mirî di malê de hiştiye û kêmbûna "Xwezî bi rojên hebûna rehmetî" pê ve zagona rasteqîn ku herikandina jiyanê ye û ku ew jî hew bi saya serê bîrbûnê diherike tê pê û vê zagona kujer her tiştî radest digire. Mirî tê jibîrkirin lê mirî ji bîr nake. Ji me(n)zelên xwe yên reş û tarî temaşeyî kesên ku wî/wê ew li paş xwe hiştine dike, diponije û bêrî dike. Hepsî jî ji bîr nake. Ji bîr nake lewre jiyanê wê/wî hatiye tevizandin û maye bi paşeroja xwe ve. Ji bîr nake lewre naşê ku ji bîr bike. Jixwe ji bîr-nînan pêk tê. Berî şêmûga hepsê û piştî şêmûga hepsê heye; berî mirinê û piştî mirinê heye. Hebû û tune bû, filankes û bêvankes, filan dever û bêvan dever û û her tişt kuta bû. Hepsî tê jibîrkirin û ji bîr nake. Ji bo ku tê jibîrkirin, ji bîr nake. Hepsî û mirî êsirê temaşeya heman filmî ne. Her gav, her xulek, her kêlî mirî ne, lê li jiyanê xwe ya berê temaşe dikin, ango her kêliyê dimirîjin...

Hepsî kesa/kesê binê bîrê ye. Ûsivê binê bîra li çolê ye, şev û roj nîn e di binê bîrê de, deng û sewta çu tiştî nîn e. Mirov dibêjin rûyê kesên tê de rûyê xwe dinase û dibîne, di binê bîrê de kesekî/keseke dî nîn e, loma jî rûyê xwe bi bîr nayne. Dizane li jor, li derveyî dinyaya gewrik digere, dizane

şewq û şemala rojê heye û şev dîlana heyveronê ye, dizane karwan li pey stêrka xul di nîveka çolê re dibihurin û qedera wan mîna şopa nav xîzê li pêşiya wan e, tîna jiyanê heye di her gavên wan de, dengê wan dibihîse û dizane nemirî ye, dengê dilê xwe, ter-pîna dilê xwe dibihîse lê baş pê ne ewle ye, bê ka yê/ya ku dijî kî ye. Di çilkekê hêvî de dijî, ew di dilopên awatan de dijî. Bi rastî najî, tenê hêviya jiyanê dijî ku ew jî bi mûyekî ziravik ve di valahiyê de hilawestî ye. Hepsî di binê bîrê de dijî, bi hêza hêviya zenûn, ango bi tayê hêviyê dimirîje.

Ji hepsî re dem û wext nîn e. Dem û wexta niha nîn e, paşeroj û pêşeroj belkî. Demên ku belkî bîn, demên ku belkî bi xwe re kenê zarokekî, serxweşiya welatekî, hezkirina dayîkekê, naz û şabûna yarekê/yarekî, bêhna gul û sosinekê, roniya stêrkekê û bêhna axê bîne. Demên berê jî jixwe li wir, li ser hilm û henaseya wê/wî ne. Niha nîn e, kêlik cemidî ne, çîrk û salîse sekinîne; niha hew bendemayîn e, niha hew bendemayîn û bendemayîn e. Dema niha jî dema niha ya wê çaxê revîn e. Mirin e, di xortaniya xwe de, xwekuştina bûka nû ye, di daweta xwe de, demnejiyîn e di hepsê de, ango MIRJÎN e!

Girtîgeha Bolûyê



Azadiya kelepçekirî

Feratê DENGİZÎ

Di girtîgehan de rewşa nivîsandina bi kurdî;

Di girtîgehan de rewşa nivîsandina bi kurdî li gorî demê diguhêre. Aşkerekê ye ku di dema 12'ê rezberê de, berî wê û piştî 1990'î rewş ne wekî hev in. Ev mijarên dûdirêj in. Em tenê ji bo ziman û wêjeyê li meseleyê binêrin. Lê di her demê de fersenda nivîsandina bi kurdî hebû û niha bi saya çanda berxwedanê û bi saya berdêlên giran û hêja rewşa nivîsandinê xweş û geş-tir e. Êdî, digel qedexê û zoriyan jî, nivîs dikarin rast-rast bigihên xebatên wêjeyî yên derve û jêder û berhemên bi kurdî bi hêsanî diçin ber destên girtiyan. Berê ev pir zor bû. Lê em bînin bîra xwe

ku di rewşa wehşeta 12'ê rezberê de ji Ferhat Kurtay di kovara **"Hawar"**ê de bi sernavê **"Şoreşgerê Bênav"** nivîsên bi kurmancî dinivîsîn. Lê belê em rewşa bişaftinê jî ji bîr nekin. Yanî di destpêka girtin û girtîgehê de, di warê rewşa siyasî de jî nezanîna bi kurdî bandoreke neyînî li ser nivîsandina bi kurdî dikir û ev her heye. Dîsa ji salên 1990'î vir ve hejmara girtiyan siyasî her ku çû zêde bû. Vêya derfetên xwendin û nivîsandina bi kurdî zêde kir. Divê em vê jî ji bîr nekin; girtiyan tim û tim bi derfetên xwe, çi bi nivîsandina bi destan çi bi ya daktîloyê her û her ligel kovarên bi tirkî, kova-

rên mehane yan pazdehrojî kovarên xwerû bi kurdî jî derdixistin. Navê yekê ji wan qet nayê ji bîrkin; ligel 'Hawar'ê, **"Çanda Berxwedanê."** Belkî rojekê derfet çêbibin ku li ser kovarên ku li girtîgehan derdiketin/derdikevin, lêkolînek an jî xebateke xweser bê kirin. Bi ya min ev jî mijara dosyeyekê ye. Bi kurtasî li girtîgehan rewşa nivîsandina bi kurdî, girêdayî rojevê, her û her heye û asta wê jî ne qels e. Û

lingekî wêjeya kurdî ya hemdem jî wêjeya li girtîgehan e. Divê nivîsandina bi kurdî ya çiya jî, wêjeya wir jî divê neyê jibîrkin. Dîsa girêdayî mijarê mirov dikare vê bi-bêje; her çiqas di lêgerînên pazdehrojî û lêgerînên awarte de, nivîs û kovarên ku

girtiyan bi dest û keda xwe nivîsandine tîn desteserkirin jî û ez bawer im arşîveke giranbuha ji vana di destê pergale de heye, çiqas tîn tune kirin an arşîv kirin nîzanim, di hundir de yanî di girtîgehan de ji bo nivîsê, mirov azad e. Hûn ê bibêjin çawa? Li derve, ji ber xwevegirtina ku wê nivîs bibin delîlên sûcdariyê (yê min bi xwe, zêde zêde wînda bûn, di qulên diwaran an di binê erdê de man, rizîyan û yên ku rewşa wan weke min e ne hindik in), yan jî ji dest herin û germiya xebatê, raman ji bo nivîsê zêde ne azad e. Lê di girtîgehê de tiştêkî ku tu wînda bikî, ji xeynî desteserkirina lê-

Lê em bînin bîra xwe ku di rewşa wehşeta 12'ê rezberê de ji Ferhat Kurtay di kovara **"Hawar"**ê de bi sernavê **"Şoreşgerê Bênav"** nivîsên bi kurmancî dinivîsîn

gerînan, tune ye. Yanî li derve beden azad e lê raman girtî ye/girtî bû (rewşa îro û berê jî ne wekhev e), lê li hundir beden girtî ye, raman azad e. Ji ber vê ez dibêjim; azadiya kelepçekirî. Şîroveya edebî, ramanî, sîyasî, derûnî û her wiha serbest e!

Avantaj û dezavantaj;

Di girtîgehan de avantajên nivîsandina bi kurdî, bi ya min zêde ne. Wek ku min di serî de jî got, derfetên nivîsandinê, çi fîzîkî, çi madî, çi manewî zêdetir in. Carekê êş jêdera wêje û nivîsandinê ye. Jixwe ji vêya zêdetir di girtîgehan de çi heye?! Erd û zeviya wêjeyê êş, keder û deranîna zilm û zorê ye, bi aliyekî xurt. Ma ne ji ber vê nivîskar û wêjevanên cîhanê yên xurt û bi nav û deng, tev di girtîgehan re derbas bûne. Tevna wan li wir hatiye hûnandin; ji Nazim Hîkmet bigire heya Dostoyewskî... Ji çar aliyên welêt law û keçên, zar û zêçên vê axê tevli birîn, elem, çîrok û serpehatiyên xwe tînen cem hev; yanî jî bo nêr hevîr amade ye. Kurdên ku berê cîranên xwe xweşik nas nedikirin, ji her herêmê û hema bibêje ji çar parçeyên welêt û ji her qad, çîn û pîşeyê hatin cem hev. Jiyanêke komunalî jî kir ku têkilî bêtir tehde û cudakeriyê bîndanîn. Ji şivanekî bigire heta gundiyeckî, bajariyekî, bijîşkekî; ji xwendekarê zanîngehê, ji nivîskarekî bigire heta parlamenterekî, bi hêsanî, bêtir pêşdarazî dikarin bi hev re ji jiyana rojane, heta siyasetê, heta pîrsgirêkên ekolojiyê par ve bikin. Ma derfetek ji vê xweştir, guncantir û rewşeke ji vê rewşê rengîntir û dewlemendtir, ji bo wêjeyê heye gelo? Bi ya min him qadroyên zimên û him jî materyalên ji bo nivîsandina bi kurdî di girtîgehê de, mîna dibistanê bi hêsanî û xwezayî tînen cem hev. Bi rastî jî ji aliyekî ve,

girtîgeh dibistanên kurdî ne, her çiqas îro rewş girantir bûbe jî, ji ber çavîyan, yanî tipên Fyê. Ev avantajê herî rind û hêja ye. Em bîr ser dezavantajan. Dezavantaja sereke ya herî mezin tîkiliya bi derve û bi xwendevanên kurdî û wêjeyê û derûdorên wêjevanîyê re ye. Ev nahêle ku nivîs, xeyal, bikêrhatinî, nîqaş, cîhan, tecrûbe û parvekirina nivîskarên di girtîgehê de dewlemendtir û xurtir bibe. Di pêş de ev mijar wê dîsa bê guftûgokirin. Dezavantaja duyemîn jî; rewş, derûnî yanî pîrsgirêkên kesayetiyê yên kesên girtî ne. Kesayet ku bi rewşeke normal negihîştî be, jixwe ev pir zor e, pêşiyê li mirov digire û pêşiya afirîneriyê digire. Yanî pîrsgirêkên kesî, malbatî, rêxistinî û yên ji ber şikenceyê, şeweyekî dide îradeyê. Ev jî him bi erênî û him jî bi neyînî bandorê li kesayetê dike. Mirova/ê girtî zêde ne normal e. Pîrsgirêkên derûnî her tim hene. Tew demdirêjî carinan bêhtir meseleyê giran dike. Ev bi serê xwe mijareke lêkolînê û dahûrînê ye. Dîsa tîkiliyên rojane û pîrsgirêkên bi rêveberiya girtîgehê re, yanî tîkiliya bi pergale re, asteng in li ber nivîsînê, ev jî bo nivîsandinê bi her zimanî wiha ye. Lê bişaftin û neyîniyên pedagojiya serdestiyê zirarê didin kurdî. Ev jî mijareke dûdirêj û li benda lêkolînan e. Dîsa îradeya ku bi her awayî hatiye şikistin, rewşa di bin çav de ya di şikencê de kêma zêde, dezavantajek mezin e.

Ji girtîgehan nîfşekî wêjeyî derket an na?


Bêguman... Çi bi zimanê tirkî dinivîsin, çi bi yê kurdî. Çiqas lawaz û qelsî hebe jî, nîfşekî ku bi kurdî dinivîse; helbestvan, çîroknûs, romanûs, ji girtîgehan derketine. Ev hê destpêk e. Di pêşerojê de li ser vî esasî û di

bingeha wê qadê de wê wêjevanên xurt ên gerdûnî jî derên. Ev destpêk, bender, cotajotin û tovçandina wêjeya kurdî ye. Diyalektîka jiyanê ev e. Tiştên giranbuha carinan bi têkoşînê re na, xweserî li aliyekî, piştî serfiraziyê, dereng, lê li ser vê xaka strayîn dertê. Li her welatî wiha bûye; li nav Rûsya, Çîn, Frensayê. Em dikarin bibêjin jî girtîgehan nifşekî wêjeyî derketiye.

Girtiyên azadiyê çiqasî dikarin ji tenêbûna hundirîn ber bi hebûna civakî ve bimeşin û biafirînin?

Girtiyên azadiyê jî ber ku xwedî armanc, raman, birdozî û utopyayeke jiyanê ne, yanî dizanin ku çi dikin, çi dixwazin; bi hêsanî, yên ku fêm kirine û têgihiştine, zû bi zû tenêbûna hundirîn najîn. Dîsa tenêbûna hundirîn girêdayî cîhana mirov, dilê mirov e. Ku ew dil bi hezkirina gel, bi doza gel, bi şoreşê dagirtî be, tê wê wateyê ku ew hundir bi gelek tiştan dagirtî ye. Hilbet xweserî jî nayên înkarkirin û ev

xweserî jî jî jêderên jiyanê, jî êş û keserên wê xwedî dibin. Çûyîna ber bi hebûna civakê jî, bi xebat, girêdana jî dil û bi têkiliyên civakê re girêdayî ye. Huner û wêje di van şert û mercan de dizê, diafire. Xwefedakirin, xwe bi agir şewitandin, xwekirina giloka êgir, di rivîna êgir de xwe mehandin, xwe heandin, an jî mirinpûçkirin ne hêsan e. Ji yê ku dizane re, tiştên giranbuha hene û deriyê huner û wêjeyê; helbest, kurteçîrok, şano, roman û her wiha vedibe. Ev jî şiveriyeke ber bi hebûna civakî ye. Dîsa di demên mij û moranê de dilê şoreşê di zindanê de avêt, zindana Amedê û berxwedana girtiyên azadiyê ya li wir di vî warî de mînakên berbiçav in. Berxwedanên zindanan her tim lingekî girîng ên şoreş û demokrasiyê ne. Hilbet mirov nikare hest, dilovanî, xweserî û hêvîkirina jî jiyanê înkâr bike û ev şerekî hundirîn li dar dixê. Êdî kes û dilê tazî li holê ye; berxwedan jî heye, xwespirtina dijberê xwe jî...Û ev pir; a girêdana



jiyan û civakê ye. Beleheq nehatiye gotin, “Berxwedan jiyan e”, yan jî, “Berxwedan serkeftinê, xwespartin jî xiyane tîne.” Hilbet gotin li vir ne erzan e, bi jiyanê, bi mirinê tê pîvan. Şerekî hundirîn î dûvdirêj li dar e. Wek ku dibêjin “Meydan, meydana mêranî û keçbavaniyê ye.” Rê dirêj, meş bi zehmetî ye. Betilandin heye, ketin heye, ji refê xwe veqetîn heye, mirin heye û hilbet îrade û serfirazî û azadî jî heye. Xelasiya ji riya tenêbûna hundirîn, çûyîna ber bi civakê ye û gava pêşîn jî terciha hezkirina mirovahiye, azadiyê û civakê ye. Lê zehmet e. Dîsa jî dibetiya serkeftinê zêde ye. Di vê mijarê de tiştên ku bîn gotin zêde ne. Lê ya esas, pîvana mirov e, terciha wê/wî ye. Xwesteka ji dil û xwe-rastpêkanîna di jiyanê de, dike ku girtî ji tenêbûna hundirîn bifi-litin. Dîsa li vir azadî heye, azadiya kelepçekirî. Çiqas dor-girtî, destkelepçekirî be jî; dil û mejî azad in. Lê divê tiştê neyê jibîrkirin, carinan berxwedan hin hestan vedîşêre, binax dike, lê ku derfetên bikaranîna van hestan derê holê, wê wextê îradeya mirov, vîna wê/wî xeber dide. Gelo çiqasî xwe terbiye kiriye, çiqasî perwerde bi kesayetiya xwe daye xwarin, çiqasî xwe daye doza gel, gelo berjewendiyên kesane wê derxe pêş? A di vir de carinan îradeya şikestî mala mirovan xera jî dike. Carinan bersiva doza giran jî mirov bi tenê dihêle, lê ev weke tenêtiya gel e, ya gelê xwe...

Di berhemên ji girtîgehan derdikevin de qelsî û lawaziyên sereke çi ne?

Mirov dikare qelsî û lawaziyên ber-

hemên ku ji girtîgehan dertên, ên sereke wiha têxe rêzê:

a) Kurteçîrok, roman, carinan jî helbest weke bîranînan, ji şeweya wê ya wêjeyî bi dûr tê nivîsîn. Hilbet bîranîn girîng, bi rûmet û hêja ne. Divê bîn nivîsandin. Jixwe ev şeweyeke wê-jeyê ye. Lê her tiştê cî, şewe, tarz û hûnandina wê heye. Bîranîn dikevin kurteçîrok û roman, lê divê romanê, kurteçîrokê neke bîranîn. Ew terazî pir girîng e. Girtiyên azadiyê qedr û qîmetê bi piranî didin bîranînan, dubare dikim, ev rast e, hewl-da-neke li cî ye. Di şert û mercên

neteweyeke mîna me kurdan de ev şerê giranî giyansûz î tije lehengî û trajedî ne, teqez divê bê nivîsandin. Lê divê wêje, şaxên wê û rêbaz qenc bîn zanîn. Wek ku dibêjin, “Mafê Sezar ji Sezar re...”

b) Zimanê berhe-man zêde razber e. Ji ber ku girtiyên azadiyê xwedî utopya û hêvîdar û avakarên jiyanake azad in, asoya wan pir fireh e. Tengiya girtîgehê jî pir zor e û mirov bê hemdî xwe berê xwe dide xewn û xeyalan. Ev mirov disîplîne jî dike lê xetereyek heye; carinan û bi piranî mirov ji jiyanê, ji rastiyê, ji rasteqîniyê bi dûr dikeve. Û gava ku dibîne jiyan ne wisa ye, îcar travma dest pê dike, raman diderize, xirabûna derûniyê li derî dixe. Ev rewş zêde di berhemên de dertê pêşiya mirov. Yanî divê mirov bikaribe xwestek, utopya û xeyalên xwe bi jiyanê ve bike weke hestî û goşt, yanî wê xeta zirav a ji-yanî zeft bike. Di berhemên wêjeyî de jî. Çawa dihat gotin; **“Bêîmkaniyê bixwaze lê rastbîn be...”** Hilbet xeyal-kirin esas e. Lê jiyan ne li ser ewran e

jî... Helbest carinan bêhtir dikevin vê rewşê û wateyê winda dikan. Berhem carinan di nav vegotina siyasî de, ji ber vê rewşê ji wêjeyê, ji roman, kurteçîrok, helbest û her wiha bi dûr dikeve. Zêde xwe dispêre jargona siyasî. Hilbet berhemên siyasî jî tîn nivîsandin û divê bîn nivîsandin, lê ciyê vegotina vêya jî heye.

c) Dijberî xala li jor, îcar ji tengiya girtîgehan, dema dûr û dirêj, bi qasî ku ruhê mirov teng dike; hest, xeyal, utopya, dûrbîn, hwd. jî teng dike û ev di berhemên wêjeyî de wek reşbîniyekê, hêvîxwariyê jî derdixe holê. Yanî ziman hişk, bê şayesandin, hestiyarî qels; tenê gotin e. Dewlemendî, firehkirin û utopyaya mirovî û asoya fireh a wêjeyê, namîne. Berhem mîna girtîgeheke nû, dertê pêşberî mirov. Wêje dikeve hepsê. A rast wêje ji rastiye xwedî dibe, herê, lê jiyanê ber bi xweşî û ber bi hêviyê jî dibe û dike ku mirov ji jiyanê hez bike. Lewra em jiyanê azad, wekhev, bêkedxwarî, li ser esasê biratiyê, jiyanê heja ya layiqî mirovahiyê, jiyanê civakî dixwazin, divê berhema me jî bi vêya xweş bê nîgarîkirin, xemilandin. Dewlemendî û pîrcuretiya wêjeyê mîna rûyen jiyanê ye.

d) Hestên girtiyên azadiyê xurt û sift in. Ne mîna mirovên ji rêzê ne. Carinan wêje dibe sofreyê hestên ji wan re. Yanî bêhtir, hest û xwestek xwe di berhemên de didin rû, tenê hest dihe-rikin. Ev bi tenê têra berhemên wêjeyî nake.

e) Ziman carinan qels û tevlihev e. Armanc, mijar nayê fêmkirin. Û her wiha...

Mirov dikare van xalan dirêjtir jî bike. Lê çarçoveya nivîsê ew qas e. Zêde dê mijarê belav bike. Lê bi ya min divê ev mijar zêdetir bîn nîqaşkirin. Yanî bi dosyeyên cuda, bi şeweyên cudatir ev nîqaş bidomin ku, wêje

der bibe. Wek cureyekê hê jî rexnegirî qels e. Rexne çiqas qels be, wêje jî ew qas qels, bêalternatîf, bi serê xwe dimîne. Dîsa hêviya min di vî warî de xurt e. Ev destpêk e. Wêjeya girtîgehan di dahatûyê de wê berhemên giranbuha biafirîne. Lewra zeman diya afirîneriyê ye. Lewra cewher hêdî hêdî tîn ser hev. Gewherî di afirînê de ye.

Dema sîstem bedena girtiyan bi sînor dike, gelo dikare mejiyê wan jî bi sînor bike?

Na. Kelepçe, qeyd, çardîwar, tîlên mirêsayî, caxên hesinî bedena fizîkî bi sînor dikan. Tevgerê ji bedenê re teng dikan. Lê qeyd û zincîr li mejî, li ruh, li dil nakeve. Ruhê azad sînoran nas nake. Ew her di gerdûnê de azad digere. Gotineke şoreşgeran a şoreşgerî xweş û bîngehî heye: **Şoreşger afirîner in**. Di her şert û mercan de dikarin jiyanê biafirînin. Mesele dil e. Dibe ku beden têkeve hepsê, lê divê dil nekeve hepsê. Li derve jî dil û mejiyên di hepsê de, di hepsan de, di qereqolan de tijî ne. Gelek desthilatdar di hepsa desthilatdariyê de ne, di her awayê jiyanê de. Ji ber ku ev rastî hatiye dîtin, pergale berê xwe daye zarokan; zarok û jinan. Dibe ku ew rewş carinan mejî û dil jî dil digire, lê ne dilê azad, ne ramana azad, ne mejiyê azad. Girtiyên wisa ne girtiyên azadiyê ne, ew ji aliyê ruh ve mirî ne. Mejiyê ku di girtîgehê de bi sînor bû, ew miriyê, marê nîvkuştî ye. Rizîyaye, xêr tê de nemaye.

Azadiya kelepçekirî, temînata jiyana azad e, bîngeha wêjeyê ye jî. Diyalektîka jiyanê ev e. Dîrok bi vê xemiliye. Ên zana, ên miraqdar dikarin vê bibînin. Lehengên azad, lehengên rêya azadiyê, yê girtîgehê her û her di jiyanê de çav li me dişikînin û xwe û azadiyê tînin bîra me.

Çirûska ezmanê Medyayê

Wezîr KAYAR

Çirûska ezmanê Medyayê yî tu
Hevala Nûda
Jiyan ji bo te her tim dibistan bû
Li deryayên hewldanan vînî
Wê tu caran winda nebin

Xem û xeyalên te
Di qeliştêkên qedera qelp de
Çavên te yên têrawir
Tîrs û heybeta kesnedîti bû
Li dewrana demsalên bêdeng
Nikarin bişkênin efsûna
Vîn û evîna te
Tu bişirîna xûsa di dilê me de yî
Bi kenê wêneyê te dibîşkivin
Kulîlkên qeraxa behra Wanê...
Ka bêje hevala Nûda
Bi kîjan rengî bixemilînim
Hêviya rêhevaltiya we?
Bi kîjan per û baskan bigihînim
Armanca cangoriya we?
Lal bûme ji koçberiya we ya bêwext
Berê min li siberoja hêviya mezin e
Bejna xwe ditewînim
Li hember fedakarî û qehremeniya we
Her bijî hevala Nûda!
Her bijî nûjîn û nûbûna welatê min!

Girtîgeha Sêrtê

Kurmê şîrî heta pîrî

A. Hekîm QOZLÛX

Carcaran hin qewimîn dikin ku qiloç bi serê mirov ve werin. Qewimînên bēnçikên! Qewimînên ku dihêlin mirov şaşomaşo bibê! Ev qewimînên wilo, li darê dinyayê tenê carekê diqewimin. Qet dubarekirina van qewimînan nîn e! Ku hûn bixwazin, em dikarin bi hev re binê van qewimînan bikolin...

Heta berî hefteyekê jî ku kesekî/ê ji min re gotibûya “Apê Seydo ketiye silûkê min ê bawer nekira, hem jî qet... Bê çawa ez ê bi gotina kesekî/ê bawer nekim ku roj berepaşkî dihile, min ê wilo bawer nekira ku Apê Seydo ketiye nav ponijandineke dûvedirêj jî. Naxêr, ez nabihîzim! Va ye ez bi xwe, wekî biraziyê wî, bi çavên serê xwe dibînim ku apê min Seydo ketiye silûkê. Ev hefteyek e di menzela xwe de diponije, dihizire. Teqez ev ramandina wî ji bo welidandina fikreke nû û ji bo destpêka jiyanê nûjen e...”

Berê pêşiyên me digotin “Kurmê şîrî heta pîrî” îcar wilo xuya ye ku kurmê şîrî encex hetanî bi nivê temenê Apê Seydo ajotiye.

Apê Seydo mirovekî kêfhez e. Ku eşîran hev biqelanda ku Rojhilata Navîn serûbin bibûya ku dinya li bin guhê hev biketa dîsa jî Apê Seydo guh lê nedikir. Ji nêçîrê vala nedima, heta ku guh li tiştan bike. Ji xeynî nêçîrê kêlîkekê jî, deqîqeyekê jî wextê wî yê ku bida geşedaneke din nîn bû. Dinyaya wî; ew û nêçîra wî bû. Lewre dibêjim ku dinya jî xera bibûya dê dîsa Apê Seydo laqirdiyên xwe (ev laqirdiyên wî jî bi pîranî li ser gazindên jinapa min ên li ser

nexweşiya wî ya nêçîrê bûn) dikir ku hetanî ku şer di navbera wî û jinapa min de derketa. Ya herî girîng jî dê dawî li serpêhatiyên xwe û roviyan neanibûya. Lê va ye ketiye silûkê û qet behsa fenên roviyan, xemsariya kîvroşkan, bēdebiyên hirçan û xwendina kewên ribat nake. Kesên ku wî dinasin, dizanin ku Apê Seydo bēyî nêçîrê, bēyî kuştina rovî, kîvroşk, sûsik, pezkovî û girtina kewan nikaribû rojekê jî debar bikira. Roja ku neçûya nêçîrê jî, yan jî neçûya qehwexaneyê kewgiran û kewên xwe nexista şer, teqez wê rojê wê ber biavêta, dê wê rojê nexweş biketa, dê elemî bibûya. Wele-hîn baş tê bîra min, roja ku jinapa min welidî jî dîsa li malê nese kinî û bēyî ku qîjîna zaroka wî bikeve guhê wî dîsa çûbû nêçîrê. Lewre wî bi xwe digot “Ez dikarim tî û birçî bimînim lê nikarim bēyî nêçîrê bisekinim.” Lê va ye sekiniye û ketiye silûkê. Qet behsa nêçîrê nake. Tew mirov dibêje qey tişteki wilo nejiyaye û nebihistiye. Heta wilo xuya ye ku hinekî ji vê rewşa xwe fedî dike. De îcar em bala xwe bidinê bê çima fedî dike.

Berî bi du, sê mehan mêvanên apê min Seydo hatin. Du mêvanên ezîz; yek dotmama min – ku hinekî navbera min û wê ne xweş e! Lê ev meseleyeke taybet û cuda ye- a ku ev deh, yazdeh sal in li Swêdê dijî û hevaleke wê ya swêdî ku ev ji çend meh in bî ye –tew ku xortên gund pê hisiyan ku ev keçika swêdî bî ye, tevan şûşeyên xwe yên misk û emberan nû kirin, cilên xwe yê

cejnan li xwe kirin, porên xwe bi şûn de qelibandin û şahîk kirin û li dora mala apê min Seydo re diçûn û dihatin. Lê ev jî li hêlekê, ka bila ew jî li pey çûn û hatinên xwe bin û xeyalên xwe bişopînin- Navekî wê yê gawirkî hebû “Maryy” bû, “Marya” bû nizamî lê jinapa min navê wê kir “Meyrem” û peyre jî di nav me de navê wê bû “Meyrê.”

Piştî hatina van mêvanên ezîz Apê Seydo çûna xwe ku ji hefteyê teqez du, sê caran diçû qehwexaneyê kewgîran a li bajêr birî. Lê boyaxkirina simbel û porê xwe domand (dîsa jî mirov ji qermîçankên rûyê wî têdigihîşt ku temenê wî gihiştiye pênciyê) Helbet di serî de dev jî nêçîrê berneda. Lê niha ew jî berdaye û encex kurmê şîrî hetanî bi vir hatibû...

Hîn roja pêşîn dotmama min got ku hevala wê ya swêdî keseke hawirparêz e. Lê ma jî me re çi! Tew ku dotmama min hinekî behsa hawirnasiyê kir, min hema peyva wê birî û got - de ne min jî xwe wekî mirovekî çepgir dihesiband û min nedixwest ku ew xwe jî min zanatir

bibîne û bihesibîne- “Em dizanin bê hawirnasî çi ye!” Apê Seydo bi kêf domand “De ka ez sibê herim çend kewên nikilsor bînim û bibirêjim, bila bibe qîjeqîja goştê biraştî, dohn bi ser bikeve û dohnê goştê biraştî di nav pêçîyan re biherike û bila bêhna wî here pozê wê, tu yê bibînî bê çawa dixwe!”

Rastî jî wisa kir. Roja din bêtî ku roj derkeve, rekeha kewên xwe yê ribat da milê xwe, wekî her carê dafên xwe kirin ber qulpîka kemera xwe û çifteya xwe ya dulûle da milê xwe û çû nêçîrê. Bêrî êvarê jî nêçîrê hat. Du kewên sax, sûsîkek, kîvroşkeke gurandî -xuya bû ku ew bi çifteyê kuştibû- di destan de bû. Hat û hinekî bê kêf nêçîra xwe avêt erdê û got “Bêxwediyê kewan îro qet nehatin.” Her hal xwe jî bo girtina gelek kewan amade kiribû. Lê du heb tenê girtibû û lewma jî mirûzdayî bû.

Bêrêvarkî dotmama min, Meyrê û zarok jî nav reza hatin. Meyrê nehişt ku em kewan serjêbikin. Bi wan lîst, ji wan hez kir û jî Apê Seydo xwest ku van her du kewan wekî diyarî bide wê. Meyrê hetanî nîvê şevê bi kewan lîst.

Geh nan di destê xwe de hûr kir û da wan, geh qaşûlê zebeş û petêxan li ber devên wan girt. Lê kewan nikulê xwe li tişteki nexistin. Helbet Meyrê bi vê yekê diêşiya, xemgîn dibû û li ber wan diket. Jixwe goştê sûsîkê û kîvroşkê jî nexwar. Ev yek bû kuleke mezin û ket ser dilê Apê Seydo, ku mêvan xwarina mirov nexwin!

Wê şevê Meyrê jî Apê Seydo xwest ku



sibehê wan bibe hinekî wan bigerîne û wan bibe nav werzan. Dotmama min dîsa axaftinên wê werdigerandin. Helbet nêta Meyrê ev bû ku ji Apê Seydo re bibe asteng da ku Apê Seydo neçe nêçîrê. (Jixwe me tevan ev hîs dikir)

Lê Meyrê zû li vê xwesteka xwe jî poşman bû. Dema ku sibehê em tev bi hev re çûn nav werzan, Apê Seydo li ber çavên Meyrê pê li kulîlkeke di serê şaxê lemekî de hê nû bûbû terh, kir. Wê çaxê Meyrê qîrek da û hişt ku em (me got qey mar pêveda) hemû bi wê qîrê re lê bicivin. Meyrê li ber lem rûniştibû û bi her du destên xwe kulîlka ku di bin potîna Apê Seydo ya nêçîrê de eciqîbû, rast kir û bi xemgînî serê xwe dihejand û bi zimanê xwe yê gawirkî tiştin digotin. Dotmama min jî ji wergerandina peyvên wê bêtir, bi acizî digot “Qet nebe li ba xelkê xerîb hinekî hay ji xwe hebin. Qet nebe li cem vê keçikê bi baldarî tevbigerin.” Helbet ji van gotinan bêhtir jî nikaribû tiştêkî ji bavê xwe re bibêje. Lê van gotinan jî hişt ku em ji xwe fedî bikin. Herî pir jî Apê Seydo..!

Lê tu bûyeran bi qasî bûyera beriya bi neh deh rojan Apê Seydo neêşand. Çend roj piştî bûyera li nav werzan, Meyrê got “Ez çûm Dêra Zehferanê, Ava Spî û Keleha Mêrdînê. Îcar ez ê herim Cizîra Botan, Birca Belek û gora Mem û Zînê jî bibînim û dûre ez ê xatirê xwe ji we bixwazim.

Hinekî kêfa wê ji hatibû cih û wekî ku bûyerên qewimîn ji bîr kiribû. Apê Seydo jî ji bin bandora bûyera li nav werzan derketibû –wilo dixuya- tew ji wexta ku fêr bûbû ku Meyrê li Swêdê diçe serdana komeleyên kurdan, hevaltîyê bi kurdan re dike û piştgiriya wan dike û li ser van tiştan xwestiye welatê wan jî bibîne, bêtir kêfxweş bûbû. Lewre reha Apê Seydo ya neteweyî ew girtibû û dixwest ku mê-

vanperweriya kurdan bi Meyrê bide nasîn. Bi xwe û bi malbata xwe ve bi Meyrê ve bûn. Bi van hestan xwest ku roja dawîn jî li ser şerefê Meyrê mazûvantiyeke bi rêk û pêk, yeka bêkêmasî bike. Lê çawa!

Apê Seydo çû berxê xwe yê ku ji bo tov hiştibû anî, li ser naylonê ku li nivê hewşê raxistibûn li erdê xist, dirêj kir; piyê paş yê bin û piyê pêş yê ser çeprast bi hev ve girêdan. Bi mefredê kêra kalanî ya şilfmezin suht. Meyrê ji hundir dengê suhtina kêrê kir. Qirçîn ji nava wê hat. Bi bayê bezê serê xwe kir şibakeyê ku çî bîbine! Va ye berxê reben, bê lebat li nîveka hewşê vezelandî ye û li hêviya serjêkerê xwe ye. Hema Meyrê bi hemû hêza xwe kir qîr û di ber re jî digot “No, no” û beziya derve. Lê destên Apê Seydo ji piyên wê siviktir bûn. Tew Apê Seydo digot qey ji bo ew xwe nexesirîne Meyrê dibêje “no.” (tew ev “No”yên wê jî ji kurdî dihesiband û bi beşişandin digot, va ye hînî kurdî jî dibe.” Apê Seydo di ber xwe de beşişî, serê xwe hejand û got “De bi gora hecî Eliyê bavê min ez ê îşev goştê vî berxê enîbeş û çavreş bi te mêvana ezîz bidim xwarin” û hêj ku Meyrê negihîştîye, serê berxê çavreş jê kir û avêt testê.

Lê çî bû wê kêliyê bû! Dema ku çavên Meyrê bi berxê serjêkirî û gola xwînê ket; devê wê gazeke ji hev vebû, qîrîna wê li erş û asîmanan sekinî, her du çavên wê spî bûn, her çar pêçiyên destê rastê kiribûn devê xwe û bi destê çepê pêçiyên destê rastê hişk û hola di devê xwe de zexm kiribûn, tirs û xof, bêçaretî bi hev re lê bar bûbû. Weke qurbaneke ku di qurçikekê de hatibe asêkirin û bê mecal mabe û nikaribe ji ber kujerê xwe yê destbixwîn bireve wilo ziravqetandî, bê çare û heyirî mabû di ciyê xwe de. Ev sekna wê bêhempa bû. Sekneke ku li darê dinyayê bi tenê bû. Dirûvekî ku heta

niha qet nejbû û dê nejiyaye jî bû. Ev rewş di vê dinyaya herikbar de wêneyekî awarte bû. Qet nayê dubarekirin. Em hemû jî behitî û heyirî man. Ê em ditirsiyan ku dê ev keçik di mala me de, di nav dest û lepên me de jî dil here. Lewre ne diyar bû bê ka nefesê dide û distîne yan na. Apê Seydo jî bi vê rewş û nêzîktêdayîna wê matmayî bûbû. Ya rast em tev jî wekî leylandî di wêneyekî kevnare de, di ciyê xwe de tevizişbûn. Lewre tu kesî tu wate nediyayê bê çi bû û çima Meyrê wilo kir û jî dil çû.

Lê qewimîn bi vê ecêbê jî neqediya. Çawa ku Meyrê bi ser hişê xwe ve hat, bi qîr, dest di nav porê xwe yê kejik de, beziya menzela mêvanan a ku Apê Seydo jî wê û jî dotmama min re veqetandibû. Hîn du deqîqe jî neketibûn navberê, Meyrê jî menzelê tevî çenteyên xwe yên ku hîn devê wan jî negirtibû, derket. Tew vê bizavê em hîn xerabtir şaşomaşo kirin. Ku wê kêliyê mirov ew kêra kalanî li ser dilê Apê Seydo bixista û mirov bi wê kêrê laşê wî xeritandibûya jî dilopek xwîn jî jê nedihat, wilo xwîna wî çikiyabû û rengê wî spîçolkî bûbû. Ez bawer im ku wê kêliyê Apê Seydo di şûna dîtina vê bûyerê de hezar carî bi teqîna çekeke ku di serê wî de teqiyabûya razî bû. Ez baş dizanim (jixwe jî mirûzê wî yê zenûn jî xweş diyar bû) ku bandora vê bûyerê jî kuştina wî jî jê re hêsanîr bû.

Em tev beziyan pêşiya Meyrê. Bi qurban û heyran em li ber geriyan, me lava jêkir. Lê me kir û nekir, me ew neda sekinandin. Ew êdî nikaribû saniyeyekê jî li vir bisekine, dê bi bayê bezê jî vir bireve. Ev yek bi her awayî diyar bû. Lewre dotmama min jî ev yek baş fêm kiribû ku bi bayê bezê wê jî çû çenteyên xwe anîn û bi rê ketin.

A rast ku ji bo xatirê dotmama min bûya, min gava xwe nediavêt. Lê ji bo

xatirê Meyrê (çawa be jî hîn mêvana me bû) ez heta balefirgeha Amedê bi wan re çûm. Meyrê li wir jî qet nese kinî û bi balefira ewil re firiya welatê xwe.

Êdî çi jî Meyrê hat, bi ser hişê xwe ve hat an na nizamim. Lê ez tiştêkî baş dizanim ku Apê Seydo bi tevahî guherî. An jî hat guherandin. Piştî ku Apê Seydo bi rojan di silûkê de ma, wê roja hanê derket; mahd lê nemabû. Bê his û bê deng potînên xwe yên nêçîrê avêt tenûra jinapa min. Çifteya xwe ya dulûle kir du qet û qûndara wê ligel dafên xwe da jinapa min; "Pitê ha van jî têxe tifikê, êvarî şivê li ser çêbike." Ji wextê ku zewicîbû ve ev cara yekemîn bû ku wilo bi zarekî şîrîn û bi zimanekî nerm bi jinapa min re peyivîbû. Her sê kewên xwe yên ribat ku niha yeke wan bi milyonan dirav dikir jî azad berdan, hem jî digel ku dizanibû kewên kedî ne û dê jî hêla hinek kesan ve werin girtin; dîsa jî berdan. Rekehên wan jî ji bo tifikê dan jiinapa min. Tiştê herî balkêş û sosret jî ew bû ku wê rojê Apê Seydo bi neviyê xwe Azad re dixeyidî û digot, "Kuro lawo bisekine, tu çima didî pey van pinpinîkan, duh jî te sê gêrik eciqandin, pêrtir jî te nehişt çûçik zadê xwe bixwin... Qey tu dijminê van heywanên bê ziman î, he bēnamûs! Ez careke din bibînim ku tu kêzikekê jî bikujî yan jî gulekê bieciqîne, ez ê guhên te jî nava serê te rakim." Lê wekî ku li xwe hay bûbe ku zêde çûye û neviyê xwe yê sê salî êşandiye, di ber dilê wî re çû û got; Bimeyzîne berxê kalê xwe, ku tu qaşûlê zebeşan bidî berxikan, tu çûçikan nexeniqînî, pinpinîkan nekuji û gêrikan neciqînî ez ê her roj ji te re şekirê sor ê qulqulî, loqim û besteniyê bikirim. Erê! Hat fêmkirin berxiko?

Dema Azad navê besteniyê bihîst bi kêf serê xwe leqand lê di çi maneyê de bû ne diyar bû.



Biçûka min

Kemal DEMÎRBAŞ

Biçûka min
Xwe ji vî zemanê jehrîbûyî
Xwe ji vî zimanê jar
Ji vî zimanê bi hişê evînkuj
Yê bi ser bihara me de rimavêj, biparêze
Û bi dilê xwe yê

Di amadekariya xweşhalkirina pêşeroja me de
Di dildîliya me de
Wekî Kela Dimdimê
Wekî barana Bêrîtanê
Û wekî Kurdistanê bibîşkive
Bi dilsoziya ji rûpel û pêlzeriya zaroktiya xwe
Bi delaliya têgihîştina xwe

Li ser dika dahûrandina serîrakirina me
Ji vê cîhana hevsengwinda
Ji vê cîhana ji jîngerax
Ji vê cîhana cengan re
Bibe hîndekara derewîniya me
Bibe rewş û halbêja dîmenên
Ji candayînen me yên
Bi sonda serînedanîna şev û rojê
Bibe xwedî çavceylana me
Ku canparçebûyîn
Binkevîrbûyîn

Û hestîhelîna me ya di bîrasîtan de
Ku nediyariya me
Ku venegerin
Û awirkûriya me ya dawîn bê şahid nemîne
Şev û roj e
Bi hêza masûmiyeta bêgunehbûna xwe
Bike dadgeha heqîqeta hesabpîrsînê
Ya ji wijdanên ji me re janûêşpijandî
Da ku welatêşa di birîna birîna me de
Êdî bigihîje aramiya serkeftina siwariya xwe
Ku bibe xwedana şanazî
Û hebûnaziya me

Dîmenên ji lûtkeya şehadetnameyên me
Di bîjiya hespê têkçûyîn û şerjîriya me
Li ewrkovî û bakoviya baskên bêriyên me bar dike
Û di jînjengiya bajarên hizirtêkçûyî de
Bike pêşangehên rêdîtina duh, îro û sibeha asoqetran
Ya di meşa çilvîrîşiya rûmetxwar de

Girtîgeha Elbîstanê

Tavda

Bîlal ONEN

Tu têra xwe geriyayî
Te tûrikê dilê xwe dagirtiye
Bi bêhna biharan

hêsirên çavên xwe (çavên ku birçiyê
çavên te ne) mijand.

Kûr û dûr neçe Tavda. Delala
xewnerojkên min, li ba berfê ku ketî çola
sebra min. Neçe... ji baxçeyê min gulan
kêm neke... min ji kul û xemên te jî hez
kir bi qasî kenê li qerexa lêvên te. Neçe,
agir bi pirêzeyên havîna min nexe...

Ez zanim tu dilderya yî. Evîndar î. Dil-
dara roj û stêrkên biharan î. Lê bizanibe
niha heyv dibêje; teyran
ji min xatir xwestin û
çûn. Çûn! Ji bo ku
payîzan biguherînin bi
biharan, çûn... Ji min
veqetîyan, dûr ketin.
Wan ez terikandim û
çûn. Çûyîn, bû mayîn ji
min re... Heyv li nav
ewrên asîman dinale
Tavda...

Niha tu bûyî payîz
Li welatê ku zarok
bavan dimijin
Bi hêsirên xwe
Li bajarekî şewitî
Bûyî gerok Tavda
Janan berhev dikî
Ji porê dayikên min

Hîv digirî Tavda. Li ber şibakeyê li
hêsirên hîvê dinihêrim. Tenetî kor bibel!
Dilê min diguvêşe. Binihêre li çavên
zarokekî/e kurd, min welatê dilê xwe yê
ku bi napalman hatiye şewitandin, min
bi hêsirên çavan agir tefand. Û min
dîrok û zarok ne bi şîrê pêsîran bi

Tavda
Li nav baxçeyekî evîneke jibîrkirî
Li ber evînê guleke westiyayî
Li gulê dinihêrim bi dilekî birçî
Tenê hiştine guleke birîndar
Bi kesera hatina biharê re gul bendewar

Di nav lepên şaristaniya tenêtiyê de
tenê hîv ji min fêhm dike.
Ew jî wekî te dilşikestî, bi
kovan û xemgîn e Tavda.
Wekî dilê min.

Tu hatî bîra min, min û
hîva payîzê dengê xwe
kirin yek û em giriyan. Me
hêsir barandin û
barandin. Me gelek zeman
û demsalên kirêt û qirêj
bi hêsirên çavên xwe
şuştin Tavda. Baranên
me bûn lehî û bi kuçe û
kolanan ve herikîn. Û
herikîn. Bi dengê nex-
uyayî min li paş xwe dini-
hêrî, tu kes tune bû
Tavda. Li ser qeraxa lêvên
hêviyê, mohra payîzê
hebû. Ji biharên çiyayên

te tenê Gulek mabû...

Tavda!
Kûr û dûr neçe
Dûre tu nikarî hilgirî vî barî
Zû were ber dara çilo
Ya li ser singê Zapê
Jê bilind dibe va ye hêvî



Dibe ku bibe dermanekî vî halî
Belkî veke vê kaniya xetimî
Û bibe hêz
Bibe coş
Bibe cejn ji bo biharan
bibe helbest li ser zimanê hozanan

Tu çûyî. Te tenê gulek hişt û çûyî.
Min qala te kir ji gulê re. Lê gul ji te
xeyîdibû Tavda. Te ew bi tenê hiştibû,
terikandibû. Bêriya destên te kiribû,
kenê te... Ji ber ku êdî kesî ji bêhna wê
fêhm nedikir. Min ew bêhn kir û
bernavkê te li gulê kir, em bûne heval,
rêheval.

Lê bizanibe her tiştî payîz nîşan dida.
Heta niha tu bandora wan li ser min
tune bû. Min jî nizanibû payîz çi ye û
bihar çi?

Lê îro dizanim
Piştî çûyîna biharê min jî fêhm kir.
Payîz keser e Tavda, kesera biharan
Kûr û dûr neçe Tavda...
De ka bibêje
Gelo kîjan nûvedar wê şûna kenê te
bigire!
De ka bêje!
Gelo wê kîjan diyarde ciyê nerîneke te
bigire!

Lê kîjan kure, kîjan felsefe, kîjan wêje
wê bikaribe bibe zimanê çavên te!

Gelo wê kîjan demsal şûna bihara
kenê te bigire Tavda!

Di hemû şiverêkên dilê min de şopa
mekapa lingên te heye Tavda.

Tu bûyî gulek ji gulên Gulanê.

Kûr û dûr neçe



Dilopa deryaya girava dilê min, dûr
neçe... Lê tu çûyî... û ez têgihîştim
wateya bihar û payîzan... Bi evîndariya
dilê te û bihara te...

Xwişka min

Xweşika xewnerojka min

Te gotibû; "Heçî bigihîje wateya
payîzan, bihar û havîn xelata wî/wê ne"
Bila xelata min jî kenê te bûya.

Girtîgeha Bolûyê



Ji yara xwedawend re lawijên dilekî

Evdê Koçer CANO

I. Çav

Dikevim gola rewnaq
Ji avê re masiyê bê dasî ye çavên min
Hêşînok e dilê min
Ji sê çeman yek kesera heka min e
Ji du çıyan yek sebra diya min
(Ku bavê min har bibûya "Ne behr
bû ne jî Xwedê")
Loma bi qasî pehniya deveyê jî
Ji Nîlê hez nakim!

II. Dest

Sor in kevirên gola çavên te
Dimijim bi tîbûna şervanekî
Porê te kevza xewnekê
Û gulan diçinim ji kaboka Çiravê
Belkî giriyê Starê be
Xwîsiya gula destê te
(Destê min keleka zeryayên hêsîrên
evdalan)
Va ye min destê xwe da destên sibehê
Êvar ji dîlanan re dengê te
Jixwe û lewre û her wekî din
Va ye min destê xwe da bayê şevê
Destê min cemidî
Û ji sê car û nîv zêdeyî lihêfa min bûn
Lingên şevê
(Off! Çi bêhn da)
Û ji bo, ji lewre û her wekî din

III. Ziman

Mirin jî tê çûyîn jî axir
Temenekî kurt û kurmancî
Zimanê min biyanî ye
Ji qut û giloweriya rêzimana gêrikan re
Binihêre dinivîsim gotinên vê çûyînê
Her tîpeke wê agirê kefa Garisan
(Dizanim çîrçîrok e, biratiya gur û
mihan)
Û her wekî din, her wekî din

IV. Dev

Ji nimêja eşayê re gunehên şevê me
Bêdestmêj im û xwe bi xwe dikenim
Şeytan bi xwe me îşev
Û ji xumama çavên yarê re
Banga tîna sibehên germijî
Banga nimêja sibê
(Û kuxiyam kuxiyam kuxiyam
Û devê min dojecha gunehên devê
qereçıyan)

V. Dil

Bi sê wextan nêzik e Zagros
Ji her çûyînekê re
Pelekî pirtûka pîroz ê perperîkan
Dişewitînim û didim destê
Ameda dîl!
Bi sê dangan lal e Laleş
(Here oxir be Avaşîn
Here oxir be Hêzil)

VI. Serî

Konekî stûr li eniya Xwedê
(Min fêm kir min çima
Serê Wî dişiband teştê cilşokê
Destên diya min xweşik in!)

Min serê govendê jî şuşt
Bêhna kizwanê tê ji dîlana me
Û min destê xwe de destên yarê
Bililîne Kurdistanê min
Yara min a Xwedawend!
(Ku em her êvar
Pêgermoka digêrin bi hev re
Her wekî wê
Her wekî wê...)

Man û neman û hwd

Evdê Koçer CANO

I*

Xwedê ji nerm diajo ber te lêêê! Her hal qiyamet ji MA piştî te. Ê her kes “man û neman”ên xwe...

Man û nemanên min sêqorzî ne.

Destpêk: Beriya te ji hebûn, lê gilo-ver bûn. Weke pêsîra yadê** Hîna qor-ziyên bûyînan serî hilnedabûn. Li ber geometriya min a xeşîm.

Dilpêk: Gava tu hatî dîn û har bûn. Xwe tûj kirin. Heta ku min ew gihan-din hev. Nîviyê min ma; nîviyê min da dû tiştê çû.

(Bila be. Xisara wê tune ye. Ma ne wê bê, ez jê re dizanim!)

Serencam: Niha dihesibînim bê ka çend çiya çêdibin ji çûyînen çavriji û tê de çend zarok dikarin bafirokan berz bikin. Bêyî tîrsa Xweda û qralên wî!

II

Meşa ber bi asoya moriyên rêwî li min, gihîştina têrbûna zarokên giryani li te. Binihêre eva han pêpelîka wê çûnê ye. Ha ev ji hespên hevrê yê zaroktiya min û te.

Ez û tu, di agirê du dilên hilorî yên herî sorgez de dikevin taya hev.

Piştî li qiraxa du çavên kilkirî yên herî gewre digihjin awirên hev.

(Ax, xeyaleke dûr e, lê çi bikim deqên li rûyên MAYînan ramûsan dibe zînin lîvên min.)

(Niha?) Hespên me hev nedîtine ji zû ve ye!

III

Dimeşim li pey qasidên xeydok dîsa. Dikevim pey qasidiyên “man û neman”ê. Bê pîrs.

Ku bibêjin nîvmirin e. Li min negire delal (xwe nekuje jî, qet nebe bila destnî-mêja çûkan neşikê) Binihêre, çûyîna rîya vegeran dipîve. Ka haydê bilezîne. Em li paş man. Em man. Ma ne heyfa jina çê ye ku nêrî jê re bûye ajo-t-van!

Ha ji vê ye; em ji yên çûn bi qasî qasî-dekî qenc, bi qasî qasidiyeke nîvco kêmin. Ji vê ye. Ji tiliyên me bêhna barûdê tê. Ji pehniyên me dengê lîlandinê. Bizirê hatinên mizgîniya bobelat karesat û her wekî din. Striyên tiliyên me zîl didin. Ji pehniya me xwîn dibişkive, xwîn dibişkive xwîîn!

IV

Kefiya kê ye ev a li ber bayê diçe û tê. Şûtika kê bû ma li ber berfîneke şikestî. Li piştî wê panzerê; destê min, li wê şikeftê; lingên min, li wê xezebê ha awirên hevalên min MAN!

(Dengê kê ye, kê hişt, ku; li ser awirên neşûştî lorîkan dilorîne.)

Niha gazên kîmyewî, niha bêhna xwîna ciwanî, niha kenên me yên ji şahiya şeva çûyî man di nava hev de.

Li hêviya hatina şergeleyan...

Li wê şikeftê, şopa koçer! Li wî tehtî teniya çaya wî. Nameya heka wî ya zindanî. Li wê şikêra ha MA, dengê wî yê zîz “Hewlêr Hewlêr namîne wek caran....”

V

Bi roj mamsosinan kom dikim ji bo we. Nayê vegotin, dişibe bêhna kefa



destê we ya herdemciwanî.

Bi şev, heyv, xwe ji şeva biharok re dixemilîne. Awir di êwirgehane de ma Canîno!

Li bajêr; pisîkên sîkakan jî ketin xaniyan, şaneşînên ronî berî panzêran xwe tefandin.

Çûyîn ne di bêhna wan sosinan de, ne di tehma wan rûwêsan de.

Sosinê, gulêêêê de bistrê bila sikak hinekî bi ser xwe ve bîn. Bila meriv bibîne bê ka orgazma muzîkal a bajarekî çawa çêdibe? Bistrê da ku evînên piştî çûyînan jî hew li ber xwe bikevin.

Hêê, Gulêê, de bistrê lêêê!

VI

Meqamên cangoriyên cancanokan li min, ên hezkiriyên xewle li te. Ka em biceribînin. Ha ji wî aliyî sê gav, yek, du, sê. Ha ji vî aliyî ve..... çûn û hatin.

Şer û pevçûn man û neman. (Aaxx, dîsa zagona xwezayî.)

VII

Ew şevên ji zivistanan bêzar in li min. Pelgên hêşîn ên dara şadiyê li te. Bila bêjin, kî hildigire barên moriyên cangoriya riya canê. Ez jê re gorî bim. (Heger hîn ne dereng be ji honandina guliyên re)

Kembera navtengê kin neke, bihêle bila ziravî, ziravê stranbêjan biqetîne. Bila bejindirêjî yê dengbêjê xwe.

Ez? Ez dirêjtir nebûm tu carî ji wî deriyê ku aqûbeta xweliya serî ye. (Bi ser dê û bavê xwe ketin!)

VIII

Bila çavrijîna dirêjahiya riya hemû tofanan li min. Gihîştina destên sor-gul li te be.

Em du şervan in, du şervanên Cûdiya Memzînyayê. Çiyayê hezê li me stargeh, li me perestgeh e evîn.

(Haydê, keştiya me bi rê dikeve em jê nemînin dîsa.)

IX

De bila -heger hebe- hemû gunehên vê evînê li min, hejariya peyvê û hêza hemû heyamên hezê li te be. Da ku çaxa ku daxwaza min a dawîn bipirsin di zengê zimanê min de, nelikumin awirên te.

Da ku tu bi hewara min werî, bi şûrê edaletê, bi gurzê wekheviyê, bi guleya gulberojkê.

...

Lê ku bimirim

Dixwazim hûn min bi gulberoşkan bi rê bikin

Lê ku bimirim ez

Dixwazim hûn min di nav gulberoşkan de veşêrin.

***Destpêkirina bi navê wî diyariya Seyda ye. Bibexşîne Seyda, ji min ew qas!**

****Bêhna şîrê ku ji dirûşmeyan dihat, ji wê bû her hal.**




Ji biyaniyan re awaz

Naîf BAL

Li qûntara Çiyayê Mûnzûrê tê zanîn
 Keçan, porê reş, çavên beloq, jana dîl
 Piştî hêşiran emrê xwe li binê zinar lod kirin
 Bi dûmanê çawa rovî biricimînin di hêleya Dêrsimê de, dan ser
 Jahriya zeriya zilmê ew kuştin li binê şikeftê
 Ax rebenino, hûn hêja bi singê dayîkê dimijiyan
 Hûn hêja negihîştibûn emrê jehriyê
 Hûn ê nebînin, dê birayên we bikujin bi bêhna sêvê
 Weke miyan civandin li Dêrsimê, li Newala Lacê
 Qêleya nîvroyê serê xwe çawa têxin bejna hevdu, wisa
 Bê dor; biçûk, mezin, pîr û kal jinên ducanî
 Nîşan negirtin, çawa kevîran bavêjin nav refê çûkên rêwî
 Bû teqeteqa mîtralyozê, kenekena xwînxwar, qareqara neçar
 Teyrok e, lib bi lib ji goşiyên tirî ketin
 Bahoz e, perçiqî zeriya genim
 Weke belgên payîzî hişk bûn, dar ma çîptazî
 Ba li wê newalê bilûr e, dilore zarîna dîl
 Şerm e, kir û nekir nekarî tenê bihêle
 Ax! Li van çavên hêvîdar êdî nabe sibe
 Roj derket, berbang sor bû, nihêrt Lac sortirîn
 Bûye lehî, gelo dê çîrokan bihêle li pey xwe
 Rûniştin neçûn da ku mirî nerevin
 Stêrk nahewin hetanî êvaran, wana nejmêrin zarok kanê
 Leystok xera bû, vêca gustêrkan kemîn danîn, tev mirin e
 Ev devên vekirî, zikên werimî dê dubare be li Helepçeyê
 Mirov avêtin agirê ji loda mirovan, ey Xizir
 Çavên wan li rê bû nehat teqeteqa gopal
 Yan Bozê pîkul bû yan tu ji tirsandin hey hewar
 Tîjî zêr kirin berîka Rayber, belê di singê de xwîna sar
 Û diqîre Besê, di berbanga dilê min de ew hiltê
 Niha her şev li pey digerin şervanên azadiyê
 Navrojê bêdeng e, êvarê xwe dispêre şibakeyên malan
 Ku dengên zîz dibihîze, bê xem radizê
 Va ye heval hatin, cemed dihele, dê erd aj bide
 Yan hevjin an aqûbeta Dehaq
 ÊDÎ BES E!

Girtîgeha Bolûyê

Qedrî ALKOÇ


*Heke tu bihar î
 Bayekî bişîne ji min re,
 Bila di nav de bêhna porê yara min hebe
 Heke tu havîn î,
 Di heyva şevê de xwê bide
 Wêneyê yara min binexşîne,
 Ji bo tarîtiya çavên min bişikê
 Heke tu payîz î,
 Bi baranê re were
 Dilopek hêvî bibarîne,
 Ji bo xewnên min ên sêwî şiyar bibin
 Heke tu zivistan î,
 Cemedekê bişîne,
 Ji bo dojeha dilê min vemirîne
 Na, heke tu celad î,
 Ji min re sêdarekê bişîne,
 Ji bo, ez di dilê xwe de biçînim*

Girtîgeha Semsûrê



Tu!
 Tu li ber çavên min î her dem
 Kilê li ser çavên min
 Roj bi te
 Şevên min bi xewnên te dix-
 emilin
 Dilê min
 Tîm bi te xweziyan girêdide
 Bi tînha pêknehatinan

Tu!
 Tu di bîra min de yî her dem
 Bîra ku ji êşan afirî
 Gul bi te dibîşkiyîn
 Xweza, mirov û dem
 Dil bi te tîn barkirin
 Wekî rêya bê vejer
 Xwe
 Tîm bi te dişon
 Ey hêviya mordem

Dilam

Mahmût ABA

Demsal!
 Demsal cardin zivistan
 Cardin seqema
 dûrahiya te ji ba min
 Ez û pênuşa min
 a zimanqerimî
 Te dinivîsin

Li vir zor zehmet e
 dilam!
 Jiyan pir bi êş e
 Êşa ku
 Di nav bédengiyê de
 mirov difetisîne
 û zirav zirav kezabê
 girêdide
 Lê!Lê hebûna te
 Tîna rojgermkê dide
 Li ser mekanên min
 Taqet hildigire
 Û dem diherikîne

Şevên li vir

Mîna zîftalan tûj û tarî ne
 Wekî şûrekî devşirik
 Li ser singê min diçikilin
 Birîna bê xwîn
 Di bin lingê asoya
 derewîn
 û kenên rengbihar
 ku bi min dileyîzin de
 dikelijin

çavên te yên reşbelek
 dişeriqîne zilmata min
 hembêza şevên tunetiya
 te de
 aş dike bîrîkirinên min
 pêşiya min ronahî
 û birînen dilê min
 kewiyayî
 dorhêla min
 dûwarên bextreşiyê dire-
 qîsin
 mohra firewinên demê
 li ser rûyê wan cemidiye

diranê gurê devbixwîn
 sûrê, zilm li wext pêçaye
 stêrk nabiriqin
 Lê, eyama mirov nenas
 Ne zarokekî ku di
 dergûşê de ye.
 Were qefaltin dilam!
 Mîna kewa ku di qefesê
 de
 Ne tê girtin û ne jî tê ser-
 jêkirin

Erê dilam!
 Peleşemkên hêviyê ku ji
 keviya çavên te
 Xwe digihînin min
 Demên min didizin
 Dibin û direvînin
 Digihînin dîroka jibîrkirî
 û rûpelên ku ji azaran
 hatiye strandin

Girtîgeha Sêrtê



Tê bîra te

Kerem OZTURK

Min şîr didot ji çiçikên şevê
 Û di neqeba dilê xwe de
 Stranên nûvcomayî dimeyand
 Yek bi yek wînda dibûn xeyalên min
 Yên ku min bi hestên zaroktiya xwe
 Mezin kiribûn
 Di nava mêrdezima berbangê de
 Di ariyê ar de difetisî
 Çîroka welatekî windabûyî
 Dilê min di nav lepên şevê de
 Dihat guvaştin
 Û bi têla tembûra
 Melkemotê awirlewend ve
 Darvekirî dima.
 Tê bîra te
 Dema ku ez û tu di peyarêya
 Keviya behra dilê min de
 Di bin xunava baranê de dimeşîyan
 Û min di çenga xwe de
 Dilopên baranê yên ku
 Ji porê te dadiweşîyan
 Kom dikirin.
 Îro ez dîsa di vê peyarêyê re
 Derbas dibim
 Bi hesret li şopa piyên te digerim
 Li ser ava peravê
 Wênayê xeyalên te
 Ji min re dibişire.

Girtigeha Bolûyê

'Û'ya min mezin e

Îlhan Samî ÇOMAK


Û me çaroxên xwe vajî kirin, rewrewka sibeha me lewitî. Û em meşîyan mîna zarokên bê derpî, niftikên tiliyên me bişkokên jinan disincirandin. 4 di bin lingê 3'yan de diperçiqî û me ezmanê Amedê bi bîr dianî. Û min berê devê xwe dimalaşt, dişûşt, dialast. Û derya li ber simbêlê min kil dibû. Û kevok bi tîpên latînî digiriyan û di devê hehecikê de navê yarê... Û mele bang dide, rûdinê neynûka xwe dikojim. Û hîv derdikeve û ez dikevim bin siya gulekê. Heçko mirin xwe ji bo min amade dike û ez radibim jiyanekê berhev dikim. -Li ku man perperîkên porê min?

Û deriyê rûyê min vedibe û sînoren singê min li hev du dikevin. Û rismê bêxewiyê nexşên kalbûnê çêdike li hetava me. Û em pêxwas in û tîrên me wekî helwesta deryayan artêşa hovîtiyê. Û dicûm, dicûm, dicûm... Nizanim di devê min de çi heye. Û çerçiyên me bircên Amedê difiroşin. Masiyên me çarmêrkî rûdinên û dikevin pey qotikê cixareyan. Bi dûxana wan, ez li deriyê evîne dixim. -Paşê min tu tazî kirî.

Û ez dîroka me ji ber dikim û ji ber çavnebariya çivîkan hildipekim devê sîs-marekî. Û bi reşikan re silavan dişînim ji we re. Bihara lambeyên bedena min dişikên. Û xaçerê di bin tariyê de difetisin. Geh tîn, geh disekinîn bayên ku di nîveka tebaxê de digindirin. Û ez encax bi rêzamaniya pêxemberan navê te fêm dikim. -Erê çivîkên singê te ne, dixwînin

Û av tê, li qeraxa agirê mûmê disekine, kela canê min radibe. Û ez şiyar dibim û dikim himehim û aşê zeman bi

xwêdana xwe digerinim. Û şîr vedixwim û li ser bihûştê difikirim. Û bi pêştenga hespê xwe dibezim şînahiya ezmanan. Û bi gîsinên bapîrê xwe lînûska erdê dinivîsim. Tenêtiya jinebiyan dirêj dibe mîna qafiyeyeke rindik. Û ez ji keşeyekî îskanek av dixwazim. Û li ser zimanê min xwîna Xwedê pêl dide û îskeîska Îsa digihîje erşan. Bi tîpên girdek vedibêje: EZ JI ÇEWLIKÊ TÊM - Û tu jî ketî xewna min, ew jî bû ya Reb!



Û şaşika min ji Adarê re dibe perdeya evînê. Û baran dibare û derya kezw digire. Û ez bi xêzên stûr bayê diqirpînim û ez li saz dixim, wêneyê xwe bi dar ve dikim, dîwar hildiweşin. Û min bi devê jinan got: Bertek! Û danê êvarê bû. Û min dîroka pêxemberan xwend û êşa tuwika lingê min gihîşt ruhê hestiyê min. Û di sîndoqên diya min de bêhna hezar û neh sed û çil û nehan difûre. Û ez li ber xwe didim û tavê dikurîşînim eniya xwe. Û çîpên xwe dirêj bikim heta dawîya rûbarê û dikenim û di atlasên şevê de sûlavek dibirîqe. –Me li herikîna avê temaşe kir, bêdeng...

Û roja me vezeliya, qirçînî ket nexşeyan. Û min toqa çiyayan şikand û qêriyam, min xwê reşand ser çavên berfê. (Bêrfê erê bêrfêêêê...1, 2,5, 6. Min 3 û 4 bi kar anîbûn. Min rimên tavê daçikandibûn bakur û başûr, min ji hêkên gewez hez dikir û bi hungilîska xwe dilist...) Û li hember sêdaran min li ber xwe da û pelên gûzan bêhneke xweş vedida. Û min bi rojan pirtûk xwend û devê rûpelên pirtûkê xweşbînî vedigotin. Û şemiyên me demdirêj bûn û zimanên ku min nizanibûn bi destên min girtin. Û min por berda. –Konê me bû, ew di bin tava bedena me de şewitî.

Û ‘Ûyên min mezin in û bi çarçoveya Xwedê tîn parastin. Û şanênava min pêşgotina newalan e. Û şiyar dibin tîpên min û bi hogirkî rêz dibin û romana gêrikan dinivîsin. Û karik dikalên û em bermakekê çêdikin

(Wekî vê: Ez ji te hez dikim)

Û min ji êvaran hez dikir, ji ber ku deriyê şevê vedikirin û kêfa avê hîn spî dibû. (Wê rojê hêrsa min rabûbû û çûbû ser rêlan. Berê, min kincên daran çirandin. Asmîîîî! Gote min. Nêrgis bi xwe hatin ber destê min. Û her cure kulîlk kom bûn li ser lêva te. Û bêhna dinê guherî û te ez ramûsandim, milmi-landim û...)

–Avê jî navê te ji ber kiriye li ber vê dinê. Min xwe şûst.

Û ez wek kevîrekî kevn warqilîm. Zimanzanên şevê, raza me kifş kirin û zeman mîna titûna şil bi kêrî tişteki nedihat. Û te goreyên xwe li pê kir û ji şopa pehniya te bîr ava bûn ku me av jê vedixwar. Û me guhê balindeyan qul kir û me xwêdan da. Û me li dora deştan (ku me heta sibehê bi fitika xwe av dida) bi xwîna xwe çeperek çêkir. Ango bêdengiyê rûyê xwe zivirand ser me. Û min nekarî vebêjim xew û xewna te. Û stûna ezmên hildiweşiya û nivîsa te xweşik dibû û devê te qonaxeke Xwedê bû. Û em pak bûn, pak bûn, pak bûn.

–Ne xewn e, ne wilo ya Reb?

Wê çaxê min siyaneke mezin hewce ye ji gumgumokan re. Û min hişkbûna latan hilgirt çavê xwe. Û bi bend û werisan hilkişiyam jor û min pisûleya rojê rast kir. Û min bi cetwelan refên balindeyan bi rêz kirin, asîman bêtir şîn bû. Û paşê derya hat bîra min û ji ava naşît pêk tê. Û min xwe tazî kir û rabûm û rûniştim. Û ez bi balûkên destê xwe listim û min tenêti û tazîbûna te nivîsî (tenêtiya te na, lê tazîbûna te hîç naqede) û ez têgihîştim raza evîna hemû masî û kişweran û med cezîr nasê dengê te ye.

–Av ava te ye.

Û em çûn serdana hîvê û valahiyê deng vedida. Û xofek kete dilê min û ez qinûsîm û min bedena xwe da ber bayê. Û min kevir avêt darê, tenêtiya darê mezin bû. Û neynûkên min dirêj bûn. Min bi destê xwe hêrsek resimand û hêrs rabû û min bawîşka xwe anî. Û porê ferîşteyan rûyê min nixumand û vingîniya mêşan kete guhê min. Û min bişkokeke xwe vekir û gul bişkivî. Û ez bişîrîm û zeman wekî pisîkekê xwe bi xwe dilist. Sal du hezar û şeş bû û navê te zimanê çiyayan diqerimand.

–Ji nişka ve roj hilat. Û bi biskê bayê

Evînstani

*Digel ku her car têk diçim jî
Çawa ku bûbe kevneşopiyeke
jênager*

*Her sal miheqeq çend caran
Ez barek genimê başneqandî
Dibim aşê bêhişiya wî rebenê
Don Kîşot*

*Ku bihêrim û bikim qûtê
evînstana giran*

*Bi serbarekî êş û elem ve
dizivirim*

Evîn jî wek şer e

Qet şaşiyar nabexşîne

Zekî KAYAR

fe
fe
s
i
e
E

*Yek, pêpelok
Du, pêkenok
Sê, pêgermok*

*Aha ji we re
Felsefe û rewşa
girtîgehan...*

Aşê êşê

*Carinan serî li mirov digere
û wek sewsiyan li mirov
tê, ji ber çî û ji bo çî ye
jî tu kes nizane. Gor-
bihuştên pêşiyên me
gotine “Nezanîn ri-
hetiya canî ye”, lê
kîngê û ji bo
kîjan bûyerê go-
tine nayê zanîn.
Ma pêwîst e ku
wekî bê zanîn?
Wê jî nizanîm.
Meseleya eht û
behtê ye.*

*Meseleya kew-
pelêndêriye ye. Mese-
leya xumambarî û
gumanbariyê ye.
Her du jî rastiyên jiyanê*

*ne; jiyanê bê guman; gumana
bê xumam, nayê fikirîn.
Tune.*

*Jiyana bextewar her tune, belkî
îdeala wê hebe; “belkî” bi xwe
jî sûretê guman û xumamê ye.
Ger bê pirsîn her hal wê tu kes
ji wan ne xweş be, lê nexwe di
rastiyê de ji wan dûrbûneke
zêde jî tune, nêz in, heta bi hev
ve ne, di nav hev de ne.
Bi ya min jî gumanê re jî
tecrube lazim e. Bêyî tecrube
mirov nabe gumanbaz.
An jî xumambaz.*

*Gumanwariyeke di asta
xeşimtiyê de jî ne tu huner e.
Her tim mirov mehkûmî
têkçûnê ye. Eynî wek wateya
helbesta “evînstani”yê.*

Şikandina zincîr û kelepçeyan

Zekî KAYAR

Carinan mirov ew qasî tengav dibe ku mirov dibêje qey hemû cihan bûye dijmin, her kes û her tişt dijber e, çewt in û berevajî ne.

Berevajî ne û bi ser mirov de tîn.

Carinan jî ne dijberî mirov, dijberî wê rewşê çêdibe. Hingê jî nêzikatiyeke erênî ya herî biçûk jî hestên dilovanî, şefqet û merhametê bi mirov re çêdikin.

Wek du demsalan, wek du felqên firaqa mêzînê...

Du qewimîn in, du cem in, du alî ne, du hêl in, du fer in... Lê belê rastiyeke jî heye, tenê rastiyeke.

Ango libek, anga hebek, anga hêlek, anga kêlekek...

Vê serdemê jî ber gelek sedemên girêfitk piranî hestên xala pêşîn bi wan re peyda bûne, peyda dibin. Bêmorali û kovaniyeke kesneditî jî li ser hêvî dikim ku demkurt be ev taviya ewrên reştarî.

Lewrê eger demdirêj be, dibe ku veguhere nexweşiyên kronîk jî. Mirov jî goşt û hestî pêkhatî ye, şîrê xav vexwariye, wê kîngê, çi, çawa bike ne aşkera ye, elbet hiş û sewda û fikr û raman, exlaq û wijdan, mirov jî mexlûqatên din vediqetîne, êdî ka ew jî çiqasî saxlem be. Çiqas mîsoger be, çiqas zanyarî be û çiqas bi zanebûn be.

Ji ber xirabî û rûxandinên di nîrxên mirovan de çêdibin aso şêlû dibe, gerdûn tarî dibe û hiş diheşîfe. Her aşkera dibe ku sînorê mirov û dirindeyan ne



zêde dûrî hev e, tenê xetereke zirav di navberê de heye. Hema piçek tenê jî zorî bigihîjê wî sînorî, talûkeya derbaskirina xetên sor ên cemaweriyê bi tevahî îmhâ bikin.

Tedawiyeke tomerî lazim e.

Anga civaknasiyeke hemdem, zanistî û rastîn.

Ew jî "civakîbûyîna azad" e.

Ne şert e ku îlehîn xirabiyên qîrnê herî dawîn çêbibin, piştî mirov li xwe hay bibe. Hîna di destpêkê de jî mirov xwe komî serhev bike baş e. Kombûna mirovahiyê, komûnalîteya rizedarî...

Çawa ku Roûsaû jî gotiye, "Mirov azad jî dayîka xwe dibin, lê li her derê zincîrkirî ne."

Jixwe mesele tev di zincîrkirinê de ye. Ew dibe sedem ku mirovahî bê ber sêdarê û bikeve ber ta(ya) fetisandinê.

Vêca zincîrkirin jî, ne tenê hema zincîrkirinên qelsan in, temam, ew jixwe hene, lê bi wan re zincîrkirinên xef jî hene.

Yên herî xetere jî ew in.

Şikandina her cûreyên zincîr û kelepçeyan deynê stûyê mirovahiyê ye.

Ziman aîdiyet e, nasname ye

Mehmet BOŞATLIOĞLŪ

Beriya her tiştî ziman aîdiyetek e, nasnameyek e. Eger gelek bixwaze, zimanê xwe yê zikmakî bi dîrokê ve girêbide û bigihîne dahatûyê, divê pê bixwîne, binivîse û bigihîne asta xweifa-dekirinê, wek hemû gelan pêwîstiya gelê kurd jî, bi vê yekê heye. Hem jî hîn pirtir. Zimanê kurdî ji pêşketinê re, xweşikbûnê re û ji wêjeyê re vekirî ye û dewlemend e, pêwîst e gelê kurd û her ferdê/a kurd bibêje, “Ew zimanê min ê zikmakî ye û sedema hebûna min e.” Û li zimanê xwe xwedî derkeve, ne wisa be dê mafê wî/wê tune be ku ji tu kesî gazindan bike. Ev pêjinkarî be, berpirsiyariyeke dîrokî ye.

Sedema ku heta niha nekarî xwe tam bi zimanê xwe îfade bike, xwedîderneketin; weke ku me gotî zimanê kurdî zimanekî berfireh û dewlemend e, ji ber pîrbûna zaravayan û her wekî din, hîn zimanekî neteweyî derneketiye holê. Feqet mercên îro derfetê didin ku ew jî bê kirin. Îro zimanê kurdî ne di rewşa berê de ye û di qada navneteweyî de, ne fermî be jî, gihîştîye asteke wisa ku dikare xwe îfade bike. Lê em nikarin bêjin em gihîştîye asteke wisa ku em karibin hemû karên xwe yên siyasî, bîrdozî û diplomatîk pê bimeşînin. Bê guman ev jî ne kêmasiya zimanê me ye, kêmasiya me bi xwe ye. Divê hîn pirtir em li ser ziman bixebitin. Ji holê rakirina kêmasiyan û pêkanîna diyalogan jî bi ziman pêkan e. Ji ber wê yekê jî divê her kurd zimanê xwe biparêze û bi pêş bixe.

Dibe ku hinek ji me bêjin, “Ji ber ku berê, min perwerdehiya kurdî nedîtiye ez tam serdest nîn im.” Dibe, lê temenê hînbûnê tune. Tew, hînbûna zimanê zikmakî be.

Ziman, ne hêmanek e ku di zikê dê de tê hînkirin. Ji wê zêdetir mercên civakê yên sersazî û binsaziyê karîger in. Di civakê de kîjan ziman serdest be, ew ziman tê hînkirin.

Feqet ferq di navbera zimanê zikmakî û zimanê perwerdehiyê de heye. Bander û hêza zimanê perwerdehiyê, kûrtir e. Çimkî wate û giraniya her peyvê hîn pirtir bi zanebûn di hiş de tê bicihkirin. Encax bandora mercên civakî (di heman demê de pêvajoya qedexeyan e jî) zimanê ku tê hînkirin gelek peyv û têgehên ku nayên fêmê jî, di nav de ne. Ev jî encax têra pêkanîna pêwîstiyên rojane dikin. Têra siyasî, diplomasiyê, diyalogan nedikir. Ev tengasî jî bi piraniya zaravayên zêde pêk tê. Wekî mînak, ji ber zaravayên cuda gelê me yê li her çar parçeyan nikaribû, bi hêsanî têkiliyan daye. Eger pergaleke xurt a perwerdehiya neteweyî hebûya, ev zehmetî nedihat kişandin.

Her çiqas pêşketin û berfirehbûna zimanê kurdî zêdetir bibe jî, em nikarin bêjin em di rewşeke baş de ne. Ev rewş, ji derbirin û têkiliyên rojane jî tê fêmkirin. Êdî wext hatiye ku em kêmasî û qelsiyên xwe yên di hêla ziman de bibînin. Heta em dereng jî mane.

Zimanê me, digel hemû zext û zordariyan jî xweşikahî û delaliya xwe heta îro aniye. Lê belê ji nivîskî zêdetir bi gotinkî (devkî) bi pêş ketiye. Êdî ji vir û pê ve dimîne bi xema me ve. Ev peywireke dîrokî ye. Bi awayekî serkeftî pêkanîna vê peywîrê jî encax bi bikaranîna ziman gengaz be. Wek ku di serî de jî me gotibû, ev encax bi xwendin û nivisandinê pêk bê.

Çavkaniya zimanê kurdî, gelê kurd bi xwe ye. Em ji bîr nekin ku gelên hemdem gihîştîye merheleya netewebûne, bi

gelemperî yên ku zimanê xwe baş dixebi-
tînin û hîn ji bo ku zimanê xwe pêş-
bixin, bê westan û rawestan dixebitin.
Neteweya azad, pêşiyê bi ziman û nas-
nameya xwe hebûna xwe îspat kiriye û
bi zimanê xwe aidiyeta xwe parastîye.

Di bingeha xwe de hînbûn û pêşxis-
tina zimanê kurdî yê ku wek dîroka mi-
rovahiyê qedîm e bi qasî ku tê
texmînkirin ne zor e. Di pêşxistina vî zi-
manê qedîm de digel pêşengiya rewşen-
bîr, pispor û zimanzanan, her kurdek jî,
bi xebateke mezin divê zimanê xwe hîn
bibe, eger ji me re zor be jî, ya rast em ji
zimanê xwe hez jî dikin. Lê herhal em ni-
zanin ku, em ji zimanê xwe hez dikin.
Eger ku em bi hezkirina xwe ya zimên
bizanibin, wê daxwaza me ya hînbûnê jî
zêde bibe. Wê ev jî bi xwe re axaftin,
xwendin û nivîsandina bi zimanê zik-
makî bîne.

Ji kirûyên sereke yên gihana kesaye-
tiyeke xurt yek jê jî ziman e. Dîsa yê ku
civakbûyîne pêk tîne ziman e. Eger em

bala xwe bidinê, yê ku kes ji nav civakê
radike, dike pêşeng û xwedî wesif, dîsa
ziman e. Bêguman ziman bi van tenê ve
jî bi sînor namîne. Kes, bi ziman dikare
bi gelên din re bi kes û civakên din re jî
têkiliyan deyne. Ziman çawa ku jiyana
takekesî bi kes dide hînkirin, wisa jiyana
civakî jî dide hînkirin. Feqet encameke
çawa ku “Her tim ziman aliyê baş dide
hînkirin” ne rast e. Bi aliyê erênî re po-
tansiyela aliyê neyînî jî bi xwe re tîne.
Ango ziman hem hêlîna aliyê erênîyê ye,
hem jî ya neyînîyê ye, çimkî tiştên neyînî
jî bi gelemperî bi alîkariya ziman tî-
nin. Encax di xebitandinê de başî û xe-
rabî jî hev tînin veqetandin, zimanê per-
werdehiyê û wêjeyê divê ji zimanê
berhevkerî xurtir be.

Ji bo ku zimanê me ji bandora zima-
nên din rizgar bibe, divê her kurdek pê-
şiyê ji xwe dest pê bike. Pêşiyê em hîn
bibin. Piştî tiştên hînbûyî bi malbat û
derdora xwe re par ve bikin. Her kurdek
berpirsiyar e ku zimanê xwe hîn bibe.



Bila neyê jibîrkin ku wek her gelî, gelê kurd jî dikare debara xwe bi zimanê xwe bike, yên ku li çand û zimanê xwe xwedî dernekeve, nayê hêvîkirin ku li jiyana xwe jî xwedî derdikeve. Ji ber vê yekê navgîn û derfetên têkildarî ziman û nas-nameyê divê di jiyana rojane de jî baş bên nîrxandin.

Îro mercên pêşxistina zimanê kurdî ji her demê pirtir bûne. Bi rastî, zimanê kurdî, nemaze jî zaravayê kurmançî di dîrokê de cara pêşîn e ku ev qas bi berfirehî li ser tê sekinandin. Digel hemû duberiyên pergalên serdestan jî pêşketin û berfirehbûna zanîna kurdî berdewam e.

Xebatên ku îro di qada zimên de tên kirin, qederekî hêviyê didin mirov. Bi taybetî jî, çî enstîtûyên kurdî bin, çî jî komele û navendên çandê bin, her wiha bi wan re têkildar radyo û tv 'yên herêmi û neteweyî, dîsa sazî û dezgehên din ên çapemeniyê jî bo hînbûn û perwerdehiya kurdî derfetên mezin in.

Em dizanin ku zimanê kurdî di dîrokê de zimanekî ku bi polîtîkayên bişaftinê re rû bi rû maye û texrîbatên mezin tê de çêbûne ye. Feqet xweserî û reseniya xwe diparezê, ji ber vê yekê jî hemû teşedayîn û hevghîrana cewherê ziman, dê pêşketinên mezin bi xwe re bîne. Yanî teşedayîn, necirandin û gewzînkirin (*estetîzekirin*)...

Zimanê zikmakî, şexsiyet û karakterê kes datîne holê. Ev jî di jiyana civakî a afirandina keseyatiyeke gihayî bi xwe re tine.

Em dikarin bêjin, ziman ne tenê bostanê çandê av dide, her wiha hêmanê bingeîn a îspatkirina hebûna gelekî ye jî, çawa ku ji bo neteweyan şertê jênerger çand be, lingê wê yê din jî ziman e. Îro di peymana mafên mirovan a navneteweyî de jî ev maf ketiye bin ewlekariyê û pir xesas li ser tê sekinandin.

Zimane bê kêmasî yê gelekî, di heman demê de xurtbûna wî gelî ya civakî, siyasî, aborî û heta leşkerî jî dide nîşan-

dan. Ji zimanekî bi qisûr di tu qadên jiyane de encameke berbiçav nayê girtin.

Konfûçyus li hember pîrseke jê hatî pîrsîn, wiha bersivê dide; "Eger ez qral bûma pêşiya her tiştî, min ê zimanekî bê qisûr bîafîranda. Ku di ziman de qisûr hebe ravekirin jî kême e, çaxa axaftin neyê fêmkirin, hewldan û xebat jî rast nabe. Wê ev jî xirabûneke çandî û sincî (*exlaqî*) bi xwe re bîne. Û ev jî sedema xirabûna kesayetiye ye."

Ji ber vê yekê ye ku tê gotin, tu xebat; wek azadkirin û pêşxistina ziman ne bi zewq e. Xebateke herî bi tehm e, xebata zimên...

Ziman wek tovê dahatûyê ye. Tovekî ku ew qas jî bo gelan girîng e, çandin, parastin û veguherandina berhema ked û hewildaneke mezin e. Ev jî pêkanîn û pêjînkariyeke pir mezin dixwaze. Hişyarî û bi hevreyîna neteweyî jî şert e. Ev çawa ku dixuye ne zor e jî. Bi xebateke hindik jî bi ked û kefareteke hindik jî, gelek berhemên bi destxistin. Lê divê em pir bixebitin. Ji bo ku em zimanê xwe bigihînin asta ku laîq e.

Wekî encam, zimanê zikmakî jî bo ku gelekî û ji bo neteweyekê sedema hebûnê ye. Mercên heyî û atmosfera xebatê divê baş bên nîrxandin. Parastin û pêşxistina zimanê zikmakî jî bo me rêgezeke jênerger e. Çiqas hezkirin, evîn, hest û ramana zimanê zikmakî di hundirê me de mezin bibe, wê hevqas daxwaza hînbûnê jî zêde bibe. Em jî zimanê xwe hez dikin, lê em nikarin bibêjin xebat û hewldanên me yên hînbûnê, li gor hezkirina me ne. Kême û hindik in.

Eger civakek xerîbî zimanê xwe be, nexwe ber bi dahatûyeke tarî û talûke ve diçe. Encax bi pratîkê em dikarin bigihîjin hînbûn û ronahiyê. Ev jî peywira me tevan e. Ziman aidiyet e, nasname ye.

Girtîgeha Sêrê

Seba ma'a ma...

Kenan KARAASLAN

Destê ma'a ma
Zê tijî ya sodirî ya
Zê gul û sosina
Zê wele sûr a
ha baç kê, ha baçî kê.

Ax welat, wax welat,
ya, ya ya
Qe kes nêzane
no zerê mu de
çi adir weşêno?

Destê ma'a ma
Zê mîya azmên yu
keskûsûra
zê hewtreng o!

Çimê ma lew kena
Zê va yê sodirî
Zê şîlya hêqayî.

Destê ma'a ma
Zê arag a, govend a
Zê eşqê azadî ya

Her tim
Û her tim
Sewê dana
Zê adirê NEWROZê.

Destê ma'a ma
Zê tijî ya şadîrî ya
Zê gul û sosina
Zê wela sûr a
ha baç kê, ha baçî kê!

Girtîgeha Bolûyê



Elîfbaya şewitînên berfê

Tewfîq HÊJA

Ferhenga Kyê:

Kula kevntirîn
Kilama kedê bê kefen kuta dibe
Bi kel û kesera kevirîn
Me kurdan kir ku em vegerin konên
koçeriya xwe
Da Ku bikewînin kewijînên kujer
Da ku kenên kordunde

K

“Êrîş birin ser asîmanan”

Karl Marks

Niha sê bihuşt di bin xewnekê de ne
Komunarên Parîsa dest bi hine
Ku berî razanê dabûn dû keskesorê
(Û ku Yilmaz û Ehmedê me jî li wir,
dîmen û awazên xerîbiyê ne)

Tu tem

Tu tem goristana Perê Lacheîse

Kata karkerên Kurdistana eşqba-
ziyê rabûn
Kilê siphanî di kêlên spartakusiyan
dan

Û li welatê xwe nokeriya bi malme-
ziniyê xemilandî

Û nakokiyên şîlf î tazî birin giyotînê
Bi dîlan û tililiyê
Bi seyrana mij û mijdarî

Bonjour Misyo

Bonjour Misyo Danton

Gelek gelek Don Kîşotên doza xwê-
danê

Êrîş birin ser aşê mijokiya rûkubar

Keştî hebû, derya hebû
Xêlî hebû lê ba na
Hesp û rim, dil û Dûrsîna hebûn
Lê meyasêrî na
Gelek gelek paşê hate fêmê bi pê-
nûsa heramşîran
Romanên şîrhelal nayên nivîsandin
û me hê jî hêvî heye bi hunerê
Me bi hêza hezê bawerî... Hê jî
Dibêjim çavgirtonekê ji zarokan re
bihêlin
Dibêjim qametek berf ketiye ser
Qûleya Eyfelê

-Şanzelîze, Şanzelîze ka
Te ne got çi?

Ferhenga Eyê:

Erd evîn be
Ezman nîn be
Ew evîn be
Ez nîn im
Evîn heye
Û nîn e

E

Naşêm bê te bijîm
Naşêm bê te bijîm
Mixabin!

Naşêm, lewre zilm li dar e, har e,
mîna marê reş î kor e, kun kun kiriye
sibeha ku me yê bextewariya ji şeva
mayî li ser raxista. Min ê jî te re binki-
rasek bikiriya di berbanga bihareke
dilhebîn de, tu yê tevî vî binkirasê gul-
gulî û tenik î tul î ji xewa şîrîn rabû-

yayî, lê ne min ê karibûya ji te re bigota ew peşka mirinê ya di dirûvê guleke reş de, li bersingê kirasê te, ya kê ye; ne jî te yê karibûya xewneresşkên li eniya min bûne xwêdana giyanê jehrî, vegotaya min.

A baş tu bi pey hemû reşikên şevê bikeve, ku li ser rûyê heft parzemînên pîr, di bin behr û okyanûsên tîr û li heft qatê ezmanên qure û nêr in; ez ê jî hemû miriyên dinyayê ji mezêlên wan rakim, bersiva "Zindî pir in, ma kî ye ku bi vê nizane" bi serê zarokan de bikim û em ê hê wê çaxê li ba kevin û şevên şabûnê, xewnên şilûkinê û si-behên nehişyarbûnê bînin ji hev re.

- 2) Naşêm ji dilê te derêm
Naşêm di dilê te de bimînîm
Mixabin!

Naşêm, lewre bêdadiyê her der dagir kiriye, çal û kortên ku me yê tê de hev du hembêz bikira jî li gel. Ji xwe bêhtir bi te ewle me, me yê neheqî nekirina li tu kesê/î, lê neheqiyên ku li me û li çiyayên me bihatina kirin, wê pariya di dev de bikira kevir û wê diranên me yên ko, li canê çend kêliyên şadiyên jiyanê li ba ketina û wê hilm û maç û tama goştê xav û xwîn li bin guhê hev biketa; îcar ka li ku ma ji şaneşînên ji daxa ruh hatine pê, te-maşaya kulilk û perperî-kên gulana gulçîn...

A baş, em bi bêdrokan avê birêjin li dû her çûyînên ji dilan, da ku rê bêbextiyan nekin li me, da ku striyên serdestiya seyî li me neyên xezebê, di gera tewş a li bihuşta ku bihustek warê wê neha-

A baş, em bi
bêdrokan avê birêjin
li dû her çûyînên ji
dilan, da ku rê bêbextiyan
nekin li me, da ku striyên
serdestiya seyî li me
neyên xezebê, di gera
tewş a li bihuşta ku bi-
hustek warê wê ne-
hatibe mîtrokirin

tibe mîtrokirin.

Bi kêlikên goristanan ve dilebikim
Di ber re şal û şapikekî li welatê
xwe dikim
Di ber re bersingeke rîşrîşî dirêsim
Belkî rojekê bi ber singê te ve
Belkî rojekê bi ber newqa xweziyên
kujer

Ferhenga Oyê:

Ol û demsalên ocaxkor
Ofîn bi çavên kor xistin
Orîn bi rehên Cihanê)

O

Offyanê!
Te ez hînî tîna berfê jî kirim
Te ez hînî roja ku naçe ava
De êdî hez bikî bila şevên kanûnê
Hez bikî bila qet û qet

Dema te gencîneyên xwe tew kir bi
ser xizaniya min ve; dema şev xir-
bilî berî gîrnijînên me; dema qî-
loçê çêleka zerî çep dida bextê
me û rast dida kulên me;
dema li cema cem heft êlên
me hebûn û her yekî bi pi-
yaleyêke şerabê; dema me
digot şabaş ji te re şoreş,
êdî hevokên me jî bejin-
kurt in nola xelwetnişî-
nan; dema te ez hînî tîna
berfê jî dikirim, a hingê
dema zivistanê bû û min
digot bila qet û qet û qet
neqede, ev wane.

Offyanê! Berî ku xezalekê
rakim ji beriya hêsiyîya hepsê,
min bêjeyên qulqulîk, bêjeyên
keç û kurên zivistanê rakir û min
da pey rengerengiya azadiya wan;
fermo, kîjan li aşopên we yên reşbelek
bên, rahêjinê ji xwe re...

Offyanê! Bi reşî û xweşî û dirêjiya
şevên çileyana bikim, zivistan herî pir li
kişwerê me rûken e û herî zêde di can
û ruhê me kurdan de hene gizrikên
berfê û herî pir em li bendê ne ku
bextçakî guher bigire di navîna birî-
nên lewendî de.

Ka şerbeta girî jî hînî min nakî?
Û xwêya nav bişirînê?
Wext e, êdî, offyanê!

Offyanê! Ku ez li hemû qirnan geri-
yam û vegeriyam û hîn jî kenekî ter û
terhanî li keviya lêvên min be;

Ku ez berepaşî di nav her çar wer-
zan re derbas bûm û hîn jî kuliyên
berfê li havîna laşê min;

Ez ê bibêjim serkeftina gulê
Ez ê bibêjim heps û hedan
Û berxwedana min e jiyan

Baş e bi berfê, baş e bi berfê

Offyanê!

Offyanê! Min şev nîvê şevê libasên
bihara derewîn û pertalên payîza rû-
zerîn ji xwe kirin, havîn jixwe zarok-
tiya min bû ku êdî mîna mirovekî
navsere û bêguneh, ji hev dûr;

Û min şev nîvê şevê destê xwe ji
ometa bavan şûst, ku meytê leşkerekî
neyaran beramberî hezarên me hêsi-
ran e, ku bi deh milyonan kurd bi
qasî çengek Eskîmo ne, mêrxwasên
werza xwe ne û bejna wan kurt e,
bêhna masiyan heye di nêrinên wan
de, lê qe ne bendeyê berfistana xwe ne
û bi qasî ku nod navî li berfê dîkin li
ser esl û feslê xwe ne...

Offyanê!



Mala bavê min

Osman KAPAN

Ev qederê bîst rojan bû ku kalên gund li hev dicivyan û diponijîn. Me zanibû ku tişteki awarte heye lê qet tişteki nedihat bîra kesî. Carinan me jinan di nav xwe de digot: “Li gundên cîranê me hin mesele hene, giregirên gund wê çawa bikin, ji bo wê li hev dicivin.” Tiştê ku dihat bîra me ev bû.

Li mala bavê min tim û tim civat digeriya. Bavê min giregirekî gund bû. Li derdorê jî gotina wî bi teqil bû. Ango di nav ermenan de qedr û qîmeta wî hebû. Diranek bû bavê min -van rojan mala me hîn pirtir bûbû ciyê çûn û hatinê. Giregirên gundên dorê jî hinek dihatin, qederekê diaxivîn û zû vedigeriyan. Rojekê tepsiya çayê bi birayê xwe re min bir ber devê derî. Dengê bavê min bi hêrs bû, digot; “Divê em erz û eyalên xwe bi silameti derbas bikin, em ê bir bi bir û di riyên cur be cur re herin, da hinek ji me bifilitin.” Dema ev gotin hatin guhên min, min fêhm kir ku tişteki awarte heye. Min ji xwe re digot: “Belkî di nav me û gundina de, an jî di nava eşîra me û hin eşîran de tiştin qewimîne.”

Çawa ez vegeriya menzelê, min ji diya xwe re got; lê wê jî bi tişteki nizanibû, got; “Tiştên halo karê mêran in, aqilê me jê nagire.” Çiqas min zor da diya xwe, tişteki negot, êdî baweriya min rûnişt ku dayik bi tişteki nizane.

Diya min belangezeke Xwedê bû. Dev hebû ziman nebû. Çi bibûya qet nedipirsî. Hema di halê xwe de bû. Carinan min digot;

“Yadê, ma çima bav û birayên min

çi bibêjin hema tu wilo dikî?”

“Keça min, biryar a mêran e, divê mirov li hemberî gotina wan ranebe. Em ji mezinên xwe wiha hîn bûne.”

Me dizanî ew qas çûn û hatin ne ji xêrê re ye. Lê belê tişteki nedihat bîra min. Wê rojê heta derengê şevê giregirên me axivîn. Tiştê ku bala min dikişand, îro ji hemû rojan bi hêstir bûn. Çavên serê wan sor bûbûn. Te digot qey her kes li ser meytê bavê xwe bû. Ber esirê giregirên gundê me û yê derdorê belav bûn. Dema ku belav bûn, bi şid hev û din himbêz dikirin. Te digot qey êdî heta bi hetayê hev nabînin.

Çawa civat belav bû, bavê min em li hev civandin. Ez, çar birayên min, sê jinbirayên min û dayik. Bavê min bê mehde bû. Lê heta jê dihat nedixwest em lê bînin der. Em di mereqê de bûn, çavên me li devê bavo bû. Çimkî birayên min di nav civatê de bûn û wan bi rewşê dizanibûn. Ev jî di rûyên wan de xuya dibû. Bavo dest bi axaftinê kir; “Li gelek deveran dewlet û alîgirên wê dest bi qirkirina ermeniyan kirine. Ne dîr e, di nêzik de dê dor were me jî. Ji bo wê îşev ku reşayî kete erdê, em ê qefle bi qefle bar bikin û ber bi Çiyayê Agiriyê ve bimeşin. Tiştên ku hûn dikarin bi hesp û qantiran bibin, ên din bila bimînin. Em, Mala Agop, Xerebêt û Îskan qefleyek in. Mal û malbat wê ne bi hev re bin. Bila qefla hesp, qantir û pez; heft, heşt mêr biparêzin, malbatan jî yê mayî. Keça min, tu û Werdekê jî bi qefleya malbatan re bin. Jixwe hûn her du jî

dizandin çekan bixebitînin. Pênc ji we li pêşiyê bimeşin. Bila qefle qederekê li pey we be. Li pey wan jî heft, heştek wan biparêzin. Ango bila qefle di navbera we de be.

Ez keça malê him a biçûk, him jî bi tenê bûm. Ji bo wê hemûyan pir ji min hez dikir. Hema hema wekî “mêrekî” mezin bûbûm. Min çek xweş dixebitand û nîşangireke, baş bûm. Hinekî jî bi degel bûm. Ez vegeim ser meseleya xwe, guhdarên hêja. Heke min bi gotinan hûn aciz kiribin, lêborîna xwe ji we dixwazim.

Bi bayê bezê me alavên xwe bar kirin. Malbat li hev civiyan û bi rê ketin. Di qefleya me de zarok, jin û kal hebûn. Ji bo wê hêdî hêdî dimeşîyan. Bi roj me xwe di deverên bi star de vedişart, ku reş diket erdê em dimeşîyan. Di meşê de kal û zarokan zehmetî dikişandin. Çar kal bi rê de mirin. Devera ku lê mirin, me ew li wir bi heq kirin. Roja bîstan em gihîştin nêzî Çiyayê Agiriyê. Zarok bê hal mabûn. Rewşa wan gelekî xerab bû. Wê rojê em delavê esrê bi rê ketin. Hîn me gelî xelas nekiribû, li pozê gelî çend mirovên bi çek xuya bûn. Kemîn avêtibûn pêşiya me. Dema me ew dîtîn, em bi şûn de vegeirîyan. Lê yekî ji wan;

“Hûn nikarin bi tu deverê de herin, werin radest bibin. Em tişteki bi we nakin. Çek û alavên xwe bidin û herin.”

Bîstekê em di nav hev de şewirîn. Em li ber çek û alavan nediketin. Bawerîya me bi wan nedihat. Me fêhm kir ku armanca wan kuştina me ye. Jixwe em pêşîvan bûn û qefle bi qed-

erekê li dû me bû. Me got bi dengê bilind em ê bang bikin da ku qefle neyê. Cindî bi dengê bilind bang kir:

“Birano, em reviyane, tişteki bi me re nîn e, bela xwe ji me vekin, em bi rêya xwe de herin. Em dexilê we û Xwedê ne hûn tu zerarê nedin me.”

Êdî em rihet bûn. Me dizanibû deng gihîştiye qefle. Hîno hîno me jî xwe da ber zinaran û em ji şer re amade bûn. Çend carên din jî bangî me kirin. Lê biryara me biryar bû ku em radest nebin. Heke mirinek hebûya jî, bila di şer de bûya. Lê me got; “Ku şer derkeve jî, bila ew dest pê bikin.”

Weke pisîk û mişk em li ber hev bûn. Qederê bîstekî wilo bêdengî çebû. Dîsa bang kirin; “Heke hûn radest nebin, em ê we bikujin.” Me qet dengê xwe nekir. Wan berê tivingan dan me û gule barandin. Me

jî bersiv da. Şer giran bû. Hejmara wan pir bû, her carê bi sedan gule bi ser me de dibarandin. Guleyên me hindik bûn. Ji bo wê me hêdî hêdî berdidan. Hema ku reşayî biketa erdê em ê bi şûn ve vekişiyabûna. Jixwe armanca me ew bû.

Çiqas diçû gulebarandina wan zêde dibû. Ciyê me nexweş bû û carina bi hev re bîst gule dihatin. Birayê min Cindî got; “Ciyê xwe biguhere.” Bi rabûnê re guleyek li pêşîra min a rastê ket. Hîn birîn germ bû, axirê gihîştin ba wan. Birîna min pêçan. Lê çiqas birîn sar bû, êş giran bû û laş bê taqet dima. Heta reşayî ket erdê wilo domand. Piştî reş ket erdê, qederekê em çarpîkan, bi çarlepkan çûn. Bi alîkariya birayê min ê Cindî qederê

saetekê ez meşiyam. Lê ji wê û pê de ez nikaribûm bimeşim. Ez bi dorê dam pişta xwe. Êdî zerahiyê, şeveqê avêtibû, westiyabûn. Laşê min giran bûbû. Bi min re diaxivîn, min deng dikir, lê min nikaribû bersivê bidim. Di nav xwe de biryar wergirtin; wê min di şikeftekê de veşêrin û herin. Heke firsend çêbû, wê werin min bibin. Her çiqasî birayê min li hember derket jî, ji bê mecalî wî jî ev pejirand. Ez danîm şikeftekê, şerbikek av, hin nan û pêxwarin hiştin li ba min. Cindî dema ku xatir ji min xwest, rûyê min maçî kir, hêsirek ji çavê wî herikî ser eniya min. Çi qasî min jî dixwest Cindî maçî bikim, mixabin min nikaribû. Devê şikeftê dîwar kirin û çûn.

Erê ez nikaribûm biaxivim, lê min bi her tiştî dizanibû. Jixwe min jî hêviya xwe ji xwe birîbû. Heke ku min karibûya biaxivim, min ê gotibûya; "Herin, xwe xelas bikin, bila ez bi

goriya we bim." Jixwe wan jî bi ya dilê min kiribûn. Carinan min taya sar, carinan jî ya germ digirt. Êdî ez ne li ser hişê xwe bûm. Ji vir û pê de bi devê xesûya xwe ez ê ji we re bêjim, çîroka xwe. Rehma Xwedê lê be, Xwedê wê bibe bihuşta xwe.

Keça min, sibê zû Xalit û Zibêr kar û barê xwe û nêçîrê kirin. Çekên xwe hildan û kûçik dan dora xwe. Dema digihên biniya gelî, kûçik bi lez tên ber deriyê şikefta ku tu tê de yî. Û dibe kewtekewta wan. Xalit ji Zibêr re dibêje;

"Malava, ma vana çi pêjn kirin, tiştê xuya nake. Hebe nebe kunrovî li van deveran hene."

Qederekê li wan deveran dimey-izînin, tiştê nabînin. Bang li kûçikan dikin ku herin. Lê kûçik hema dikewtin wî dîwarê rût û tazî. Xalit baş bala xwe didiyê, dibêje; "Ev dîwar nû hatiye lêkirin." Zibêr jî dimeyze ku



wisa ye. Hema dîwêr
radikin û te dibînin.
Zibêr dibêje, "Miriye."
Xalit destê xwe dide
ser dilê te, dilê te lê
dixe. Dibêje "Sax e."
Kurma girtibû birîna
te. Zibêr bi lez hat
malê, darbesta
mizgeftê û bi çend xor-
tan re hatin, tu anîn
gund. Bi lez ji gundê
Kortê pîrejina Xecê
anîn. Bijîşka vê
herêmê ew bû. Dema
li birîna te meyzand,
bi carekê behitî ma.
Weke ku bêje, "Hêviya
xwe jê bibirin."

Zûzûka avek keland û
kir du beş, hinek xwê
xist nav û tevda, ya din jî bo hinek sar
bibe danî ber hewayê. Pêşiyê birîn bi
avê baş şûşt û got, "Divê pêsîr were
jêkirin. Ev wê bibe hêviya başbûnê.
Nexwe birîn wê biaxeve û derbasî laş
hemûyî bibe." Me hemûyan got,
"Hema bila xelas bibe, tu çi jê dikî
bikî." Ji tûrikê xwe gûzan derxist, baş
tûj kir û pêsîra te jê kir. Bi ava şo-
ravkê birîn kewand û dermanên ku bi
destê xwe çêkiribû danî ser birînê. Sê
şev û sê rojan ez û pîrejina Xecê man
li ber serê te. Her roj du caran birîna
te paqij û derman dikir. Te carinan
dikir qêrîn, carinan digot, "Kekê Cindî
herin, bila ez bi qurbana we bim."
Roja çaran tu hebekî bi ser xwe ve
hatî. Êdî tişta heyî tu dizanî.

Dema ez bi ser xwe ve hatim, pîre-
jina Xecê li ber serê min bû. Jixwe min
nas nedikir, ango min got qey yek ji
malbatê ye. Çavên min hebekî xumamî
bûn. Hema ji nişka ve bi zimanê xwe
min got, "Em xelas bûn." Pîrejina Xecê
bi kurmancî bersiv da, "Erê keça min."
Hingî min fêhm kir ku ez li, devereke



xerîb im. Qederê bîst rojî bi şîr, hungiv
ez xwedî kirim. Tişta hatî serê min, min
yek bi yek ji wan re got. Der barê mal-
bata xwe de min tiştek nizanibûn.

Xesûya (piştire bû xesûya min) min got;

"Keça min, heta bi hetayê tu dikarî
li ba me bî. Tu weke keça min î. Ez
hêviyê ji Xwedê dikim ku malbata te
bi selametî gihîştibe ciyê xwe."

Qedr û qîmet didan min. Ez jî tim bi
hêvî bûm ku malbat were min bibîne.
Du sal derbas bûn, kes nehat. Sê, çar
sal derbas bûn, dîsa kes nehat. Qedr
û qîmeta min roj bi roj zêde dibû. Ez
bûm keça malê. Rojekê xesûya min;

"Keça min, va ye pênc sal derbas
bûn. Te em baş naskirin. Erê Zibêr
qet li xwe nayne der, lê dilê wî li ser te
heye."

Belê, ev çil sal derbas bûn. Ez hê jî
li benda birayên xwe me. Birîna min
sax bû, lê birîna dil roj bi roj kûr dibe.
Tu bijîşk nikarin vê birînê sax bikin.

Girtîgeha Bolûyê



Huseyîn GUÇLU

*Tu bigiriyî
Ez ê bixenîqim
Di dîlopek rondikên te de
Ê dîl li min bibe lîlavk
Ez ê bicemidim
Dê qeşa bigire xwîna min*

*Tu bigiriyî
Ez ê xwe terk bikim
Bibim biyanîyê jana xwe
A jiyana xwe
A gerdûna xwe
Gerdûnê di xwe de çavkor bikim*

*Tu bigiriyî
Ez ê bigurêm çermên peyvan
Êdî her kes lal
Her kes kor
Ji xeynî te bêaqil*

*Di navbera dîn û nedîniyê de
Bisekinim kêliyekê
Hingê jî
Dê dem ne dem be
Tu bigiriyî*

*Dê tofan bistrîne
Ji ber tofana min*

Girtîgeha Sêrtê

Canşikestin

Huseyîn GUÇLU

Mizgîniya min li te
Çirûsk dibe şîrîkê tenêtiya şevê
Bi kena birûskê
Bîrîna ronahiyê
Ji nû ve wateyê dide tariyê

Gelo du rûyên mirov tenê hene?
Nizanim!... nizanim ji xeynî ker û laliyê
Bêdengiya xwe lêpêçan jî dibe rûyek?
Yan jî kelogiriya di kiheylana jîna min de
Xwe di singa min de vedimirînê

Çend car vê kêlikê di rêya vê de dişikên
Çend dilop xwe ji şerbîkê axa sor vedidizin (azad dîkin)
Çend gotin lêvên şêrîn diramûsin
Dibe ku niha zîmanek pûç dibe...

Peyv jî dirizin...

Di şerbîkekî de meyê ji xwe vedixwe
Nizanim (niha) mey serxweş e ji maçkirina şerbîk
Yan jî şerbîk ji ya meyê

Çima
Jixwe çûyîn
Xwe (bi)lêvlûrîna eşqê ye gelo?

Agirê dilê min diquzquzê
Şerbîk şikest...
Mey ber bi dilê axê ve rêwî ye

Ji wî bitirs
Ji parsekê bermayiyên evîna xelqê
Divê mirov
Di agireke şanaşewatî de bihelê
Hebe çûyîn
Nebe veger

Tu dilêş û evîn dubar nabin
Her qendîl bi agirê xwe...
Dua bikin bêhîv be şev....

Girtîgeha Sêrê

Şolo

Rojhat ŞAXÎ

Bi gewrbûna beyaniya sibehê re weke her gav ji xewê rabû, destnimêja xwe girt. Mêzera nimêjê li quncikekî odeya xwe ya yekçavî û xirûxalî raxist. Çend rekaet nimêj li ser hev kirin. Dûre rabû piya, çav li derdora xwe gerand. Kumê xwe yê xwelîreng ji ser kursiya textîn hilda, dewisand ser porê xwe yê xingilok û gijomijo. Bi gavên hizirdar ji malê derket. Deriyê malê girt, weke ku piyên wî banekiya riya ku dê pê ve biçe bibin, jixweber ketin ser rêçika di nizarê gund de berwarî newala perê gund dibû. Tiştinê ji êvarî de di serî wî de li hev digeriyan, ew ber bi êş ve dehf didan. Sibeh jî hêdî hêdî lê safî û zelal dibû. Tava serê sibehê jî di nav qewar û ser-tarên çiyayan de keziyên xwe yên zêrîn û zîvîn dirêjî lûtke û navsera çiyayan dikir. Kirasê xwe yê zêrîn û zîvîn ji jor ve li bejn û bala çiyayan, serberjêrî dolik û newalan dibû. Sing û berê çiyayan bi keziyên xwe dipeland. Her dever radimûsa û ronî dikir. Li wî aliyê beroj û nizarê gund ê pêşber jî çend keriyên pez li beralp û qûntarên beroj diçêriyan. Xilmaşiya serê sibehê jî hê ji ser rû û rûçikê Şolo yê qermiçi ranebûbû. Car caran bawîşkên bêxewiyê dihatinê û xwe ji hev vedigijgijand. Lê çûna wî ya serê vê sibehê ji ya rojên din hinekî cudatir bû. Loma serê vê beyaniyê zû ji xew rabûbû. Lewre jî îro bi mebesteke cuda dabû ser riya êş. Ji êvarî de ji bo sepanandin û pratîzekirina wê tiştê lê disêwirî, xew bi çavan neketibû. Di nava pêl û mewcên hizr û ramanên kûr de wer rêpaniya hilatina beyana sibê kiribû. Hetanî beyan lê der bûbû

bi deh caran rabûbû û di şibakeyê de li derve nihêribû. Ka fereca sibehê hihat an na?

Her wiha di bin kumê Şolo yê ji toz û xubara ardê aş reng lê bizirîbû de çil rovî di gorepana mêjiyê wî de li hev digeriyan, diçûn û dihatin boçika yekî jî li ya yekî nediket. Lê her cure fên û fêlên wan li xûy û xisletên xwe edilandibû. Çavên wî yên li dora serê wî didan çeçlebaskan, mîna du farên siwareyê bîst û çar saetan wer bel û beliqandî, li derdorê bûn. Rewş û timtêla wî ya di bin rûpoş û dîmena belengazî û hejariyê de xwe dida der. Rûyê mirovekî qeşmer, genefis, tewlebaz, gendewar û şûmîtiyeke bê qam û kesayetiyeke xilt û hîlebaziyeke ku nayê aqilan, di bin vî rûyî de veşartîbû. Ji bo gendelî û şûmîtiyan çavên wî wer di nava serî de dilistin. Pozê wî yê şûjinok û serxirtik wekî kevçiyê neşûştî di nava her tiştî de bû. Di kar û barên bazirganiyê de guhên wî dilebitîn. Tu yê bibêjî qey li ser heman berkêşê pariyek nan bi ci-hûyan re xwariye. Hema li cihekî komikeke mirovan li hev biciviya, guhên wî wekî peykan wer li nava serê wî dizîzikîn. Hema diket nav tatêla “Gelo ka ew bazara çi dikin, an jî ka ew çi dikirin û difroşin.” Gava ku tiştêkî ji sêwiribûya pêşiyê dahat û qezenca xwe ya di wî tiştî de li hesêb û kîtaban dixist. Ka çiqas kara wî û çiqas jî ziyana wî di vê yekê de heye. Hemû yek bi yek ji hev vediçirand. Paşê bi ser wê babetê de xwar dibû û serê xwe pê diêşand. Ger dahat û jêhatineke boş di wî tiştî de bidita ji bo gihîştinê wî hewldan û kêferateke

bê hempa diserifand. Di wî warî de tişta nemayî û nebînayî dikir. Hetanî xwe bi wê yekê bigihanda. Hemû niştecihên gund li wan kirin û kir-yarên wî matmayî û heyirî diman. Wer pê dizanibûn ku Şolo sal û dozdeh meh pêkoliya tiştinan dike. Bi tişteki re mijûl e û karên nepen dike lê kesî pê dervedixist bê ka ew çi dike. Ev fên û fêlên wî yên genefis di nava gund û civakê de bûbûn sedema gotegot û paşbeniyan. Her kesî di der barê wî de tişteki digot. Gelek kesan ew yek bi lêv dikirin: “Xwedê hifza me ji Şolo bike. Kes nizane li ser çi karî ye... Eman...”

Şolo jî zanibûya û nizanibûya teqez di der barê her babetê de gotineke wî ya bibêje hebû. Her kes diaxivî, gotina xwe ya dawîn digot. Şolo jî ilhes gotina xwe pê ve dizeliqand. Derdor dîtewizand û pişta xwe didayê. Ango

pêlawa xwe tevî nav ên maqûlan dikir û digot “Va ye ez jî heme” Yanî dibû pûnga her girarê. Wisa lê hatibû ku di nava civakê de her kesî pêşîra xwe ji ber vir, lêbandin, şûmîtî û genefisiyên Şolo dadiweşand û hivza xwe jê dikir. Çi ku gelek êş û qiriktehlîyên dilverêş ji destê hîlebazî û kumreşîya wî kişandibû. Di nava gund û derdorê de hema bibêje ku kesekî ku nelêbandî, bi derewên wî nexapiyayî nemabûn.

Belê Şolo bi çavên şîyar ve cara dawîn li tenişta aşê xwe yê xirbe û hilweşiyayî ku wekî mîrate ji saman û sermiyana di dû bavê wî de ji keriyek pez û dewar tibabek milk û erd û zewiyên çandiniyê, ji pênc maqûlên birayan tenê aşê xopan û kevnexaniyê bavê wî yê xir û xalî ketibû. Li kêleka cihê ku berê nanê xwe jê qezenc dikir, ku a niha li şûna wî bi tenê kavilek



mabû, rûnişt. Çarnîkarê wî hûr û kûr di ber çavan re derbas kir. Di bin kumê wî yê rengê xweliyê pê diket de ku bi aliyekî serê wî ve xwar bûbû, tiştin dizivirî. Tiştê ku lê difikirî dûr û dirêj li pîvanên mîzînê dixist. Dahat û lêçûna wê hûr û kûr dipîva. Serbar û binbariyên wê ji hez vediçirand, di kêlek û berahiyên wê de li hev dabêş û par ve dikir. Li gorî xwe rêjeya rastîn û yeksan derdixist holê. Gava ku gihîşt encameke gorî dilê xwe jî dilşadî û bişirîneke genefis û gendel dawerivî ser rû û mirûzê wî yê quncifî û ku dirûvê reşê şevê û batir-sokan pê diket. Şansekî wisa li ser hev hebû ku te digot qey quzê gur pê ve ye. Yan jî tu yê bibêjî qey şeytên tiliya xwe tê re kiriye. Tiştê ku kes ne-fikirîbûya di ber serê kesî de derbas nebûya teqez di bin kumê wî yê tozgirtî de digel bersiva xwe peyda dibû. Ji aliyê şelaqî û şalûziyan ve tu kesî nikaribû pê re kaban hilavêje. Ji bo wî nexş û nimûşê Şoloyê dizek lêbandîna mirovan a gotina “Ew ji derpiyê diya xwe jî nabore” pir lê diedilî. Bi rastî jî ku lê rast bihata ji derpiyê diya xwe jî nedibuhirî. Teqez wê bifirota, wê bikira çend qurîş pere û bera binê berîka xwe bida. Lewre Şolo mirovekî ew çend berjewendîperest û haviiperest bû ku ji bo hawil û berjewendiyên xwe yên şexsî û bazirganî, tiştê ku nedihat aqilan dikir. Ji ber vê yekê jî carinan kar û barê wî wer bi ser û ber li rê diçû. Kesî nizanibû bê ka ev karê wî çawa wiha bi rêk û pêk li hev digere.

Carinan jî te digot qey şeytan zexta xwe tê re dike, tiştên matmayînê dikir.

Ji bo wî
nexş û nimûşê
Şoloyê dizek lêband-
îna mirovan a gotina
“Ew ji derpiyê diya
xwe jî nabore” pir lê
diedilî. Bi rastî jî ku lê
rast bihata ji der-
piyê diya xwe jî
nedibuhirî.

Carinan jî te lê dinîhêrî aş û ding di malê de nagere, carinan jî te lê dinîhêrî Şolo bi pêlên ewran re ketiye govendê û direqise. Kêfa wî wer li cih e, ewran dide ber zîtikan. Wekî ku pêşyan jî gotiye; “Aşê dînan bê av digere.” Bi rastî jî aşê Şolo yê xirabe û xopan, bi xopanbûna xwe ve jî dîsa pere dikir û digeriya. Carekê ji nişka ve bû haho haho, hawar û gazî.

Hêwirze û geremolî di nava gund û gundiyan de çêbû. Bû xirecir û şemateya şênîyên gund, ber bi aşê

Şolo yê xopan û kavilbûyî ve revîrevî beziyan, lê nihêrîn ku

pêtên şewata aşê Şolo gihiştiye ber ewr û ezmanan.

Her hinekan ji aliyên xwe ve dest avêtin satil û bermîlan û ketin ser riya çem. Bi dorê û helkehelk çend satilên avê di ser pêtên êgir û şewatê de kirin. Bi satil û çend peşk û çilkên avê ne pêkan bû ku vê şewata gur bitefînin.

Jixwe heta gundî gihabûn ser êş, şewatê jî zû ve xwe bi bedena êş re rapêçandibû û ew bi pêt û arê xwe hembêz kiribû. Tavilê beşa ku gelek salan li ser lingan mabû bi şewatê re jî ew jî rûxiya û hat xwarê. Aşê xopan êdî bûbû agir û komikeke ar û xweliya sipûsar. Şûn û wareke axpîn û cihê xepirîna mişk û maran. Mişkan lê didan çirvîtkan.

Di vê navê de çend roj derbas bûbûn ku hê dixaneke zirav û xwelîreşkî ji nav xopana êş bilind dibû. Wextekî gundiyan dîtîn ku va ye teqsiyeke fermî û çend maqûlên bajarî û navsere li tengala Şolo ne û ber bi baskên êş ve dizizikin. Çend gundiyan maqûl û serwext bi tatêla “Ka ev kî ne? Çi ne? Bi çi mebestê hatine û dê biçin ku” ketibûn. Ji bo esehiya mese-

leyê hîn bibin, dan pey teqsiyê û ber bi aşê Şolo ve beziyan. Heta wê hingê jî tu kesî bi esehiya şewata aşê Şolo nizanibû. Wer dizanibûn ku gava ku eraqvexwiran şev nivê şevê de eraqê vedixwin, cixareya pêketî avêtine nav van erdan. Ba jî ew xirikandiye nav pûş û qirşikên derdorê. Paşê jî agir bi pûş ketiye, pey re jî agir gur bûye, hetanî alavên wê xwe gihandiye dar û berên aş. Li ser vê yekê jî ji bo esehîkirina meseleyê baş hîn bibin ji saziya peywendîdar şandeyek hatibû, şûna aşê Şolo seh dikirin. Desteya şandeyê ji kavlê Şolo yê şewitî baş seh kirin, tiştinê nayên zanîn li lênûska di destê xwe de nivîsand. Piştî jî kaxizekî fermî bi Şolo dan şanavkirin, piştî wê hewldanê jî çawa ku hatibûn wisa jî çûn. Ji vê hatina şandeyê ya sehkirina aşê Şolo ya ji ber sedemeke nayê zanîn û dek û dolabên ku Şolo nepenî digêrandin. Cardin jî tu kesî tiştêk fêr nekiribû.

Di navberê de maweyeke kurt derbas bû. Şolo li ser vê lêkolîn û çavdêriya desteya fermî, tibabek pere stend û li ser xopan û kavlê aşê xwe, aşekî nû yê bi ceryanê dixebitî lêkir. Tu kesî nizanibû bê ka Şolo ev pere ji ku û çawa peyde kirin? Ev aşê nû çawa çêkir?

Li ser lêbandina xelqê derdorê Şoloyê rût û pût di carekê de bûbû maqûlekî mêran. Peyayekî zor dijwar û dewlemendekî qerase, piştî maweyekê şûnde jî, Şolo du sê qat avahî jî li ser hev bilind kir. Şolo bi vê jî nema, îcar dest avêt dermalekirin û xwedîkirina pez û dewaran. Ligel dahat û jêhatina derameta êş dest avêt bazirganiya pêz û dewaran jî. Bi destxistina mal û derameta bi riyên ne rewya qemyoneke nipînû jî kişand hewşa mala xwe. Şolo bi her pêngav û pêlvedana xwe ya di nav deryaya dewlemendiyê de gundî matmayî di-

hiştin. Her wisa Şolo bi vê rêçûnê, xwe ranegirt. Bergeha bazirganî û dizî û lêbandinên xwe hîn berfirehtir kir. Tora têtikî û pêwendiyên xwe yên bazirganiyê heta bajarên dûr û xerîb jî berfireh kir. Dem bi dem bi qamyona xwe dermale ji bo firotinê dibir bajar. Bi pereyekî pir vedigeriya mala xwe. Wisa bûbû ku binçengên Şolo bi pereyên pir germ bûbû. Lê çî heye ku dawîya dizî û hîziyê, çepelî û lêbandinê, fen û fêlên kirêt her telereşî û gosirmetiya giran e. Dawîya Şolo û fên û fêlên wî yên genefis jî wiha bû. Tavlê qamyona wî ya ku bi pereyên qelp û bi riyên ne rewya bi dest xistibû, bû goristana wî ya sar û abadîn. Gava ku rojekê ji bajarê lê dijiya dermaleyan li kamyona xwe bar dike, ji bo firotinê berê xwe dide bajarê Stenbolê. Wexta ku digihîje ber qeraxên deryaya Marmarayê, gava ku dixwaze li aliyê çepê vegere, kamyona wî ya barkirî û giran nikare biftile û ew û kamyona xwe ji kendalekî asê werdibin Deryaya Marmarayê. Ava deryayê jî wî bi genefisî û çepeliyên wî ve dadîqurtîne.

Di pey mirina Şolo ya bêtîr û bextreş de, kêşeyek galegal û gotegotên ne rewya li hev geriyan. Gelek tiştên ku di serê gundiyan de rê li ber pirsnişanan vekiribûn û di tarîtiyê de mabûn û bûbûn bingeha pêşbenî û gotegotan û hê nû derketibûn holê û ronî bûbûn. Hê nû aqûbeta şewata aşê Şolo jî hatibû fêmkirin ku aşê wî sîgortekirî bû. Ji bo ku tibabek pere bistîne wî bi zanebûnê aşê xwe şewitandibû. Heta wê hingê jî tu kesî hizra vê yekê nedikir. Şolo bi mirina xwe jî dîsa gundî matmayî hiştibû. Wisa jî tibabek deyn li dû hişt û bi awayekî bêtîr û bêqidoş jî vê cîhana dargî bar kir. Bêtîr ku çavên wî ji malên dinyayê têr bibin

Girtîgeha Oltûyê

Xulxulîn

Ercan DOGAN

Ceflîneke sivik û tînegerm
Di hinavê min de digeriya
Hinavê min dilerizand
Dengê wê yê dawîn
Di guhê min de olan dida

“Ya Rebî bê lome be”

Êdî geşiya çavan jî min vedişêre
Xeydên bê perenk bûne para min
Avzêma çavan jî diçike
Û êşên sedsalê jî kedî dibin

Ziman di devê min de mirar bûye
Xemên kûr û bê eman
Li beyara dilê min
Dibin lehiya biharan

Astrate jî qehran
Hêsiyan dibarîne
Û ez di himbêza evînê de
Striyan vedişêrim
Gefxwarina bi peyman
Hizr û hestên mirov dixulxulîne!

Ez bi wî kenê ser lêvê
Û bi çirûskên çavên te jî qayil im
Lê tu yê bi êşên kevnare çi bikî?
Piştî tu çûyî, çi ma?
“Ne rinda ber çirayan, ne jî sora ber
agir!”

11. 08. 2007

Î

Di avzêma çavên te de tî dibim
Helkehelk bi min ketiye
Dişibim dizê pezê şevînê
Ketime taya evînê

P

Bi axîn û hawara şivan re
Tîbûna dilê min dişikê
Dixwazim bibim
Pêşengê keriyê spiyan
Û li ser mêrgesingê te biçêrim
Dixwazim bibim hêsîrê
Çavên bi kil
Û li ser dêmên gulvedayî
Ziwa bibim

2007

S

Sop

Min jî sarbûna
dêmên te
Şopên tiliyên xwe
dida hev
Ji bo ku kenê te
Sor neherike nav
şîrava devê min

01. 08. 2008

Zarokê aştiyê

Fikret KARAKOÇ

Wê şevê
 Porê dîrokê dihat hûnandin
 Bi destê tavê
 Ji teyroka havînê
 Gul dibarîn
 Dilop, bi dilop diherikî
 Ji her du çavên heyvê
 Dilê min dişewitî
 Di aliyekî min de zarokê aştiyê
 Aliyekî min agirê dojahê
 Lê dîlara ber dilê min
 Bûbû pelek ji pelên dara şîlanê
 Ji min direviya li ser hêlîna
 Bêriyê...

Sed mixabin e dayîka min a dilbirîn!
 Bextewariya xortaniya min
 Dibe kevokeke per û bask şikestî
 Di nav destên wan nêçîrvanên hov de
 Belê, bazên evîndariyê
 Dîsa hestên xwe yên paqij
 Xweş dibezînin li ser hêviyên dûr
 Dîsa ronahî jî di hembêza xwe de
 Veşartine

Hooo! Bajarê miriyan...
 De ka tu qeşema ba û barana şîl
 Ji laşê min jî bişo
 Ji bo xatirê zarokê aştiyê
 Û ji bo xatirê "zarokên agir û rojê"

Girtîgeha Kocaeliyê

KOIONNA

Meîn YAMALAK

Tajdîn her du milên xwe ji bo hem-bêzkirine vekiribû, li qelefiska rûniştibû li benda hatina kurê xwe Jîr bû.

“Bireve, bireve, bireve, bavo qurban.”

“Bavo, bavo”ya Jîr bû, him diqîriya him jî bi wan gavên xwe yên biçûk ber bi bavê xwe direviya.

Ew teşkên wî yên kinik û bê hêz li hev diketin, qeh diteisî geh diket. Dema ku diket Tajdîn bi zarekî şêrîn digot “Oy, oy, oy bavo qurban, rabe rabe.”

Jîr ji şabûnan, ji hewldana ku dike xwe bigihîne bavê xwe, hilkehilk pê ketibû. Dema ku ji erdê radibû dipirsî “Bavo te ji min re piskivêt anî?” û cardin bi wan gavên biçûk dest bi revê dikir. Pir dixwest ku bifire biçê hem-bêza bavê xwe, lê dikir nedikir hilnedibû. Mîna ku rê jî dirêj dibû, direviya nedireviya nediqediya xwî, gilêz, çilmik, toz, qilêr... Gişt tevî hev bûbûn li ser rûyê wî. Heta ku ji nava bostanan reviya hat xwe avêt hembêza bavê xwe, hemû hêza xwe xerc kiribû. Lê di dawiyê de bi ser ketibû.

Tajdîn ji vê meşa ku Jîr bi zor û zehmetî dimeşe tê xwe diavêje hem-bêza wî, zewqeke pir mezin digirt. Ev hezkirin û hewldana lawê wî jê re dibû mîna xelatekê. Wî ji xelata xwe wisa digirt.

Îcar Jîr yekî çawa bû? Peh! çiqas toz û gemara sergoyan heye hemû pê ve zeliqîbû. Diya wî serê sibê derpiyê sor û taytekî bi mil ê kesk lê kiribû. Lê

heta êvarê Jîr ew kinc anîbûn wî hali ku kê bidîta dê bigota qey saleke ev cil li ser vî lawikî ne. Hingî ku çilmika wî hatibû, bi milê xwe pozê xwe paqij kiribû, nîvê çilmikê bi milê wî ve û nîvî jî bi gepa wî ve zeliqîbû. Çilmik toz û gilêl ji ber bêvila wî ber bi guhên wî ve mîna simbêlan li ser dêmên wî belav bûbû, pêve zeliqîbû. Mîna qalikekî reşbelek li ser dêmên wî hişk bûbû, mîna erdê ku bê av mabe tîştîşî terikîbû

Tajdîn dixwest ku wî têra dilê xwe maç bike, dêmên wî di nava diranên xwe de biguvêşe, gez bike, lê hey ku hey! Gerek pêşiyê ew qirêj û çilmika ku li ser dêman qalik girtiye bialasta. Axirî li ser rûyê wî cihekî paqij nedît. Wî jî navika wî maç kir. Devê xwe da ser zikê wî, kir pixepix, xudîka jîr anî, bû tîqetîqa wî. Piskivêt, miskivêt jî bîr kiribû. Tajdîn kurê xwe da hembêza xwe çenteyê ku bi xwe re anîbû girt û ber bi malê meşiya.

Dema ku çûn malê, Leylaya hevsera Tajdîn serê keça wan a ji Jîr biçûktir, Xecê dişûşt. Giregira Xecê bû digiriya. Leylayê jî ji aliyekî ve ew aş dikir, ji aliyekî ve ji serê wê dişûşt. Leylayê bi hatina Tajdîn Jîr jî zevt kiribû, lewre Jîr ji bo ku serê xwe neşo bi çolê diket, Leylayê dikir nedikir ew zeft nedikir. Girt, ew tevî cilan kir teşê. Bû qareqara wî, lê êdî kesî nikaribû wî ji destê Leylayê bifilitîne. Leylayê yeko yeko serê wan şûşt, ew şandin ba bavê wan û ji Tajdîn re jî got ku ji sandoqê kincan derxe li zarokan bike,



heta ku wê ew der berhev kir û hat.

Dengê şabûn û kenê zarokan dihat, lê Leylayê digot qey Tajdîn û zarok di-
leyîzin. Piştî ku karê xwe qedand, hate
menzelê her du zarokên xwe nas
nekir. Her yek ji wan taximek cilên
kot lê bû, li serê wan jî şewqeyê taxim,
di lingê wan de jî solên werzîşê. Zarok
serdanpê guherîbûn, ew cara ewil bû

ku Leylayê zarok
wiha didîtin.

Hema ji kerban
beziya Tajdîn;

“Ew çi ne, te ev
ji ku anîne, te
dirav gişt dane
vana, tu yê me di
vê xizaniyê de ji
birçînan bikujî,
wa ye eyd û erefat
hatin, em ê çi
bidin ber mê-
vanan” digot û
dirêj dikir.

Tajdîn ji çente
fistanek derxist û
dirêjî wê kir da ku
li xwe bike.

“Ev jî fistanê te
ye, qedifeyekî xas
e ha!”

“Hi, malxirabo
ka te hê çi kiriye
çi nekiriye”

“Bi Xwedê dê
pir li te were, tu
yê tê de pir bedew
bibî”

Tajdîn mîna ku
qet guh nedida
gotinên Leylayê
zor didayê ku
Leyla wî fistanî li
xwe bike. Di
dawayê de Leylayê
fistan li xwe kir.
Fistan qedîfeyekî
şîntarî bû, li ser

mîna stêrkan kulîlkên sipî
reşandibûn. Leyla mîna ezmanê bi
stêrk dixuya. Leylayê xwe da ber
neynikê, çep û rast li xwe nihêrî. Ji
xweşikbûna wê hêrsa wê derbas bû,
kêfa wê hat cih. Vegeriya ser Tajdîn;
“Îcar te ji xwe re çi kirî?”

“Ê min hebû jixwe, lewma min

nekirî"

"Çawa hebû! Ê me jî hebûn lê wa ye te kiriye"

"Na, na ên we kevn bûbûn, bedlê min hê nipûnû ye"

"De ka tu jî bedlê xwe li xwe bîke"

"Ez ê vê êvara hanê çima bedlê li xwe bikim? Cilê me nû hatin, ji bo ku hûn biceribînin, hûn li xwe dîkin."

"Tu bi Xwedê, tu bedlê xwe li xwe bikî bê ka em giş wiha çawa dixuyin"

Tajdîn kir û nekir xwe ji Leylayê xelas nekir. Bêgav rabû bedlê xwe li xwe kir hat xwe da ber Leylayê;

"Wa ye min li xwe kir îcar çi bû?"

"Pîîî! Em bûn wek begleran"

"Erê, erê! Ew her roj wiha li xwe dîkin şa nabin, em rojekê wiha li xwe dîkin, ji şabûnê piyê me erdê nagire"

Ji nişka ve ji Jîrê ku ew û Xecê li holîyê bûn, qîrîn û zarîneke wisa bi şîd bilind bû mîna ku gule lê ketibe. Leyla û Tajdîn bi rev çûn holîyê, xwe avêtin ser, pirsîn ku çi bûye. Xecê ji tirsan reviyabû, çûbû menzela dîn. Jîr wisa digiriya ku lal bûbû û nikaribû xeber bida. Leyla tirsîyabû, gelo dûvpişkê pê vedabû, çi bûbû? Lewma li laşê wî, li lingên wî, li destên wî dinihêrîn lê tişt tune bû. Dûre Jîr piçekî bêhna xwe girt, zimanê wî geriya, ji dê û bavê xwe re bi girî got;

"Xecê cilên min qirêjî kir!"

Leylayê got; "Ka kurê min ku der qirêjî bûye?"

"Her der"

Xecê bi tirs di ber deriyê menzelê re li wan dinihêrî. Ziravê wê qetiyabû. Dema ku Tajdîn çû wê bîne, bû kûrekûra wê giriya. Tajdîn bi destê wê girt anî;

"Negirî keça min, ka bêje te çi kir bi birayê xwe?"

Xecê ji tirsan nikaribû xeber bide. Destên xwe yên biçûk vekiribûn, nîşanî bavê xwe didan. Hîn destên

Xecê şil bûn. Dema ku Tajdîn destên wê bêhn kirin, dît ku bi kolonyayê şilkiriye. Got;

"Kurê min ev kolonya ye"

Jîr hê digiriya;

"Hi hi... Kolonya bi ser destê xwe de kir û li cilên min xist"

Leyla û Tajdîn bêhneke kûr kişandin. Tişteki xirab tune bû. Leylayê got;

"Heyla belqityo, ev qêrîna te ji bo vê bû? Te ziravê me qetand."

Bû tiqetîqa Leylayê û Tajdîn, bi Jîr kenîyan. Bi kenê wan piçekî tîrsa Xecê jî derbas bûbû. Leylayê Jîr berda, Xecê ji hembêza Tajdîn girt;

"Keça min a xweşik û delal, tu tirsîyayî?"

Vegeriya ser Tajdîn;

"Tu dibînî Tajdîn, ev keçîka tîfal jî dîzane ku ev lawê te çi genî ye. Keçîkê xwestiye ku bêhna gulan jê were, lê ev ê ser sergoyan kolonyayê mîna qirêj û gemarê dibîne. Ziravê keçîkê qetand."

Jîr di wê hêviyê de bû ku, dê û bavê wî dê li Xecê hêrs bibin û li ber wî bigerin, lê vê carê wisa nebûbû. Bi wê şaşwaziyê dev ji girî jî berdabû. Di derekê de şaşıyek kiribû lê nizanîbû çawa kiriye. Gerek dê û bavê wî ji ber girîna wî hê zêdetir bi wî re mijûl bibûna. Hê dilê wî lê bû ku, ji bo aş bibe ji dê û bavê xwe piskivêtan jî bixwaze. Lê vê carê karê wî rast neçûbû. Êdî nikaribû piskivêt jî bixwestina.

Leyla û Tajdîn bi destên zarokên xwe girtin, çûne medbexê ku bi cilên eydê şîvê bixwin. Tajdîn got;

"Te xwe ew qas hêrs kir lê dê çi bibe, ji salan û mehan carekê em wiha xwe şa bikin?" Û hê Leylayê keys nedît ku xwe birevîne, ramûsanek ji dêmên wê girtibû jî.

Girtîgeha Bolûyê

Giyotîna bêxwîn

Mistefa TÛNÇYUZLU

Di deryaya aravê de
Giraveke bi tenê
Rondikên serhildêr tevli deryayê bûne
Bi nefret li tehtên devbirekî dikevin
Pêlên bi wan sorbûyî

Gulan hez û bêrikirin barkirî
Gul keştiyên bê babir
Ji çavên agirçirûsk
Ji dilê jinên dilevîn
Di Dicleya dilhewîn de
Di Ferata pêldar de
Diherikin... diherikin
Spî dibin gulên peldayî
Di Deryaya Spî de

Gizînên serî lê digerînin, berdidin hucreyê
Bêhna gulên rûyê guldar
Bêhna dilên Tendurekî
Nav hucreya dûwarên ker û lal

Di gerdûnê de
Dinyayeke atomîk
Di nav atoma dinyayî de
Di notronekê de giyotîneke bêxwîn
Rîsê têlên devbirekî şewq didin
Di cama wêneyî de

Girtîgeha Sêrtê

Prometheûsê li qûntara Zagrosan

Soydan AKAY
Sebahattîn SUMELÎ

I. Eşq

Wiha dibêje pirtûka me, “Vegotina mîtolojîk derbirîna herî nepenî ya rastiye ye.” Û pirtûk formûla bi sêhr a bidestxis-tina rastiye jî dibêje: BI EŞQÊ! Ango bi zanîna watedar. Di wateya hê berfirehtir de, bi nêrîna sosyolojîk vedibêje.

Mîtolojî, ku teşeyê pêşîn ê sazûna civakê raber dike, bi xwe jî dibêje, “Berê Eşq hebû.” Bi gotina ye ku ERD û ASÎ-MAN gihandî hev, a rê li ber jînesaziyeke şên û şeng vekirîye, EŞQ e. Mirovê pêşîn, ne ji bo ku çirokên xweş ji me re bihêlin, ev gotin kirine. Zimanê pêkhata gerdûnê, têgihîştina ku gerdûn, xweza, civakîbûn çawa di wê bi xwe de tê ziman, vedibêje. Di dahûrandina dawîn de mirov bi xwe jî rewşa ravekirina xwezayê ya şewazekî cuda ye. Te dît çirok heye, dibêje; Xweda hemû heyînan, riwek/nebat, sewal, mirov û hwd. diafirîne. Piştî hemû heyînan derdikevin pêşberî Xweda û jê dipirsin, “Xwedayê min, te çima em afirandin?” Xweda jî wiha dibersivîne, “Ez xezîneyeke nepenî bûm, min xwest ez bêm zanîn.” Ne pêkan e ku mirov rastî vegotineke din a wiha tekûz a milê El-Allah ê xweza û civakbûnê were.

Ji ber vê yekê di mîtolojiya ku dirûvê pêşîn ê zanîne ye, di çiroka veşarî ku diyalektîka tevdebûna çiya, çem, stêrk, dar, çiçek, sewal û bira/xwehengên wan vedibêje, hene. Dema mirov bi nêrîneke sosyolojîk çirokê anga “story”ê bixwîne, dibe “story” anga vediguheze dîrokê. Xislet û pîrozweriya civakîbûna xwezayê di bîra mirovê pêşîn de olana xwe pir xweş

daye û ku em bi doralîya “qewlê dirêj” lê binêrin, em ê çî û çî bibînin.

Lê helal be ji yê ku bikaribe binihêre re.

II. Eşqa etîmolojîk

Bi salan berê dema ez di mîtolojiya grekan de rastî efsaneya Zagreûs hatim, min tim digot ku aliyekî wê yê bi Çiyayên Zagrosan ve pêwendîdar heye. Ez bi bêjeyên aryenîk ên zaroktiya xwe ku di bîra min a civakî de nepenî mane, li etîmolojiya wan dinihêrim û dixwazim wateya di “Zagros” de veşarî ye fêr bibim. Dema min ji Egeyê (*Ji Anatoliya Rojava*) dest bi lêgerîna azadiyê kir, di nexşerêya min de yekser “Zagros” nivîsandî bû. Ez negihîştîmê, lê hêza wateya jiyanê bi hemû dîrokîbûna xwe û civakîbûna xwe ya bi wê derê ve bi awayekî zindî di giyana min de ma. Axir, min wiha digot, dema ez bi awayekî etîmolojîk difikirim, min digot; “Za” di zimanê me de tê wateya “jidayikbûn/zayîn”ê, “Zi” tê wateya ronahiyê. “Gros” jî tê wateya “Gir” an jî “Girs.” Di zimanê elmanî de wateya “Gross” mezin e. Min digot, wê demê “Zagros” tê wateya “zayîna mezin, ronahiya mezin.” Dema mirov nizanibe, mirov wekî gêjan li dora xwe diçe û tê, digere.

Ev rastiya min bû.

III. Sag-Çiya

Rastiya sumerîyan û çanda “Tirxelef” ku sumerî jê tînin, di bîra min de wate şînin kirin, afirandin. Bi sumerî “Sag” çiya ye. Nîn-hûr-sag xwedawenda welatê çiyê bû.

Ev welatê çiyê S(Z)AGROS bû. Warê xwedawendê ÇIYAYÊ MEZIN bû. Balkêş e, tê gotin ku destpêkê zîgurat jî ji bo ku bişibînin çiyayan (Zagrosan) wisa bilind û bi heybet hatine çêkirin. Ez di wê baweriyê de me ku em bikevin mihbeta etîmolojiyê ya peyvên li qûntarên Zagrosan, wê rastiye nîşanî me bide. Di her bêjeya aryenîk de bandorkerîya civaka çandî heye. Bes ku em bizanibin û bikaribin bi eşq nêzî wan bibin. Di wê demê de dê heqîqet (*rastî*) bi rewşa xwe ya seretayî ve rûyê xwe nîşanî me bide.

Her çiqaş di gotinê de peyva “rastiye” bibore jî, mexseda me vegotina rastiye (heqîqetî) ye. Em ê li ser vê girêdêriyê bi rastiya şaristaniya grekê û heqîqeta me ya neolîtîkê li qûntarên zagrosan bigerin û li rastiye ku di mîtolojiyê de nepenî mane, binihêrin. Çawa?

IV. Demeter û Korê

Demeter; di mîtolojiya grekan de xweha Zeûs e. Keça ‘Dayika Ax Gaia’yê ye. Ji xwedawendên beriya helenîzmê ye.

Demeter, dayika genim e. Xwedawenda dextl û çandiniyê ye. Bi şaristaniya grekê re pêşiyê xweha Zeûs e, piştî jî bi rêya destdirêjiyê (*tecawizê*) dibe hevsera wî. Ji bo hê baştir bê fêhmîkirin em bi zimanê çîrokî vebêjin;

Demeter, bi dildarê xwe ÎASON re di nav “Zeviya sê caran hatiye ajotin” de şa dibe. Zeûsê ku ji vê yekê haydar dibe, bi birûskên xwe Îason dike rijîk, dike. Zeûs, xweha xwe Demeterê hemîle di-hêle. Ji Demeterê “Xwedawenda tov” Korê tê dinyayê. Korê tam keça diya xwe ye; weke wê bedew, esmer, dilhebîn e. Zeûs dilxwestina keça xwe Korê ya ku hêj temenê wê biçûk e, dike. Xwe dixê şiklê mar û keça xwe bi xwe hemîle di-hêle. Ji wê jî “Zagreûs” tê dinyayê.

Em niha çîroka “Zagreûs” li vir bihêlin, vegerin şîrovekirina yên ku hatin bilêvîkirin. Demeter, hem jina ku hate radestgirtin, bûye mal û milk hem jî aboriya (cîkonomos) li ser wê tê kirin e. Di nav sumeran de vegotinên şênber ên vê çopiyê/gaspê balkêştir in. Lê belê ji



ber ku kula me serweriya mîtolojîk a çanda grekan e, em ê zêde dûr neçin. Lewra şaristaniya grekê ku versiyoneke din a şaristaniyê ye, heta ku civaka neolîtîk hebe û wê berovajî neke, nikare hebûna xwe biçespîne. Ev a yekemîn.

A duyemîn, Korê xwedawend, dayîk, keça jiyana efsûnî ya li qûntarên Toros û Zagrosê bi xwe ye. Korê ku tê wateya “Xwedawenda Tov” beramberî vêya di kurdî de hê balkêştir e; her kesê ku bi zewiyê re, bi dextlê re mijûl dibe dê bi hesanî wê nas bike. Heta ku me li ser wê stran jî derxistine; “Hûr genimo, lûr genimo/korik zeriye milan.” Li hinek ciyan jê re tê gotin, “korê”, li hinek ciyan “kore”, li hinek ciyan jî “korik/qorik” tê gotin. Carinan hêj genim libên xwe negirtî, negihayî, reş û qîr dibe, dişibe çavên kor. Ha em ji wan ên mirî, esmer re “korê” yan jî “korik” dibêjin.

Axirê, Korê bi stûxwarî derdikeve dîçe ku çiçek û kulilkan kom bike. Lê nizane ku ketiye çi torê. Vê carê jî bi alikariya Zeûs, xwedayê binerdê Hades wê dirêvîne. Ji ber ku ronahiyê çavên Hades kor kirine, ji bo tim di bin erdê de nobedariya warê miriyan bike, tê mehkûmkirin. Demeter, ji ber revandina keça xwe Korê ya di bin erdê de, weke dayika hemû dexlan û riwekan ên li ser rûyê erdê lanetê dibarîne. Lê baş e ku Xweda dikevin navbeynê û peymanê datînin. Korê sê mehan (zivistanê) li cem Hades, neh mehan jî li cem diya xwe li ser rûyê erdê dimîne. Dibe navê Korê piştî ku Hades wê dirêvîne dike hevsera xwe, navê wê danîbin Korê (ango ya korbûyî); lê Hades navê wê diguherîne dike PE-SEPHONE.

A sêyemîn; hewl didin ku çanda dest-dirêjiyê di bin navê “eşq”ê de bêguneh nîşan bidin û rewa bikin, bi vî awayî kirêtiya desthilatiyê veşêrin. Desthilatdarî mijara ku herî zêde tê de rûyê xwe yê rastîn vedişêre û tê de tîne ziman eşq e. Bi dizîkan ve dikeve navê, piştî jî wate

û cewherê wê vala dike, reş û qîr dike dihêle. Ji vî aliyî ve Zeûs sembola zekayê analîtîkê ye, harê averêbûyî/jî rê derketî ye.

V. Zagreûs û Zerdeşt

Em ji hamîlebûna Korê ve çîroka xwe bidomînin. Ji Korê zarokekî weke ronahiya rojê ji şaristaniya grekê (Zeûs) re tê dinê: Zagreûs. Êdî ew zarokê Xweda ye. Çi balkêş e ku, di wateya cuda de be jî, tê gotin ku Nietzsche jî ji Zerdeşt re dibêje “zarokê min.” De êdî çi be. Heraya hesûd ku qet zarokên wê çenedibûn, ji ber ku afirîneriyên xweser ên şaristaniya grekê tune bûn, dixwaze Zagreûs ji holê rake. Ma pêkan e ku mirov ji ihtîşama jiyane ya kevana çiyayê Zagros û Torosê (*Taureus-Boxe*) neheside? Lê belê ya balkêş û girîng çima kuştina Zagreûs ji jinê (Hera) re, parastin û hezkirin ji mêr (Zeûs) re hatiye bexşandin. Di çîrokê de ev jî tê fêmkirin. Zeûsê ku ji hesûdî û nefreta Herayê ditirse, Zagreûs digire dibe ciyekî pir dûr. Di şikeftê de vedişêre. Dema ku hêj Zagreûs biçûk e, Zeûs dehbeyên pir ecêb kuretan peywirdar dike da ku dema xetere çêbibin dê li mertalên xwe bidin, deng derxînin û Zeûs agahdar bikin. De ka werin li rastiya veşarî binihêrin! Gelo ev ne Zerdeştê li Zagrosan di şikeftê de dikeve silûkê be û derdora wî jî gelê bi çek û mertal xwe rêxistin dike, ne gelê kurd be? Gelo? Hema dengê dibêje, “Çima nebe?” Û em çîroka xwe didomînin.

Hera, bi hinek sêhr û efsûnan kuretan ku Zagreûs diparêzin bê bandor dike. Ji bo Zagreûs bikujin tîtanên wekî dêwan bi ser de dişîne. Tîtan destpêkê kuretan dikujin. Lê belê ji ber girsbûna xwe nikarin bikevin şikeftê. Bi vî awayî nikarin zerarê bidin Zagreûs an jî Zerdeşt. Sozên ku li hemberî wî dan jî nikarin pêk binin. Lewra ew (Zagreûs) di wê derê de di nav lêgerînê de bû. Hêzên ku di derûniya mirovan de pevdîçin, metafî-

zîkî ne. Navê wan başî (Ahura Mazda-Hurmuz) û xerabî (Ehrîman) ne. Mirovê zanyar jî di kesayetiya xwe de bi îblîsê şaristaniyê re pevdîçe.

Hêzên xerabiyê sondxwarî ne, ku ji zarokên arî/xalî, pêxemberê zû zayî re kemînan deynin. Zekaya wan a analîtîk ji aliyê konetiyê ve tekûz e. Ji bo plansaziyên xwe pêk binin awênayekê datînin ber deriyê şikeftê. Zagreûsê zarok ji ber tarîbûna şikeftê derdikeve derve, dixwaze derkeve ronahiyê. Awênayê digire û hewl dide ku “Xwe nas bike.” Li ser rastiya xwe wisa lê hûr dibe ku îblîsê şaristaniyê ji bîr dike. Tîtan di wê demê de xwe diavêjin ser û zarok (pêxember, feylesof) digirin. Lê ew dizane têbikoşe. Destpêkê xwe dike şêr û xwe ji destên wan rizgar dike. Dîsa wî diqefêlin. Piştê dibe boxe (*Taureus/Torus*) lê mixabin Zagreûs li wê derê parçe dîkin. Gewdeyê wî ji hev vediçirînin, goştê wî dixwin. Heta Zeûs pê dihesê, her tişt diqede, tişteki kirinê namîne. Li ser vê yekê Zeûsê ku ji bilî destdirêjî û birûskvedanê tişteki din nizane, du birûskan bi ser tîtanê de dişîne û wan dike xwelî û rijîk.

VI. Prometheûs li Zagrosan e.

Xweliya Zagreûs, tîtanê û kuretan tevlihev dibe, dikeve nava hev. Li qûntarên Toros-Zagrosan baraneke xembar dibare. Hêstirên çavên Korê û Demeterê ne, barana ku dibare. Bi barîna baranê re xwelî dibe avşoq, têkilhev dibe. Piştê Prometheûsê weke nîvbirayê Zeûs tê binavkirin, ku ew bi xwe jî tîtanek bû, tê wê avşoqê dike hevîr, baş distirîne û şiklê mirovekî didiyê.

Bi vî awayî dîsa li qûntarên Zagrosan civakîbûnê ango kar û barên mirovên destpêkê li vîra aj dide û bi pêş dikeve.

Zagreûs, ji aliyê Eşq, ronahî, bedewî, hevparî, xweza û xwezayîbûnê ve BAŞIYA TEQEZ e. Li milê din tîtan (mrovê şarezabûyî), kirêtî, mirin, talan, zordarî û XIRABIYA TEQEZ e. Prometheûs (yê

ku zû difikire, pêşbîn) ku weke pêxember derdikeve holê, bi me dide nîşandan ku ji çavkaniya kevneşopîya çanda Zerdeştî xwe xwedî kiriye û dewlemendiya xwe ji rehên wî girtiye. Êdî dê hewl bê dayîn ku Lewhî Mahfûz (Pirtûka nepenî-Pirtûka çarenûsê) were xwendin û bê zanîn. Zeûs tu caran negihîştîye Zagrosan. Heta niha jî ev yek nebûye hedê tu kesî. Îcar dema ku negihîjinê, dixwazin serweriya mîtolojîk li ser saz bikin. Lê Zerdeştê ku hêza xwe ji nîrxên hêzdarên neolotîkê (Ji Demeter û Korê) digire, bi navê Promete di hinavê şaristaniya grekan de weke çanda mîtolojiyê ya berxwedanê rista xwe domandiyê.

VII. Bilêvkirina heqîqetê

Rastiya ku di mîtolojiyê de veşarî maye ne “raborî” ye, di heman demê de “niha” ye.

Ev e berdewama çîrokê:

“...Ez dixwazim bi du şiroveyên Zerdeşt û Sokrates mijarê sergihayî bikim. Weke tê zanîn biwêja ku Sokrates pir tîne ziman, “XWE BIZANE” ye. Tê gotin ku Zerdeşt li Çiyayê Zagrosan ku dilketiyê wan bû, dema ku roj bi hemû rûgeşî û ronahiya xwe ve hiltê, dengêki dibihîze. Bi ser wî dengî ve wiha diqîre: “BÊJE TU KÎ YÎ?”... Ango pîrozweriya Key-Xwedayî (*Qral-Tanrî*) ku bi awayekî şaristanî bi xwe ye, didarizîne û şoreşa sincî ya Zerdeştî pêk tîne. Ev şoreş, şoreşa bi şeweya ronahî-tarî, başî-xirabiyê ye.

Gotina dawîn

“Dema bi ser min de hatin şewaza min a darizandina wan hinek Zerdeştî bû: ‘HÛN KÎ NE?’ (Civaknasiya Azadiyê)

Dîmenên te

Fadil AYDEMÎR

Çend dem û dewran in bi hesreta te me. Roj û şev, meh û sal li pey hev diherikin. Lê weke ku min di textê felekê de sing kutabe, hê li vir im.

Berfa te li por û rihê min dibare, ma deşt û newal û dar û devî û kevir û kuçikên te mîna xwe ne gelo?

Ava çem û kaniyên te wek berê diherike yan na?

Ka bibêje, bilûrên şivanan li bin stêrkên asîmanan deng vedidin di bédengiya şevên te de?

Keçên ciwan li ber agirê qirşikan bi awazên dîlşewat hevalbendiyê dîkin bi bêrikirînan xwe re; di nav deryaya xeyalan de soberiyê dîkin wek demên berê?

Dem û dewran diguherin. Çendî bahoze û tofan bi ser me de hatin jî her yekê pariyeke jî rih û canê me bi xwe re bir. Lewre hin fikar bi mirov re çêdibin. Niha jî te dûr im lê tu nayê jîbîrkirin.

Bêrikirina te her dem di dilê min de ye. Min bêriya berf û barana te, av û gihayên te, gul û sosinên te kiriye. Destê min negihîje te jî, bîranînen te şewqa çavên min, germa dilê min in. Digel hemû tofanan bi giyana te li ber xwe didim, bi bahoze re serî dikişînim. Ji aliyekî ve bi awaza dengbêj a ku dibêje “Emrê çûyî cardin nayê” xemgîn bim jî, hokehoka şivanan, awazên dîlşewat ên bilûrvanan, stranên bêrîvanan ku bi salan e ji guhên min derneketine, kêfxweş im, dîlşad im. Nivjînek be jî, aramiyê dide giyanê min.

Niha çend dîmen ji bedena te li pêş min raxistî ne. Yeko yeko bi baldarî temaşê dikim, dixwazim di kûrahiya wan de bi giyanê te re bihelim û bibim yek.

Qasek şûnde dîsa hemûyan didim ber hev, dest bi lêpirsînê dikim da ku têbigihêjim tu niha çi dikî, di kîjan rewşê de yî, serpêhatiyên te çi ne? Ji kevir û kulîlkan, ji karik û

berxikan dipirsim, lê her yek bi bédengiyê watedar li min dinihêre.

Êdî dizanim ku hewcedarî bi tu bersivê namîne. Têdigihîjim ku tu jî wekî min bi hesreta dengê zeriyan û temaşekirina meşa bêrîvanan î.

Xwezî bi wan rojan ku me bi hev re stranên evîne guhdar dikirin. Dengê qaz û qulingan aso dixemilandin.

Bi dilekî şikestî strana “Qîz û bûkên êla me meşîyan avê” dilorînim ji xwe re. Û xwezîya xwe bi wan deman tinim.

Gelo dibe ku dîsa di hembêza te de bibim hevparê wan dîlşadiyan? Di bin siya kon de li ber kuçik çong bidim û girara ku bêhna pûngê jê difûre bidim ber kevçîyan?

Û di pey re qasekê bi ser piştê hespê boz bikevim, qirş û qalan bidim bayê bezê.

Dizanim niha xewn û xeyal e ev.

Lê di dil de zindîbûna van bêrikirînan jî xweş e, giyanê didin min. Va ye jî dilê xwe cotek çûk difrînim ba te. Ew ê hesreta min a salan jî te re bînin.

Dixwazim tu jî ji min re rûyê xwe yê bi ken ku şewqa wî wek stêrka sibehê di reşahiya çavên te de dida der bişîni. Da ku ji dilê min ê xemgîn re careke din bibe aramî û ronahî

Piştî ev qas sal awaza wî ji guhên min derneket. Çend demsal hatin û çûn, daran çend caran pel weşandin, çend zivistanên bi xezeb derbas bûn, kulîlkên rengîn çend caran silav dan rojê û çend Evîndar bi şahîya xwezayê re ketin govendê; nizamim. Lê ji bîra min neçû.

Ew dîmen hê jî li pêş çavên min e.

Ew deng ji guhên min derneket. Bi salan e wek kenekî nivçe li ser lêvên min ma.

Ev xewnek bû gelo? An ez bi xwe bûm xewn, nizamim. Tenê dizanim ku ji wê rojê vir ve parçeyek jiyana min e.

AWAZ

Fadil AYDEMÎR

Şev reş û tarî. Heyv hê derneketiye ji paş çiyayan. Xweza bêdeng. Çend stêrk li aso weke ku ji hev re çav diqirpînin, ronahiyê didin tariya şevê. Giyanewer ji kelekela rojê betilîne, xwe berdane nav dilê bêdengiyê. Carna ji dûr ve dengê çûkeke şevê yan ewtewta seyekî were jî, di nav bêdengiyê de kêliyêk din winda dibe. Bayê hênîk aramiyeke ji bêhna kulîlkan dagirtî digêrîne li dorhêla xwe.

Şev reş û tarî. Dîsa di bêdengiyê de xwe berda nav deryaya xewn û xeyalan. Cîhaneke bêdawî vebû li pêş çavên wî. Destên wî ji ber xwe ve çûn bilûrê. Gewriya xwe paqij kir, bêhneke kûr kişand nav cergên xwe. Êdî bi tenê ew û awaza bi keser mabû di wê cîhanê de. Demsal li pey hev diguherîn. Deşt û çiya, çem û kanî, ax û aso di ahengekê de.

Şev reş û tarî.

Şev dengêkî ji awazan e.

Hey Xwedêyo! Tenê bi min wiha ye gelo? Ma min wiha xwest? An... ez jî nîzanim.

Heyv hêdî hêdî bilind dibe ji paş çiyayan. Lîstika zarokan hê bi dawî nebûye. Qêrîna wan tevlî bayê şevê dibe, qaseke din ji zinaran vedigere.

Bi tenê yên ji hayhoya rojê betilîne xwe avêtine bin pêşa kon.

Şev cîhaneke bi rengê xwe ye li van çolan; li zozanên Serhedê û li Şeref-dînê. Ger tu zimanê wê bizanibî li te xwedîtîyê dike. Dil wê demê dikare bigihîje meqseda xwe. Hemû kul û keseran bi te dide jibîrkirin, nexwe, deriyê xeman li te vedike.

Haya we ji agirê qirşikan heye gelo? We qet di bêdengiya şevê de li qirçe-qirça wan guhdar kiriye? Yan reqsa agirê wê?

Şev bêdeng e. Çavên me li dîlana ba û agir in. Agirê qirşikan. Her kes li dora kuçîk civiyaye. Lê bi xwe ne li wir in. Kî li çi digere, li benda çi ye gelo? Kî dizane, xwezî bi demên jidestçûyî dikin ango yên tu carî bi dest nakevin? Ma ez bi xwe dizanim ku li pey çi me.

Şev bê deng e. Dewran bi tenê ya xwediyê şevê ye.

Û awaz...



Bahrî SALGIN

Min tovê hêviyê çand
 Li perava xeyalên zarokatiya xwe
 Ya şehitî
 Ji avzêma dilê derizî av didim
 Kulîlka hêviya pêşwext
 Li dûriyara çarenûsa çewt
 Li te geriyam bê rawestan
 Jixweber ketim dafika awirên
 Cotmewîjkên çavên te
 Bûm girtiyê erjeng
 Ê hikûmxwariya hezkirina dilê te
 Xew li min herimî
 Xewn li min bûn kabûs
 Di kevnariya dêmên demê de
 Bûm penaberê xaçeriyên xapînok
 Şitlên bêwext pel weşandin
 Li bihara dilê min
 Hêj nîvê havînê nehatî
 Ripîrût ma "darika miradê"
 Ya hêviya hebûna min.

Dîsa jî ji lêgerîna gihana te danegeriyam
 Min her çar demsal mijandîn
 Ji bo xatirê xweşikahiya te
 Di hembêza taristana şevên
 Tenêtiya hebandina xwe de
 Wek kedîkirina karxezaleke kovî

Ji roja mirêka merêsiya te ketî pêş min
 Û pê ve
 Bişîrînên bextewariya zaroktiyê
 Bi tevahî xeyîdîne ji lêvên hêviya min
 Bûne perbaskên perperîkên dilşewat

Girtîgeha Sêrtê

Ciwanmerd

Ji bo bîranîna Egîd (Hasan Hikmet Demîr)

Qenco û Cano

Kevala yekemîn

Kevala portreyî ya xortekî çeleng e. Li ser fona şeveke bi stêrk, reng: Lajîwerd e û zera xweliya germ a serê lorînekê. Lorîneke zîz ku ji Lorenayê du roj û sê şevan oldartir e.

Stêrkeke rojhilatî diçilvile di rûyê xortê şervan de. Bêje, derya û dinya qedîrnas e ji min û te re. Bêjee!

Di çavika bendîxaneyâ zilmê de

hatin her du destên ciwanmerd ên balûrgirtî bi têla reş a pola girêdan ji bo ku bibin warê çûnûnehatê...


Bi rojan bû ku asaq û îşkence lê hatibû kirin. Serî dabû, lê sir nedabû. Dixwestin tenê gotinek mîna "Poşman im" ji devê wî bigirin.

Na! Dizanibû ku poşmanî mirin e. Ji ruh û jiyana mirovbûnê dûrketin e

Wekî her mirovî dema ku laş biêşe, dinale ew jî di dema ku di çavikê de bi tenê bû ji ber êş û jana birînên xwe dinaliya, lê dema ku ew dibirin asaqxaneyê ligel hemû êşên ku mirov li ber de yax neke jî, ew nedinaliya. Ji devê wî ne "ax" ek, ne jî "bes"ek dernediket.

Di her asaqxwarinê de di hinava xwe de, di bîrewerîya xwe de ji roja xwe re dibû mêvan; pê re sohbet û galegal dikir. Jê hêz digirt, jê wêrekî distand û çî tirs û taswasiya ku hebû ji ser diçû.

Bi bişîrîn pêşwazî li ceryanê, li daleqandina ji milan û li feleqeyê



û li hemû cureyên asaqan dikir.

Şikencekaran berî bi çend rojan ew derxistibûn pêşberî dadgehê.

Dadger û dozger û hemû heyeta dadgehê di neqeba çend çirkeyan de, biryara darvekirinê di derheqê wî de dabûn.

Dozger li peyva wî ya dawîn ji nepîrsîbû!

Û êdî dem hatibû

Çavên wî mîna çemên ku bend li ber wan çêkiribûn miçîqibûn.

Hemû hêsirên xwe bera ser kezeba xwe dabû. Berî bi kêlikekê jî bêhemdî tenê du dilop hêsir gindiribûn ser dêmên wî. Lê, berê xwe guherîbû da ku kes nebîne!

Çar kesan bi çeplên ciwanmerd ên ku hêz di wan de nemabûn girtin û ew danîn ser dartermê. Bi paçekî reş jî çavên wî girêdan! Da ku kesî nebîne û nas neke.

Bi tenê bû, lê yên ku tirsîyabûn ne ew; yên din bûn; dozger, celad, pastar û general.

Ciwanmerd ber bi wargeha zilmê ve birin.

Yên ku ew li ser dartermê kiribûn û dibirin, ew nas nedikirin,

Nasname û sedema rewşa wî mitale jî nedikirin. Kuştin û darvekirina mirovan ji van çar kesan re pîşeyek bû. Ji ber kuştin û darvekirina pir ku bi salan e dikirin, êdî ne bext û êşa dil û ne jî darizandina hestên wan mabû. Ango tune bû, êşa dil tune bû bext û wijdan!

Û kî ne, kî ye, çi kes in; jin an zilame, zarok an kal e.

Ferq nedikir ji wan re. Û ji wan re ya girîng bi darvekirinê re stendina pere û diravan bû. Di her kêlika dar-

vekirina mirovekî/ê de mîna ku ayînekê an ji dawetekê bikin, ji ser hişê xwe diçûn; Serxweş dibûn, girêz û kef ji devê wan diherikî.

Bi qasî kêlikekê çûn, dengê ketguhê Ciwanmerd; "Vekin çavên wî! Ji me re ne xem e ku me ku me nas bike! Rêwî ye, ew!"

Kevala duyemîn

Sêdarek û sêdareke cil û rûspî, Qazî!

Ax Qazî reng; spî û gewrê mij û morana xayîntiyê. Qazî ax Qazî! Qurbana her pêjna ku kurd vedijand. Qurbana her agirî ku azadî dipêjand li tenûra Kurdistanê min a Mehabadî. Ax Qazî!

Stêrka rûyê ciwan a mehabadî.

Piştî têkçûneke karasatî.

Dengê celadan bilindtir dibû;

"Her bijî komara îslamê!"

Di wan çend kêlikên ku li ser dartemê,

ew bi awayê tewteweyî dibirin de, Ciwanmerd ponijî.

Û di vê ponijandinê de gotina kalekî heftê salî ku berî bi pênc salan di rêwîtiya ber bi şefeqên rengezmanî de dîtibû, hatibû bîra wî.

Di rêwîtiyê de jê re bûbû hevrê. Ne tenê hevrê, jê re bûbû zanyar, aqilmend, şewirmend jî. Li ser gera li Heqîqetê jê re gelek tişt rave kiribû. Bi rojan, bi hefteyan bi rê ve diçûn/çûbûn, lê ligel ewqas ku westiyabûn jî qet jê têr nedibû, nedixwest ku rêwîtiya bi kalê azadiyê re biqede.

Li çîroka pîrê azadiyê li gera rasteqîniyê guhdar kiribû.

Hêz stendibû, dil qewintir bûbû.

Hesreta azadiyê geştir bûbû û ligel vê

Ax Qazî reng; spî û gewrê mij û morana xayîntiyê. Qazî ax Qazî! Qurbana her pêjna ku kurd vedijand. Qurbana her agirî ku azadî dipêjand li tenûra Kurdistanê min a Mehabadî. Ax Qazî! Stêrka rûyê ciwan a mehabadî.

ji tēghiştibû ku jîn û jîyan mîna xew-
nekê ye, kurt e. Û heta ku mirov lê
hay dibe diqede jî.

Ji ber vê ye ku gotina pîr di ke-
rika guhê wî de timî dikir zingînî;
“Mîna ku tu yê sibê careke din ne ji
gera xwe ya li heqîqetê bê navber bi-
domînî, ji ber ku rojekê tu çavên xwe
ji vê jîyanê re bigirî, dê gera te nîvco
bimîne. Çi dibe bila bibe hesret û
evîna rasteqîniyê bila tim û tim di pa-
xila te de be û di dilê te de geş be!”

Rêwîtiya wî ya ber bi heqîqetê ve
nîvco mabû.

Ji ber veqetîna ji hevrêyê xwe pîr,
pir li ber diket û êşeke giran xwe di
dilê wî de dida der. Xemgîn bû lê ser-
bilind û bê tasewas bû, weke Xanê
Çengzêrîn weke Qazî Mihemed.

Di neqeba wî û kindira amadekirî
de sê bihost mabûn.

Gotina xwe ya dawîn amade kiribû,
bê metirsî bû û mitaleya rewîtiya ku jê
mabû nedixwar/nedikir, baş dizanibû
ku dê hevrêyên wî di vê rêwîtiyê de
xwezî û hêviyên wî bi cih binin.

Xencereke destîreş di pişta wî de çi-
kandin û kindir xistin stûyê Ciwan-
merdê ku dest ji paş ve girêdayî û li
ser dartermê bicihbûyî bû. Bi lez go-
tina xwe ya dawîn ji devê xwe pekand;

Tu her bijî ey hostayê evînê!
Tu her bijî lêgerê rejîma heqîqetê!
Tu her bijî ey afirînêrê mirovên

azad!

Tu her bijî ey...

Kesên ku li hawirdora wî kom
bûbûn û bi kefxweşî li benda bidarve-
kirina wî bûn, ku dengê Ciwanmerd
bihîstin har bûn, hêrs bûn û weke
segên har êrîş birin ser.

Bi darvekirina wî re bazên şerok ên
heqîqetê gotinên wî yên dawîn û hêvi-
yên wî yên di dil de li ser baskên xwe
kirin û ber bi çar hêlên welêt ve firi-
yan!

Kevala sêyemîn:

Bazekî ji çiyê qesta xwe kir. Ji bo
destaneke nû birêse bi tevna tolhil-
dana rojhilatî. Rengê kesk û sor û zer
ê azadiyê, ku bi serê Xanê Çengzêrîn
sond dixwar, ehlê vê xakê.

Nedibû ku ji ocaxa keremeta ve-
jînê ku bi qedera kelehekê dihat pî-
vandin û digot: “Ez Xanê xwe
bernadim. Dim û dim...Rû banade.

Loma got: Egîd û Ronahiya her
qirnî yek e!

Girtîgeha Bolûyê



Polevanê Stêrkan

Enwer EHMED

Hooo!
Dergevanê yezdanan
Melkematê jîyanê
Lavayan ji te nakim
Û ji ber mirinê jî narevim
Were
Stêrkên har
Ji ezmanê min kom bike
Bibe û biavêje tenûra Xwedê
Bî wan ve
Agirê sarbûyî gur bike
Ger têr nekîr
Hemû stêrkên min bibin
Lê ez
Di bextê te de me dergevano
Dest mede stêrk Hêvî(ya) min
Bila stêrka wê her geş be!

Haveynê hêviyê

Vê şevê li vî diyarî
Di kolana xewnên mijgirtî de
Tîrsa veqetîna ji te
Berê min
Dide okyanûsên bêbinî
Û xewrevîniya min
Di destê şevê de westiyaye
Loma jî her şev
Bî sonda jîbîrnekirinê
Ez mijangên xwe
Li wêneyê te radipêçim
Û beşûşîya rûyê te

Di "lêva robarên" çavên xwe de
Dimeyînim!
Kenê te
Li ser kaviîlê dûwarê xewnên min
Ayet e...
Lê zimanê şevê lal e
Aso dûr e
Û her şev dilê min
Ji kaniya bêrîkirina te dinoşe!

Girtîgeha Sêrtê



Nedîm YILMAZ

Dewletê, li bajarokê dibistaneke herêmî çêkiribû. Gundên li derdora bajarokê yên dibistan lê tune bûn, zarokên xwe dê bişandina wê dibistanê. Li gundê me jî dibistan tune bû. Tevî min, em dê şeş zarok ji gundê me jî biçûna wê dibistanê. Vê carê min ê bajar jî bidita! Di der heqê bajêr de, min heta wê demê gelek tişt seh kiribûn, lê belê hêj min nedîtibû. ‘Gelo tişteki çawa bû!’ Min gelek xem dikir û dixwest roj berî rojekê bajêr bibînim.

Êdî ew dem hatibû li ber spîndarê sekinibû. Gundiyên me hêj ji serê sibehê ve zû bi rê ketibûn. Ez û bavê xwe bi qasî saetekê piştî birêketina wan ketin rê.

Hêj riya erebeyê nehatibû gundê me, lewra gundî bi siwariya hesp û hêstiran

an jî bi peyatî, rêwîti li bajêr dikirin. Yê me jî hêstireke rengewrînî hebû û bavê min ez li wê siwar kiribûm.

Ku em nêzî bajêr bûn û gihîştin ser riya erebeyê, bavê min ez ji hêstirê peya kirim. Sedem; hêstir ji erebeyan disilikî. Dengê erebeyê dihat lê me got qey li nava bajêr e. Hêj em jî çileçepê neziviribûn bejahiya rê, mînbûsek derket pêşiya me, bi dengê qornayê hêstirê hevsarê xwe ji destê bavê min filitand û xwe di hafa rê de avêt ber bi newalê de reviya û min jî xwe li pey wê avêt. Bi rastî ez jî bi qasî hêstirê ji

mînbûsê silikibûm. Çi tişteke bi sewm bû, gidî! Heta bavê min hêstir girt û anî, ez hêj di ber rê de, wek berxikekî virnî ku maka xwe winda kiribe, wisa bê mecal û şaşwaz mabûm.

Li kêleka bajêr Xana Hecî hebû. Em çûn wê xanê. Bavê min hêstir di tewleya xanê de girêda. Di tewleyê de hêstirên gundiyên me jî girêdayî bûn. Min li wir dest û rûyên xwe şûst û av vexwar. Hindik jî be, tirsar ser dilê min sist bû. Bavê min, di xurca li ser piştê hêstirê de cotê pêlavên xwe yên îskarpîn derxist û vegirt. Pêlavên xwe yên lastîk jî xist xurcê.

Wextê em daketin nava sûkê, dîsa

Wextê bavê min û gundiyên me qeyda me li dibistanê pêkanîn û em radestî rêveberiya dibistanê kirin, ji me xatir xwestin û çûn, hingê şewatekê bi hinavê min veda. Em li ber sêncê rûniştin û me li wan mêze kir, heta ew ji ber çavên me winda bûn.

xof bi dilê min ve weriya. Min pêşa sakoyê bavê xwe bi şid girtibû û

bernedida. Çûn û hatina erebeyan, qelebalixa gel a li nava sûkê ez ditirсандим. Çiqas çayxane hebûn, gidî! Hema bêje ku her deh gavekê çayxaneyek hebû û her çayxane jî tije millet bû. Min tu wextê hebûna ew qas mirovan di hişê xwe de nehizirandibû.

Em çûn daketin dikanekê. Çawa ku min dikandar dît, min ew nas kir! Du sê caran li gundê me bûbû mêvan. Bavê min merhebatî pê da, min jî destê wî maçî kir. Lê wî camêrî xwe ji kursiya xwe sist nekir. Xêrhatin-dayîna wî jî bi zarekî ne jidil û bi



çavekî biçûkdîtî bû. Ji bo hewcehiyên malê, bavê min dê hin tişt jê bistendina. Dikan tije tişt bûn; ji tiştên xwarin û vexwarinê bigire heta kincên vegirtinê û heta pertal û heta amûr û alavên kar tê de hebûn. Bavê min ji bo min şalek, îşlikek û cotek pêlav stend. Ew îşlik bi dilê min nebû. Îşlikekî bi rengê hêşîn û xalên sor li ser hebû, min ew dixwest. Lê belê dikan-dar xwe newestand, ji kursiya xwe ranebû û ew îşlik ji sing dananî û neda min. Ne bi dilê min be jî ew îşlikekî reşik bi min da wergirtin. Bavê min jî dengê xwe dernexist.

Bavê min, ji bo fistanekî ku dê ji diya min re bikiriya, ji dikandar çar metro qumaş xwest. Dîsa dikandar zehmet nekir ji kursiya xwe ranebû

piyan û ji bavê min jî nepirsî bê ka qumaşekî çawa û ji rengêkî çawa dixwaze. Hema destê xwe dirêjî malika li kêleka maseya ku li ber rûniştî bû kir, topek qumaş jê kêşa û dest bi pîvanê kir. Ku li ser pîvankêşeya bi keviya maseyê ve çêkirî, çar metro pîvand û dê bi meqesê bibiriya, bavê min jê re got “Ez benî, ez vî qumaşê manûse yê gewrik naxwazim. Bila qumaşekî qewî, rengkêş û spehî be!” Destîşarkiya topek qumaşê ku dil berdabûyê kir, lê dikandar li bavê min hêrs bû û lê qêriya; “Dê kî niha rabe ji wê malikê wê topa qumaş derxe, veke, bipîve, bibire û dîsa li hev bipêçe û deyne ciyê wê, erê? Ev jî qumaşekî xweşik e. Ma jina te fistanê rengbelek li xwe neke nabe? Ez nebim tu kes

van tiştan bi deyn nade te weha. Welehî êdî qencî jî bi kêrî we gundiyan nayê ha.” Bû nirçenirça wî.

Li hember wan gotinên daberizî yên dikandar, bavê min dilşikestî û stûxwar rawestiya. Ji dikandar minet vegirt ku tiştan bi deyn difiroşê, lê dîsa nexwest wî fistanê manûse bikire û dîsa jê daxwaza fistanê ku dil berdayê kir.

Di wê navberê de, serleşkerek tevî du cendirme û jinikeke ciwan, ji derî ve ketin hundirê dikanê. Hema çawa dikandar ew dîtî û nedîtî, ji kursiya xwe firî û ber bi wan ve çû. Bejna xwe li ber wan tewand, bi devkenokî “Kerem bikin, ez benî, kerem bikin! Fermo, fermo! Hûn bi xêr hatine, we şeref da min. Fermo, fermo rûnin!” Li ser kursiya xwe serleşker da rûniştandin. Deng li çaygerê çayxaneyê kir û ji bo wan çay xwest. Li ber wan zend û bask rawestiya, bi amadeyî. De ka çi hewcetiya wan heye ku pêk bîne. Min dît ku bavê min jî xwe kêşabû quncik û şewqa xwe ji serê xwe danîbû û destên wî di ber wî de berdayî rawestiyabû.

Jinika ciwan, qasî nîv saetê zêdetir bû ku çiqas kinc û pertalên jinan ên bi singan ve daliqandî bûn û çiqas pertalên di wan malikan de bûn, hemû bi dikandar danî li ser maseyê û erdê. Dest lê gerand, çav lê zivirand û tu tişteki ku pê qayil be û bikire nedît. Ji dikanê derketin û çûn. Bi çûna wan re, dîsa dikandar bejntewayî li hember wan rawestiya û ew bi rê kirin. Bi saya serê jinikê ku hemû pertal ji malikan daketibûn ser maseyê û erdê, ji bavê min re fersend ev fersend bû êdî, bavê min fistanê ku dixwest, çar metro jê da birîn. Jixwe guhên dikandar jî wek berê bel nebûn; şikestibûn.

Bavê min, ji bo hewcedariya malê çay, şekir û hin tiştên din ji kirîn û di

tûrikê xwe de bi cî kirin. Em ji dikanê derketin, li sûkê, li gundiyan me geriyan. Me ew li çayxaneyekê dîtî. Dema me ew dîtî, bêhna min vebû. Li dora maseyeke nizm û li ser kursiyên bê pal ên biçûk ên li ser lastikêşayî rûniştibûn. Em ji li cem wan rûniştin û ji me re çay xwestin. Wan çay vexwaribû. Ez li benda bavê xwe sekinîm bê ka wî yê çaya xwe çawa vexwara ku min jî wek wî vexwara. Ez dihizirîm û min digot qey li bajêr çayvexwarin bi qeydeyekî cuda ye, lê min dît ku heman bi qaydeyê gund bavê min çaya xwe bi kirtleme vexwar û min jî weke wî kir. Lê çavên zaroyên gundê me li ser min bûn. Wan fêr kiribûn ku ez li benda bavê xwe mame. Ango bavê min bi çi qaydeyî çayê vexwe ez ê ji bi wî qeydeyî vexwim. Lewra ev yek di hişê wan de jî derbas bûbû. Me li nav çavên hevdu mêze kir û bû pixtepixta kenên me. Mezinên me tenegehîştin de ka em ji bo çi dikenin. Lê me bi nêrînên çavan ji hevdu fêr dikir.

Dibistan li kêleka bajêr bû. Ji sê avahiyên qerase pêk dihat. Sênceke têlinî ya dirîk li dorê pêçayîbû. Wextê bavê min û gundiyan me qeyda me li dibistanê pêkanîn û em radestî rêberiya dibistanê kirin, ji me xatir xwestin û çûn, hingê şewatekê bi hinavê min veda. Em li ber sêncê rûniştin û me li wan mêze kir, heta ew ji ber çavên me winda bûn.

Heta wê demê min xwe ewqas neçar û jar his nekiribû. Çawan ku çûkekî çengşikestî bikeve nava şetê avê û nikaribe jê derkeve, hema ji ber hewla ruhê xwe biperpîte û av di ku de biherike, wî jî bi xwe re bibe, derûniya min a wê demê jî hema wisa bû. Min lê mêze kir ku çavên hevalên min jî tije hêsir bûne û ew jî weke min digirin.

Girtîgeha Bolûyê

Jiyaneke
şikestî

Veysel ÎLHAN

Ez qaqlîbazekî xeydok im îşev
 Ji nav dilê deryaya penaber
 Rê dûr e
 Û xem birîndar in
 Axa pîroz wek bihareke avis
 Govenda mehên revok digêrîne
 Tu jî li min mêzê neke
 Dîsa dilê min wek meha îlonê
 Pelên xwe diweşîne
 Û kaniya ruhê min ziwa dibe
 Çavên min qerimîne
 Ez li benda te me
 Dema ku tu çûyî jiyana min şikest
 Te stêrkên asîmanan ji xwe re birin
 Xem û xeyalên evîne weşîyan
 Ez xeyîdî me dîsa
 Çemê Dicle û Feratê xeyîdiye
 Kevokên spî bi gulên sor û gevez
 Mirîna min dixemilînin
 Ez li ber sêdarekê me îşev
 Porê dilbera min, min dixeniqîne
 Ez xeyîdî me îşev,
 Ez penaberê dilê xwe me dîsa
 Dilê min xwînî dibe
 Û ez xwînî dibim ji nav dilê
 Behra Reş...
 Ez xeyîdî me îşev,
 Û Behra Reş ji min xeyîdî ye...
 Tu li ku yî
 Ey dilberê!...

Girtîgeha Kocaeliyê

Li şewata zewiya wê digirim

Ahmet TAMÎR

Îcar çi bû? Nexwe bilbila daristana
min di cihê teng û tarî de bi van
rondikên çavên xwe yên birbîsînê yê
hungivîn hûr hûr dirûnê dike?

Tu rast dibêjî. Dinyayê tevî em ji bîr
kirine! Vê gavê ez li hinda te xwe wekî
berxê li ber şîr li ser mêrgê hînî çêrê
dibim, dibînim.

Dil balîfa te ez ê ji gola
xwînên xwe diloqeke xewn,
bidilopînim ser singê te.

Li ser nivînê sêwî û
êtîm dirêjkirî bûm û li
şewata zewiyên te di-
geriyam. Şînahiyek wek
kevirê aşê avê di ser
min re digeriya. Gava
diwestiyam min derd û
êşên xwe bi siya xwe re
par ve fikir. Bi
parvekirinê re temenê
min diweşiya, wekî
tûyên helisî.

Dîtina ku min dît
ewrekî reş mîna qamîşê bejî
xwe li royê pêçabû. Riya min
tev dirî, kelem û sinc bûn. Rêwiyê
riyên nenas bûm. Xwîn ji canê min
ziwa bûbû. Bi çav û bedena westiyayî
tewşîn tewşîn di wê riyê de
dimeşiyam. Dengê ji min re wiha
digot:

-Hey xortê miradnefesilandî û dilgu-
vaştî. Ev nediyarî bi ku ve!? Were
qonaxa min, tu yê poşman nebî ji
hatina xwe!

Li ser
nivînê sêwî û
êtîm dirêjkirî bûm û
li şewata zewiyên te di-
geriyam. Şînahiyek wek
kevirê aşê avê di ser
min re digeriya. Gava
diwestiyam min derd
û êşên xwe bi siya
xwe re par ve
fikir

Dimeşiyam bi dengê wek dengê
têkçûnê desthilatdarek bi ser min de
qîriya "Ez qîza kûçikê avî me, bi tîpeke
dengê min re erd û asîman radiweste;
lê tu dimeşî. Tu çi teba yî!? Carekê
min ji xwe pîrsî;

-Dibêje ez qîza kûçikê avî me, nebî
nebî bila daristana min jî wekî kurdên
winda yên di bin avan de hatibe
veşartin? Gelo ez herim qonaxa
wê, wê ji wê bipirsim?

Dengê mîna dengê keçeke
birîndar û bê mirad ji min re
digot:

-Ew dengê xapînok ê
jînan e! Neçe! Wextê xwe jî
pê re qetil neke, biber-
sivîne!

Wê çawa wer got min
tavi lê wisa bersivand;

-Ez ne parsekê qonaxa te
me, rêwî û bilbilê daristana
xwe me! Dûrî serê wê, li şe-
wata zewiya wê digirim. Dîkê
bê nikul nîn im ku tu min di
qonaxa xwe de serjê bikî! Ez layiqî
vî halî me, ne layiqî hûr û pizûran im!
Min carekê dît gurzek avêt min, min
bazda.

Ji nişka ve min dît ku em li bin
dara behîvê ne, te xwe mîna lema
petêxên ezoyîn li min lefandiye û
gepikên min jî di nav kefa destên te de
ne, tu ji min dipîrsî.

-Çima tu wekî çûka zivistanê diri-
cîfî?

Hingê min got qey ez bê ziman im. Te lêva xwe ya gilyazî da ser lêva min a terikandî û me xwe di nav kulîlkên behîvan de dirêj kir. Bişkokên lemên me bi germahiya me yeko yeko dibişkuvîn. Bedena me mîna ax û avê. Wekî ba û xîşal bûbû yek. Xwêdan wek aviya berbanga sibê dişemitî ser xavika pîvokê.

Me ji hev re bi daxwaza miradên hev ji kulîlkan tac çêdikir ku "Ew dîsa çû kul? Gazî wê dêlikê bikin! Keça qaltax!!" Van gotinên bavê te wekî zîpika çileyê zivistanê li bedena me ketin. Me ber bi mala we ve bazda. Tu ketî hundir, min jî da pey te. Te ji min re got;

-Ev can jî te re feda ye. Tu jî dizanî ku wê canê te biêşînin. Ez ê pir li ber


te bikevim! Derket derve.

-Bila canê min jî bi canê te re biêşê. Te qebûl nekir û te ez derxistim. Bê hemdê te, gava min dengê te yê "ax" û "ay" bihîst, ji kerban min serê xwe li dîwarên we dixist.

Bi lêdana serî re ez ji xewn û xewê veciniqîbûm û min serê xwe li hesinê ranzeyê ku ez li ser radikevim, xistiye. Saet pencê sibehê bû. Xew ji min xeyîdî, hesin bi min kenîya, min tifi wî kir û jî nav nivînan derketim. Min li kîjan dîwarê hucreyê mêze dikir, her wekî ji min re bibêjin "Ox, em dîsa gihiştin armanca xwe." û hev du pîroz dikirin.

Girtîgeha Çewligê

4 BERHEMÊN HÊJA !



Berîya nîba romaneke bi vî curebî nehatiye nivîsîn... Romana Omer Yaman, tekane ROMANA VEBÊJ e...

Roman
Jînek çiyayî
KARWANÊ AZADIYÊ
Omer YAMAN
Rûpel 368
15 TL



Ligel romana Rêşad Sorgul hûn jî dê pê re derkevin meşa lêgerîna ji bo beqîqetê...

Roman
Nîqutî dilê min
Rêşad SORGUL
Rûpel 148
10 TL



Têkoşîn, azadî û besreta ji bo tîrêjên rojê di nava malikên belbestên Riyad Ahmed de veşartine...

Helbest
Tîrêjên Rojê
Riyad AHMED
Rûpel 208
10 TL



*kurdî - tirkî
türkçe - kürdçe*

**Ferhengoka kurdî-tirkî
tirkî-kurdî**
5 TL

WW

NAVÎŞANA XWESTINÊ:
TEL: 0412 237 48 90 - 91
Email: awelat@yahoo.com

Meşo

Sînan SUTPAK

I

Meşo lajo meşo!
 Tî yê sera şînê?
 Tîkaya zerî da mi
 Parçeyê ciger da mi re kewte
 Leteyê kezebi, xapa dirbeta akerdê
 Hilmo hesretan de fetisyaye
 Tiyê sera?
 Wa şew da min a bêaşmî ro estarey
 nêpeysê
 Wa ko dê hêviyan a fina torzile nêvaro
 Estareyo ki mi bi hezar omida degrot
 xo zerî ro
 Wa nêderiskiyo şiyayen da bêpeynî
 Û damarî mi ro nêmasê
 Saqey nêçengişyê
 Tî yê sera şînê?
 Têlanê por dê siyay xo cena temen de
 sipero
 Wa bostanê mi bêaw, bexçey mi
 teyšan nêmano
 Wa rez dê mi de guldani gulan xo ra
 nêçelmisnê
 Meşo! Meşo!
 Tiyê sera şînê?
 Ez a jan dê vîst û heşt dirbetan de
 Dejê to defîna kameîn zerî?

II

Dayê! Dayê!
 Bewni dayen da xo ra
 Dem wesar
 Wesaro bêpeynî
 Nefela to çiçekî akerdê
 Merdan dê to de çiçeke sûrî reng danê
 vewrînan
 Renga vewrînan bi cu ya webêna
 Ci ra renga ki rî dê erdî sero çînya vi-
 razêna
 Qandê ki por dê to ya pelwey vewrê
 nêanîşê
 Dekewta ray da wesarêne
 Pelweyê to pora anîştey jano payîzîn
 defînenê zerîyan ro
 Virardenan de tariyey nijîneyênê
 Dayê! Dayê!
 Bewni dayen da xo ra
 Birrikê to o ki veşnabi bejni wekerda
 Zerîya to îniyê cu
 Bostanê merdimey awdano
 Herûn da ariq dê to de gunî dana tever
 Wa bexçey to
 O ki nêdariyêno zerîyan dê pexîlan
 Xincikiney de ziwa nêbo
 Boxçaya keseran adir dê nêzaneyan ro
 veng ki
 Zerqê rojî qîmê heme zerîyan keno
 Ez şîna wa wesar bêro

Girtigeha Elbistanê

Mizgînî

Sînan SUTPAK

I.

Her çiqas kulîlkên şahîyan di reşebayê gumanan de çilmisî û di temenê bi bêrî de stûxwar bin jî, mizgîniyê em jî xist nav hewldanan. Hewldaneke çarlepki. Çirkeyên pîvanlêşikestî, xulqeyên bipoladagirtî, henaseyên basklêşikenandî û bizavên didemlêborînê de tevizî, ji hêlînê firîn. Bi mizgîniya werîna te viyanên zayendî hewl dan.

II.

Ji nava simbilan yeko yeko hilçînî rengên payîzîn. Bi hilçînîna her tayî re, pêjna te viyan dager kirin. Di neynika bangdariyê de diranên te dijmêrim. Xweziyên di bêriyan de hêvilêşikestî. Çirûskên xwe li bîbikan daliqandin. Pêşangeha viyanan di hizir-dankê de şewirdar û di pêjndankê de bertek. Berteka bêriyên temenlêwindakirî. Awiran xemgîniya xwe kir satila bîra mirazan.

III.

Ji şehê diranşikestî bêhna porê te tê, çêja mizgîniyê difûrîne. Her ku hilmekê dibexşîne. Keriyên viyanan xwe bera zewiyê dil dide. Bibik jî çirûskên bîbikan tîna şabûnê dimêjin. Bi mizgîniya werîna te bayê rojhilat li seqema dilan qeşayê dişikîne. Ji heman bayî bêhna kulîlkên ken tê. Ew kulîlkên ku di baxê hevşabûnê de li ser zimanan vekirî. Misk û ember didexise, sûda ku jê re berdilk e.

Girtîgeha Elbîstanê

Kaniya xezalan

A.Selam BARAN

Di biniya gund de çemekî boş û mezin bi şîd diherikî. Aliyekî çem baxçeyê fêkiyan û dehl û darên spîndaran bû. Bi hêşînahiya xwe hawirdor dixemiland. Ew aliyê çem ji tev ji lat û zinarên bilind pêk dihat. Ji van lat û zinarên mezin kaniyek derdibû.

Ji ber ku zinar berwar bûn û jêderka kaniyê di cihekî wisa cîrnexweş û bêkeys de bû, bi hêsanî mirov nikaribûn biçin ser, ji ber vê xetereyê jî gundiyan bi rihetî xwe nedidane ser. Cihê ku şîpa avê diherikî, weke sûlaveke biçûk li dora xwe kefek spî dihişt û diherikî nava çem. Kaniya ku ji nav zinaran derdiket, bi qasî deh bejna bi ser çem diket. Ji ber av û çêrahiya kaniyê, xezal dihatin ser û jê av vedixwarin. Ji ber ku tenê xezal dikaribûn bîn serê, navê kaniyê wekî “Kaniya xezalan” dihat zanîn!”

Digel vê yekê ava kaniyê weke ava kewserê zelal, dêrîn û tehmexweş bû. Zivistanan germ, havînan jî sar û hênîk diherikî. Li der û dora kaniyê weke gulîstanekê her cureyê kulilkan lê şîn dibûn. Nêrgîz û beybûn, binevş û gulên kulîlkên xwe dibişkivandin. Di nava hev de serî radikirin û bêhn û rengên xwe difûrandin hawirdorê. Li ber kaniyê herî zêde pûng û tûzik şîn dihatin. Dema keç û bûkên gund diçûn pincarê, hesreta wan bû ku xwe bigihînin pûng û tûzika kaniyê.

Di gund de Miraz û Perînazê ji hev hez dikirin. Her du ciwanan jî bi bengînî dil berdabûn hev. Gelek caran dem û wextê xwe bi hev re bi kêf û

şahî derbas dikirin. Mezinên malê ji bo ku serê wan girêbidin, çûbûn xwezginiya Perînazê. Di wexteke kin de nas û xizmên wan li hev tîn, bi dilşahî şîraniya xwe dixwin. Her du ciwan wekî ku bask û per bi wan ve hatibin, wisa di nava evînê de dix-eriqîn.

Bi dilxweşî û bextewariyeke mezin li hêviya wê rojê bûn ku dê bigihên hev û daweta xwe li dar bixin.

Perînazê, mîna şitleke rihanê li hevhatî û weke karxezalekê bejnzirav û weke guleke nûbişkivî xweşik û delal bû. Bedewiya wê mîna heyva çardeşevî bi şewq û şemal bû. Rûyê wê mîna berfê spî, dest û zendên wê weke gula pembo nerm û narîn bûn. Hinarokên wê pembegulî û wek dilopeke av zelal bûn. Miraz jî ji çelengî û bedewiya xwe ve ne kêmî Perînazê bû. Ew jî bi bejn û bala xwe, xortekî mîna dara şîmşadê zirav û dirêj bû.

Rojekê keçikên gund civiyabûn û karê çûyîna berhevkirina pincarê dikirin. Di bin tava biharê de keskahîyeke rewnaq kirasê xwe vegirtibû. Xweza geş û şa dimilmilî. Bayekî hênîk li nav çavên wan dida û rûyê wan dialast. Keç û bûkên gund bi fîstînan xwe yên rengîn, hem pincara xwe diçûn, hem jî di ber de distran û kilam diavêtin ser hev. Bi lawîk û heyranokan miradên dilên xwe, li hev xweş dikirin. Di nav sirûştê de dengê wan mîna zengil olan dida. Bi vê şeng û şoxiyê heta wextekî kîs û tûrên xwe

bi têra dilên xwe bi giha û pincarê da-girtibûn.

Pir westiyabûn, ji bo ku bêhna xwe berdîn û xwe hênîk bikin, hatibûn ber çem. Dest û rûyên xwe şûştin, têr av vexwarin. Pincara xwe ji ax û heriyê veşûştin. Paşê jî di nav henek û yariyan de bi dest û çengên xwe av peşkandin hev. Di nav qijîn û qijewijê de ken û dengê wan li bin guhê hev diket.

Kaniya xezalan li raserî wan bû. Keçikan bi henekî gotin diavêtin ber hev û ji hev re digotin: “Kî biçê xwe bigihîne Kaniya Xezalan, tûzik û pûnga wê bîne û bi hezkiriyê xwe bide xwarin, ew hezkiriyê herî jîr û evîndar e. Her çendî ev henek be jî kesî newêrîbû xwe bida ber vî şertî. Lê

Perînazê deng li hevalên xwe kir û gote wan “Va ye ez ê biçim ser kaniyê.” Êdî henekên wan dibûn genek. Hevalên wê xwestin dilê wê xweş bikin û wê ji biryara wê vegehrînin, lê ji gotina xwe daneket.

Perînazê bi hestên jixwebawer zend û bendên xwe bada, daw û delingên xwe hilda û derbasî kersaxa aliyê din bû. Ber bi hevraz ve hilkişîya ser pala zinar. Bi zor û bela û bi zehmetî geh bi destan, geh jî bi lingan hildikişîya berpala jor. Dest û zendên wê tev herişîbûn û di nava xwînê de mabûn. Gavên xwe bi baldarî diavêt da ku tişteke pê neyê. Derdora kaniyê şil û şemitek bû. Hin cih jê kevzeke keskeşîn girtibû. Bi vî halî heta devê kaniyê hatibû. Bi kêfa ku gihîştibû serê kaniyê, di nava şadî û bextewariyê de bû. Ji ber vê serkeftinê hîs û aqilê wê çûbû ser Miraz. Ma ev zor û zehmetî ne ji bo wî bû? Hingî jê hez

Kî biçê xwe bigihîne Kaniya Xezalan, tûzik û pûnga wê bîne û bi hezkiriyê xwe bide xwarin, ew hezkiriyê herî jîr û evîndar e. Her çendî ev henek be jî kesî newêrîbû xwe bida ber vî şertî.

dikir, her dem bîr û xeyala wî dikir. Pir dixwest ku îşev wî bibîne û ev tiştên ku hatine serê wê, ji wî re jî ve-bêje. Dê wê çaxê Miraz jî bizanibûya ku keçikên gund hemû xweziya xwe bi zîrebûn û dilovaniya wê tînin.

Li ser kaniyê xwîn û heriya dest û rûyê xwe paqij kir û têra dilê xwe av vexwar. Hevalên wê jî di biniya wê de jê re destê xwe li ba dikirin û xweziya xwe pê dianîn.

Perînazê bi vê sermestiyê gava ku xwest pincara dora kaniyê berhev bike, xwe daqûl kir. Di vê gavê de bi çemandinê re lingê wê likumî û bi carekê jî ser kaniyê şemitî. Bi ketinê re serê wê jî li tehtan ketibû û ji ser hişê xwe çûbû. Ji ber vê jî nikarîbû xwe bigirta û ji kendalê zinar têwer bû

û bi avê de çû, hawar û qijînî bi keçikan ket, lê kesî nikarîbû xwe li dû wê biavêje çem. Xebera nebixêr gi-handin gund. Gundiyên ku li hawara wan hatin, bi rojan bi pey ketin, lê kirin û nekirin, cen-

dekê wê nedîtin.

Wexta xebera windabûna Perînazê anîn û dan Miraz, mîna ku tîrêjên birûskê li nava dil û kezeba wî bikeve, êşîya. Ew gelekî lê giran hatibû. Mîna guleke ku ji koka xwe bê veqetandin, ew jî çilmisîbû. Gul û hêviya ruhê wî veçiriyabû. Her tişt li ber çavên wî reş bûbû, herimîbû, êdî ne ew xortê çeleng û rûgeş bû. Mîna ku dinya bi ser wî de bê xwarê, bi rojan deng pê neket. Ne bi kesekî re axivî, ne jî li kesî guhdar kir. Ji deng û gotinê xeyidîbû. Ji însanan sar bûbû û hêviya xwe qut kiribû. Şîn û girî kiribû hevalê xwe. Derdekî bê derman û êşeke zirav lê peyde bûbû. Kul û ke-

seran li ser hev jan didanê û dilê wî diguvaşt.

Roj û şevên wî lê bûbûn yek. Di her kêliyê de di deryaya aşop û xeyalan de winda dibû. Hema wisa di nava mitûbûn û xayîsbûnê de dima. Bi windabûna Perînazê re ew jî winda bûbû û nivê dilê wî jî pê re çûbû. Bi tena serê xwe di nava hebûn û nebûnê de digeriya. Bi leylandiyan û rewrewkên ne diyar ve, cest û berceste wî li cihekî, hiş û aqilê wî li cihekî din bû. Perînazê her dem weke xezalekê di xeyalên wî de diçeriya. Baweriya xwe bi mirina wê nedianî. Yeqîn nedikir ku fetisiye. Ji xwe re digot: "Heke miribûya ma qey dê termê wê jî nehata dîtin? Na, ew nemiriye! Ew ê bê, li min vegere."

Tu gavê li xwe venegeriya, wisa di navbera dînitî û şetiyê de diçû û dihat. Êdî ji hêz û taqetê ketibû û kortikên çavên wî kûr bûbûn. Hiş û aqilê wî dûrî cihê lê bû. Ji ber vê şeyda û bengîniyê mîna nîvmiriyên hay ji xwe nebû. Nola ku ji xewa mirinê rabe ji-

hevketî û per û perîşan bû.

Rojekê tê keviya çem. Piştî xwe dispêre dareke spîndarê û berê xwe dide kaniya xezalan. Di nava xem û xeyalan de pêla xeweke giran dikeve ser çavên wî û di xew re diçe. Xwe di nava baxçeyekî şîn û ronahî û bi gul û sosinan xemilî de dibîne. Mîna ku xwe li baxçeyê bihûştê his bike, derdora wî bi kulîlkên rengîn bi şeml û şemal dibiriqîn. Pêşiyê li ber çavên wî ronahiyeke zelal vejiya. Paşê, ji nav ronahiyê xezaleke bedew derket û ber bi wî ve hat! Xezalê bi çavên melûl û xembar li çavên wî nihêrî û serê xwe ber bi destê wî ve dirêj kir. Çawa ku Miraz destê xwe bi stû û serê xezalê ve dibe, xezal jî ji dilq û eyarê heywantiyê derdikeve û dibe Perînaz.

Her du evînbaz bi agirê evînê hev hembêz dikin û radimûsin. Destên xwe dixin nava kefen destên hev û bi dilovanî, bi hev şa dibin. Ji peroş û dilşadiyê hundirê çavên wan dibiriqîn. Şalûl û bilbil bi mêvaniya wan ve tîn û li ber serê wan diwîçînin, kevokên

evînê li ser serê wan perwazan didin û şahidiya pevgihana wan dikin. Bayekî hênîk li ser wan digobilî. Şînahî û keskahiya di binê kevana keskesorê de diteyîsî.

Pertaveke rewnaq li ber çavên wan dicivyan hev û di her pelê de tîrêjên ronahiyê pêl bi pêl fireh dibûn. Ji hêza pertavê çavên wan diqemişîn.

Piştî mest û sermestiya dilşabûnê Perînazê rabû destên



xwe ji destê Miraz berda û bi berepaşkî ber bi ronahiyê ve meşiya. Miraz jî hewl da ku li pey wê biçe, lê kir û nekir mîna darekê nikaribû ji cihê xwe bilebitiya, tenê bi çavên kesertijî lê mêzand. Perînazê jî dirûvê însên derket û dîsa ket kirasê xezalê û di ronahiyê de winda bû.

Miraz bi dengêkî şikestî kir gazî û hewar:

“Neçe! Periya min neçe! Min tik î tenê nehêle!”

Dengê Perînazê di guhên wî de olan da.

“Delalo! Tu yê bidî dû şopa min, bi min re were. Ez li benda te me”

Pîştî çûyîna Perînazê, di nava ronahiyê de pêşiyê mijekî tarî peyda bû û mîna xelekên ku li ser rûyê avê hêdî hêdî li dora xwe fireh dibin, wisa jî xelekên mij pêl bi pêl çembera tariyê li dora xwe fireh dikirin. Her pêla ku perdeya xwe dadixist, ronahî jî dadiqurtand nava xwe. Şîn û ronahî di zulmeta taristanê de difetisîn. Mij û morana ku kumişibû her derê weke lavlavkê rapêçabû, zeft kiribû.”

Şalûl û bilbil bi firê ketibûn, gul û kulîlkên gulistanê çilmisibûn. Mij û xumama tîr û tarî rengê her tiştî yek-car veguherandibû reşahiyê. Av û ax û xweza tev di bin hukmê taristanê de can dida.

Gava ku xelekên mijê reş hetanî ber lingê Miraz hatin ku wî jî daqurtînin ji xewê veciniqî. Di nav xwêdanê de şil û pil bûbû. Xewnerêşkeke xerab dîtibû, tîrs û xofê xwe lê pêçabû. Pê dernedixist bê ka ev xewn bû, yan jî rastî bû. Di dilê xwe de got:

“Gelo ev sêhr bû, çi bû?”

Di nav xewn û rastiye de mabû; kîjan xewn bû kîjan rastî bû, ji hev dernedixist. Şaş û metel mabû. Bi çavên xilmaş li çar aliyê xwe mêze kir, lê her tişt weke xwe bû. Çem bi

dengêkî xuşexuş û bi aheng diherikî. Pêlên avê xwe li ser hev digevizandin û xweza di aramiya sebat û tebatê de diherikî.

Destên xwe di çem de kir, bi çend peşkên avê rûyê xwe şûşt û xwêdana xwe paqij kir. Bi kefa her du destên xwe çengek av vexwar. Ava sar û hênîk, hinekî ew bi ser xwe ve anî û xewa ser çavên wî avêt. Lê hîn jî di binê bandora xewna xwe de bû. Serê wî tevlihev bûbû û ev bûyer ji hev dernedixist.

Pirika wî hat bîra wî. Dema hîn zarok bû, pîra wî jê re çîrokên xezalan digot. Digot: “Zemanê berê li Çiyayê Mêrasê, keça ku bi evindari û bengînî sewdaser bibe, heke tiştek bi serê wê de bê, ew namire. Bi sêhrê dikeve û di sûretê xezaleke kovî de bi çol û çiyê dikeve. Li bendê ye ku xortê hezkiriyê wê bê û wê ji wî halî derxe û bigihîjin hev. Gava hezkiriyê wê bê cem, ew jê nareve û diçe li cem wî disekine. Her çend di şeklê xezalê de be jî, di rastiya xwe de ew insan e. Wexta destê hezkiriyê wê pê bikeve û dest bidê, ew eyar û kirasê xezalbûnê ji xwe dike û ji nû ve dirûvê însên pê dikeve û dibe insan. Bi vî awayî her du evîndar digihîjin miradê xwe”

Hesteke xurt xwe li nav dilê wî rapêça ku li aliyê kaniyê binihêre. Mîna ku bi sêhr û efsûnê bikeve, gava ku serê xwe rakir, çavên wî çûn ser kaniyê. Li raserî wî xezalek dixuya. Bi çavên xilmaş li xezalê niherî, wê kêliyê xezal li ber çavên wî bû fena keçikekê. Bi çavên xwe baş paland, xezalê serê xwe bi nazenînî ber bi kaniyê ve qurisandibû. Piştî ku ji kaniya ber xwe av vexwar, serê xwe rakir. Çend çilk û dilopên avê ji dev û çena wê niqutîn nava kaniyê. Miraz bi çavên ziloq li xezalê diniherî, xezalê jî li wî. Çavên wan li çavên hev aliqîbûn û

mîna miqnetîsê hev dikişandin
kûrahiya xwe.

Miraz ji çavên xwe bawer nedikir,
gelo ya li pêşberî wî ew e? Çavên xwe
perixandin, lê dîmen veneguherî. Gava
ku ji çavên xwe ewle bû, kelecaneke
pê girt û germahiyeke dilovaniyê xwe
li canê wî pêça. Di çavên wî de
çirûskên hêviyê pêketin û ji nû ve can
û ruh pê ve hat. Êdî baş bawer bûbû
ku wê çiroka ku pirika wî jê re digot,
bi wî rast dihat. Xwe bi xwe got: “Pîra
min rast digot, yeqîn ev xezal jî Perî-
naz e û di kirasê xezalekê de li benda
min e.”

Pîştî ku xezalê av vexwar yekcar
xwe hol kir û çiv da xwe. Bi bayê bezê
di hêla zinarên jorîn de berê xwe da
çiyê. Di vê qewimînê de coş û peroşiyê
mîna tayê ku li dû derziyê biçê, Miraz
jî bi pey ket û da du şopa wê. Xezalê
bazda, wî jî li pey wê bazda. Bi hêviya
pevgihînê bi lez û bez xwe li nava
tehtan dida. Lingên wî erd nedigirtin,
wisa ji ser û ber û keviran dipekiya ku
tu tiştî xwe li ber nedigirt. Mîna ku bi
efsûnê ketibe, çavê xwe ji xezalê qut
nedikir û jê pê ve tu tişt nedidît. Xezal
her ku bi bilindahiya çiya ve hildik-
işiya, wî jî dida dû şopa wê û xwe li
nava çelixt û qeliştekan didan û ber bi
jor ve diçû. Xezal geh winda dibû, geh
jî derdiket pêşberî wî. Gelek caran jî di
nav rê û rizdeyên fetloke û zirav de
derbas dibûn. Û di zinar û zixurên
mîna kêrê tûj de radipelikîn singê
çiyê. Her gava ku bi jora çiyê diketin,
deşt û zozan jî ji ber wan winda
dibûn.

Her çendî xwe li bezê digirt jî, dîkir
nedikir nikaribû keysa xwe lê bine û
bigihîjê. Geh ji ser ber û kuçan diter-
pilî û dilikumî û geh jî li erdê diket.
Hingî xwe li kelem û çeliyan
qelibandibû dest û piyên wî tev şe-
qitibûn. Xwîni bûbûn.

Miraz û xezalê, gelekî li ber hevdan.

Bi vî halî bê westan û rawestan, heta
ku roj li wan bû şev, xwe li çiyayên
berz girtin. Ev lûtkeya bilind li es-
manê Çiyayê Mêrasê bû. Serê çiyê
mîna xêliya bûkekê timî bi mij û
dûman bû.

Çiyayê Mêrasê ji rêzeçiyayên ku li
pişta hev siwar bûbûn pêk dihat. Her
derê çiyê kendal û newalên baxir û
şaxiran bû. Li esmanê çiyê teyrên eylo
û sîsarkan li pey nêçîrên xwe holana
şer dikirin.

Di wextê xwe de gelek egîd û
mêrxas di vî çiyayî de winda bûbûn. Ji
ber ku asê û rizde bû, yên diçûn
nêçîra xezalan tu caran sax venedi-
geriyan malên xwe. Carna tevî hesp û
tajiyan xwe ji kop û zinaran têwer
dibûn. Çûyîn hebû, lê vegera wê tune
bû. Ji ber vê jî gundiyan bawer dikirin
ku çiya û xezalên wê efsûnî ne.

Êdî xezal jî heta serê çiyê hatibû û
ji wêş ketibû. Xezal hatibû li pozê
kendalekî sekinîbû. Mîna ku li benda
Miraz mabe, weke darekê bê tevger
rawestiyabû. Miraz çû xwe gihandê.
Di navbera wan de tenê çend gav
mabûn. Hêdîka bi gavên nermik baş
nêzikî xezalê bû, xezalê xwe netebi-
tand.

Di her gava ku nêz dibû de, dilê wî
di qefesa singê wî de hildiawêt. Kele-
canek li bedena wî belav dibû. Bi bêrî
û hesreteke bêhempa diricîfî.

Dixwest ku gavek berî gavekê bê
sebr û aram destê xwe pê bide. Dema
destê xwe bi hezkirin dirêjî stûyê wê
kir, xezal yekcar bi tirsê ket û veciniqî.
Li paş xwe fitilî û bi çend gavan jê dûr
ket. Xezalê ne xwe jê dûr xist ne jî
nêzikî wî dibû. Her dem xwe li ber
çavên wî digirt. Xwe jê venedidizand,
lê her ku wî li pey xezalê bazdida,
xezalê xwe jê dûr dixist û bazdida.
Mîna ku ji xewnekê derkevin û
bazbidin, di xewneke din de winda
bûn.

Girtîgeha Bolûyê

Xwezî

*Mîna bajarê min xwekuştin bêhn dide
Xwekuştin bêhn dide mîna bajarê min*

Mistefa TÛNCYUZLU

Bi terpîna deriyan a li ser hev ji nişka ve tevî betaniyê heta kêmaxan rabû ser xwe. Enî û stûyê wî mabû di nav xwêdanê de. Mîna ku li tiştina bigere. Li derdora xwe nihêrî. Dema ku diwarên ker û lal bi ber çavên wî ketin, fêma kir ku hê di hucreyê de ye. Bêhnek stend, hêdî hêdî berda û di ber xwe de got “Nalet lê bê! Ez neel-imîm van deriyan û çû.” Û cardin xwe dirêj kir. Bi ketina gardiyan a hucreyê re serê xwe ji binê betaniyê derxist û got “Deriyê hewşê veneke” bi derketina gardiyan re cardin serê xwe xist bin betaniyê.

Hucre pir biçûk bû. Li ser maseya ku nivê hucreyê girtibû, pirtûk û lênûskên cur bi cur hatibûn rêzkirin. Pênûsdankek tijî pênûs, radyoyek, berçavkek, silhiyek av, qedeh, derman û destmalên kaxizîn xweşik hatibûn rêzkirin. Raserî pirtûkan qertekî zarokekî mîna kartolan gilover, şîrîn, li cem wî jî wêneyê zarokeke porzer û çavreş ku li ber seyekî ku teyrekî li ser danîbû hebû. Li serekî ranzeyê tembûr, li serê din jî repertûvara stranên kurdî û tirkî hatibû daliqandin, li ber wêneyê çiyayan. Bi nevrêsîm û çarşevên gulgulî ve dişîbiya odeyeke biçûk û delal.

Saet di heştan de Apê Mistefa bi gewdeyê xwe yê qerase di nav deriyê hucreya wî de sekinî, dest avêt simbelên xwe yên spî û bi kenekî sivik got,

-Dilo ma tu taştê naxwî? Haydê rabe ser xwe, rojbaş!

Dilo rabû ser xwe heba xwe li ber niv qedeh av vexwar, cilên xwe li xwe

kirin. Nivînên xwe mîna leşkerekî rast kir û çû destşokê.

Di hucreya Apê Mistefa de du betanî, li ser betaniyan jî rûbereke bi nefelê xemilandî raxistibûn û li erdê taştêya xwe dixwarin. Her du extiyar li ser taştê rûniştibûn û qedehên çayê dagirtibûn. Dilo çawa hat, rûnişt dest avêt qumandaya televizyonê û da ser kanala nûçeyan. Çend parî nan xwar, çaya xwe kişand ber xwe û dest avêt rojnameyên rojekê berê. Dema cihên girîng di rojnameyan de bidîta, ji her du extiyaran jî dixwend.

Dilo dema ku ji ser taştê rabû, xwest firaqan bişo lê her du extiyaran nehişt û gotin “Tu here karê xwe bike Dilo, em ê bişon. Dilo dîsa melûl melûl ji hucreyê derket. Her roj şerê wî û wan bû li ser şûştina firaqan. Ji ber kar û xebatên wî yên xwendin, nivîsandin û piraniya şevan xwarinçêkirin û her wekî din firaq pê nedidan şûştin. Sala Dilo ya sêyemîn bû di zindanê de. Piştî neh salên ku li çiyayan derbas kiribû, dîl hatibû girtin. Û ji bo cihê salên derbasbûyî jî dagire pir dixebitî. Diranên xwe şûştin û çû li ser doşekê rûnişt, betanî avêt ser lingên xwe û dest bi xwendina pirtûka stûr a bi navê “Feylesofên jin di dîrokê de” kir. Rûpel li ser rûpelan diquliband û cihên girîng nişe digirt.

Piştî xwarina nivroyê Dilo bi her du hevalên xwe yên extiyar re çend seriyan geriya û cardin çû hucreya xwe. Rahişt tembûrê, akordeke sivik dayê û dest bi jedandinê kir. Him dijenan him jî di ber re digot;

“Li ezman stêrka min
Li nav baxçeyan kulîlka min
Sorgula şefeqa min
Kurdistan ax Kurdistan”

Bi dengê wî yê mîna dengê têlan
tenik û xembar ku bi newayan re dibû
yek û di hucreyê de olan dida. Her du
extiyar jî hatibûn ser doşeka wî
rûniştibûn û bi baldarî guh didanê. Û
carinan jî mîna vokalîstan jî digotin
“Kurdistan ax Kurdistan.”

Lê welê ji derve bang li wan kirin.
Apê Mistefa çû derve û dema vegeyriya
çar name di destên wî de bûn. Yek jê
re ji keça wî ya mîna wî dîl hatibû.
Her sêyên din jî ji Dilo re hatibûn.
Dilo li navê li ser zerfan nihêrî. Yek ji
xwişka wî, yek ji hevala wî ya girtî,
nameya zerfa mezin jî ji Almanyayê, ji
hevala wî hatibû. Bi peroyîya ji navê li
ser zerfê ew girtibû, name vekir. Dest-
pêkê wêneyekî mezin ket destê wî. Bi
derxistinê re nivîsa li pişt wêne dît;
“Wêneyekî ecêb û nexweşik e, lê te
bêriya kenên min kiriye, bi hezkirin...
Şînê” nivîsibû. Dema wêne wergerand
bi dîtina rûyê wê yê mîna guleke xu-
navgirtî re, her du extiyarên cem xwe
ji bîr kiribû û ketibû mitalan. Apê
Mistefa dema wêneyê di destê Dilo de
dît, peroyîyekê ew girt û got;

-Dilo wele ez vê hevala delal û
çavşîn nas dikim lê nizamî ji ku nas
dikim.

Dilo ji nêrîna wêneyê piştî 12 salan
ketiye dest, bi axaftina Apê Mistefa re
dûr ket û bi ken got;

-Erê Apê Mistefa hûn her du jî wê
nas dikin. Heta beriya niha jî di Roj
Tv'yê de dixebitî.

-Erê! Erê! Hat bîra min, ew hevala
ku bernamêya “Xalxalok”ê çêdikir. Ê
ma tu ji ku wê nas dikî Dilo?

Dilo sekinî û nizanibû çî bibêje. Bi
kenekî sivik û şermoke got;

-Hevala min a zaroktiyê ye. Em bi

hev re çûbûn nav gerilayan. Lê
hevalan jî bo xebatan ew ji gund paş
de vegeandin. Çi fêde nexweş û ji ber
nexweşiya xwe jî dev ji karê
televizyonê berdaye.

-Ma hê ciwan e Dilo.

-Rast e, salekê ji min biçûktir e,
bîst û heşt salî ye.

-Ma nexweşiya wê çî ye Dilo?

-Penceşêr e Apê Mistefa.

-Bû çend sal ku we hev du
nedîtiye?

-Ev sala dozdehan e. Hê li gerîla
carinan ez bi telefonê pê re diaxivîm.

Her du extiyar jî bo ku nameyên
xwe bixwînin, derketin. Apê Mistefa
nameya xwe da Apê Bedrî. Wî jî bi
kêmxwendina xwe jê re dixwend. Lê
Apê Mistefa tu caran bi xwendina wî
têr nedibû. Carekê jî bi Dilo dida
xwendin. Ji ber ku bi kurdî jî jê re
werdigerand û di dema bersivê de jî
cardin pê dida xwendin. Dilo wêne
danî raserî xwe, ser pirtûkan û name
ji hev vekir.

*Diloca! Dixwazim tiştên ku ez
jiyame, hestên xwe, halê xwe bi çend
hevokên biçûk bi te re par ve bikim.*

*Li ser vê axa bi hemû tiştên xwe ve
hê jî ji min re xerîb e, ketime sala xwe
ya heştêmîn. Ev heşt sal in ku ez ro-
jekê ji dil nejiyame. Hingî xeyalên min
şikestine, êdî tîrsa xeyalên min ên
kevn û ji dîl, ew ê jî min bişkînin, dijîm.
Dibêje qey jiyan jî her kesî re rast, jî
min re berovajî herikiye. Di dema xwe
de min hemû enerjiya xwe ji bo çûna
gerîla hîpnotîze kiribû. Ên der û dora
min çûn, ez mam. Pêwîst bû bi yên herî
nêzî xwe, yên min bi wan re kar fikir
re an bihatima kuştin an jî windakirin.
Herî dawiyê ez di 1999'an de mîna
Azad, mîna Mihemed, pêwîst bû a niha
di zindanê de bûma.*

Min can dida ji bo ku bedena xwe li

dar, ber û çiyayan bixim û xwe ji sîno-
ran biqevêzim. Lê sirgûn bû para min.
Ez kî bûm, sekin, westîn, xwarineke bi
tehm, razan, carinan bê bazdan meş kî
bû? A ku dizane wextê xwe û bi kinki-
rina emrê min ve penceşêra janên xwe,
nabe û naçe jî, di bedena xwe de vedi-
hewîne dîsa ez im. Ez li van deran qet
dîlşad nebûm. Dilocan bextewar
nabim, nexweşî û sirgûn bûn para min.
Bextewarî tune li sirgûnê. Dilşadiyên ji
dîl dûr in. Hestên şadiyê di giravên
biçûk ên mêjiyên min de mane qu-
flekirî, mifteyên wan mane li welatê
min; ew welatê ku ez ji bo wî jar û
birîndar... Ew ê her gava ku tê bîra
min, bi rondikên xwînbar diherikim ber
bi wî ve, li ser vê axa xerîb.

Jiyanê me anîn ku? Êdî bi me çi dide
gotin, dibînim û jana wê herî kêr mîna
wê roja havîna germ a 1996'an, yekem
car qutbûna me ji kûr ve hîs dikim.
Dilocan berê çawa nedigiriyam îro jî
ew qas bi girînê re li hev û ji girînê re li
bafîkan (mahneyan) digerim.

Min tu tu caran bernedayî Dilocan.
Mîna dostekî, rêhevalekî, cêwiyê
ruhekî, nîvê bedena xwe û mîna bêriki-
rina qutbûnekê, her tim teze dîtiye,
welê nas kiriye û di der barê te de
welê mame. Ji bo her janên ku min kêlî
bi kêlî bi te dane kişandin, bi hezaran
caran lêborînê ji te dixwazim. Diyar e
ku di nav wan şertan de carekê jî min
tu dîl dayî girtin. Ev jî ji kûr ve min
diêşîne. Janeke welê zirav xwe li min
pêçaye. Nikarim binivîsim, nikarim jê
xelas bibim, dixwazim xwe komî ser
hev bikim. Jixwe ji roja ku em belav
bûne û vir ve dizanim pêwîst e xwe
komî ser hev bikim. Tu jî dizanî "xwezî"
pir nayên hezkirin. Lê carinan hin
"xwezî"yên ji dîl û dilhebîn derdikevin,
yan jî devê mirov, bi xweziyeke welê
dibêjim "xwezî" tu a niha li nik min
bûyayî.

Bi nenivîsandinê, ji bo te xemgîn

nekim, vê carê min kêlî bi kêlî jan bi te
dan kişandi û tu şikandiyî. Dilocan ji
kerema xwe re min bêtî min, bêtî dîtin
û xebera min, min nedarizîne. Erê tu
ne neheq î, lê tu tenê ji nîn î. Min xirabî
jî kiribe ez bi te re me. Ber bi yekbûnên
herî azad ve hezkirin û hurmeta min a
ji te re, mîna soz, li nik soza "xwezî"ya
Ehmedê Xanî di dîlê min de veşartî ye.
Vêya qet ji bîr neke.

Dilocan ji bo rojnivîska ku te ji bo
min nivîsiye, te ji zarokan re gotiye
"Heta ew nexwaze, neşînin." Xebera
min jê nebû ku bixwazim Dilocan.
Elbet dixwazim, li bendê me. Jixwe
navnîşana min ligel Evînê heye. Ê ji bo
enstrumanê jî ez ê di dema herî kin de
li ser navê Evînê bişînim. Ji bo ku min
zûtir nekiriye, neqehire, ji niha û şûnve
ji bo bersivên zûtir çi ji destên min bê
ez ê bikim. Te jan û xemgîniyên xwe
nivîsandine. Hemû yên min in jî. Te bi
jan, xemgînî û xembariyên te yên ji dîl
hembêz dikim. Bi baldarî nêzikbûna te
ya tenduristiya xwe ji bo min pir
muhîm e. Vêya qet ji hişê xwe dernexe.
Çi dibe bila bibe, ez dibêjim em ne di
rewşa ku dîl pê bişewite de ne ku em
pê xemgîn bibin. Dilocan tu her tim der-
manê canê min î. Li gor min ev welê ye.

Ji hemû hevalan re silavên min ên
herî ji dîl bibêje.

Şînê

18.12.2007 saet 23.50 Yekşem

Hê Dilo bi xemgînî xwe bi vê
nameyê ve berdabû û dixwend,
gardîyan bang kir û got:

"Dilxwaz Ekîncî, hevdîtin."

Dilo rabû ser xwe, cilên paqij li xwe
kir, porê xwe şeh kir û derket. Li mal-
taya mezin gihîşt hevalên xwe û ketin
rê.

Hundir tijî serdêr bûn. Ê ku navê
wî dihat xwendin, diket hundir û ji
serî ve xêrhatin li serdêran fikir û

dibihurî. Dilo jî mîna hemû hevalên xwe xêrhatin li serdêran kir, piştî çend malbatan, çavên wî bi dê û bavê wî ketin. Çavên wan ketin hevdu û çirisîn. Dema ku gihîşt cem wan û xerhatin li wan kir dê û bavê wî ew hembêz kirin û ramûsan. Dilo dema ku dît niyeta dayîka wî tune wî berde, bi ken got;

- Dayê ka rûnê. Heta ku xêrhatinê bidim serdêran û derbas bû.

Dilo dema ku vegeriya dê û bavên wî ew hembêz kirin û ramûsan. Dayîka wî ew li cem xwe da rûniştandin. Destên wî girtin nava destên xwe. Li ser hev dêmên wî ramûsa. Bavê wî bi dengêkî zîz got;

- Tu çawa yî kurê min?

- Baş im bavo, spasiya we dikim. Hûn çawan in?

- Em baş in lawo. Hema tu baş be bes e. Lawo dema min ew wêneyên te dîtî ez tirsîyam. Şikir ji Xwedê re min tu li ser xwe dîtî.

- Ew wêne yê mangirtinê bûn. Lê tu jî dizanî qelsbûn ne ji grevan û birçîbûnan e.

Dema Dilo welê got her sê jî kenîyan. Bavê wî ew hembêz kir û ji porê wî yê reş û xelekî ramûsa. Dayîka wî ew ji ber hembêza bavê wî kişand û gotê;

-Ka bisekine lo, ez jê re bibêjim bila kêfa wî were.

Berê Dilo da xwe û gotê;

- Lawo ez duh çûbûm mala bavê Şînê. Dê û bavên wê pir silav dîkirin. Newrozê jî ji min re telefonî Şînê kir û ez pê re axivîm. Pir pir silav dîkir û digot "Hema bila meraqa min neke, ez pir baş im, xema min tenê ew e. Jixwe min jê re name şandiye."

- Weleh rast nabêje. Nameya wê beriya niha hat. Hê nexweş e û dibêje ez her roj ji hesreta welat digirim. Ji ber nexweşiya xwe dev ji karê televîzyonê jî berdaye.

- Wey lawo... Min jî digot êdî çima bûka min dernakeve televîzyonê. Her cara ku derdiket Meyremê bang dîkir digot "Zekiya! Zekiya! Televîzyonê veke bûka te derketiye"

Bavê wî berê xwe da dayîka wî û bi ken got;

- Te ew çi zû kir bûka xwe pitê!

- Çima, ma tu wê wekî bûka xwe qebûl nakî lo?

- Na. Estexfurulah. Ji her du çavên wê radimûsim. Xwezî hemû bûkên te mîna wê zana, bi aqil û jêhatî bûna.

- Erê ka bisekine, we ew bê îzna wê kiriye bûka xwe.

- Lawo ma hezkirina we ne bes e? Markirin şert e?

- Temam, tamam, min tişt negot dayê.

- Xwedê alîkarê wê be lawo.

- Ê ka zarok çawan in? We çima Evîna min neaniye.

- Kuro soz, ez ê wê biharê bişînim. Vê carê hema me got bila kurê me tenê nemîne, ên her kesî diçin em jî vê sersalê kurê xwe tenê nehêlin.

Dema rabûn ser xwe nizanibûn bê saetek wext çawa qediyaye. Dema dengê gardiyan hat, dayîka wî got "Lawo çi zû qediya" û ew hembêz kir. Cardin li ser hev ew ramûsa.

Girtîgeha Sêrtê